

Margareta Normell

Le giwêrayelîyewe bo berpirsayetî

Zanyarnorî, hest û hevbendî le fêrgeda

Margareta Normell

Från lydnad till ansvar - kunskapssyn, känslor och relationer i skolan.

Upplaga 1:4

Studentlitteratur 2009

www.studentlitteratur.se

Översättning till kurdiska: Asos Shafeek

Margareta Normell

Le giwêrayelîyewe bo berpirsayetî - zanyarnorî, hest û hevbendî le fêrgeda.

Tercemey le swêdîyewe: Asos Şefîq

Dîzaynî berg: M. Zanko

Torî Fêrkarîy Bradost. Stockholm, beharî 2015

Em terceme kurdîye bo bazar û firoştin nîye.

Têbînî: lem kitêbeda serleberî perawêzekan berhemî terceme kurdîyekeye.

Tercemey em kitêbe çemikî taybetî pêwîst bûwe. Ew çemikane le perawêzda rûn kirawinetewe belam bo hasankirdinî dozîneweyan, hem le saytî Wîşedan -î Bradost -da tomarin, hem le besterî: [Wîshedan_B21.pdf\(komak.nu\)](http://Wîshedan_B21.pdf(komak.nu)).

Em berheme be elfbêy aramî:

https://komak.nu/Kurdi/Kteebkhane/KteebiKOMAK_PDF/Normell_G_B.pdf

Nêwerok

Pêşekî.....	5
Destpêk.....	7
Çapterî yekem: Le ferhengî giwêrayelîyewe bo ferhengî berpirsayetî.....	10
Çapterî dûhem: Asûdeyî û fêrbûn girêdirawî yekdîn.....	15
Peywestî asûde û nasûde	16
Sengî peywest bo firajûtinî mêşik.....	19
Peywest û fêrkarî.....	22
Peywest û tundûtîjî.....	24
Peywest û rêberayetî.....	26
Serencam	28
Çapterî sêhem: Riskanî sozekî	30
Mebest le riskanî sozekî çîye?	30
Ger hest nebêt, jîrîş nabêt.....	32
Hunerî berengarbûnewey sozekî.....	36
Twanistî sozekî le pîşey mamostayetîda	39
Çapterî çiwarem: Twanistî hevbendkarî.....	43
Le ajawlewe pergal peyda debêt.....	43
Mebest le twanistî hevbendkarî çîye?.....	47
Twanistî hevbendkarî le pîşey mamostayetîda	49
Çapterî pêncem: Koşîn bo pejrandin	52
Le giştyan girîngtir	52
Sûkayetî çîye?	53
Sûkayetîkirdin be mamostayek	57
Nawdar yan pejrêniraw	58
Merce hestî sûkayetî her car rewa bêt?.....	59
Hevbendîy akarnasane le polda	61
Çapterî şeşem: Çîye ewey mamosta dekate mamostay baş?	64
Mamosta û dû ferheng.....	66
Dîdarî berêweberêkî serkewtû	67
Zengî telefon - yasaxkirdin yan sewdagerî	70
Çapterî heftem: Aye diruste mamostayetî be her kes rewa bêt?	74
Destbijêrî bo riştey mamostayetî	74
Dîdarî Ulla Holm	74
Serencam.....	77
Çapterî heştam: Firajûtin le pîşey mamostayetîda	80

Derbarey bextewerî le karda	80
Peyam le zeryay fêrgewe.....	81
Grûpî rêniwênî - rêbazêke bo geşedan be twanay pîşeweraney xot	84
Salêk wiçan bo xwêndinî tojînewey niwê le buwarî fêrkarîda	87
Çapterî nohem: Şeş doxî rojane bo bîrdanewe	90
Doxî yekem: boçî em base bixwênîn?	90
Doxî dûhem: ay, eme çîye to deylêt, Malîn?	91
Doxî sêhem: dîdarî geşe le dû ferhengda	91
Doxî çiwarem: deysa welam bidewe, burîs!	92
Doxî pêncem: kê detwanêt yarmetîy êlsa bidat?	92
Doxî şeşem: zekîye, dînî to çîye?	93
Dûwa gute	94

Pêşekî

Le dû kitêbî pêşûmda, “*Pedagog i en förändrad tid*” - “*Fêrkar le serdemêkî bergoranda*” (2002) û “*Pedagogens inre rum*” - “*Naxî fêrkar*” (2004) - da, dû babetim rûn kirdotewe: yekiyan grûpî rêniwênîye wek şewazêk bo têhelkêşkirdinî bîrdoze û praktîk le karî rojaney mamostada û babetî dûhem birîtîye le karîgerîy tojînewey niwê derbarey pêwîstîy hestekî û civakîy mirov Leser firewandin û qûlkirdinewey twanay mamostayetî. Bertekî ayetî¹ derbarey ew dû kitêbe, herweha axaftinî serincrakêş letek mamosta û tojeranda rûkarî² niwêy lêy kirdimewe.

Mebest lem kitêbe bîrdaneweye le girîngîy ew hevbendîyey heye le nêwan mamosta û fêrxwazda bo karûbarî fêrge. Hewilêke bo welamdanewey pirsiyarî: bo mamosta heye debête hander bo geşey arezûy fêrbûn lay fêrxwaz û firajûtinî wî, mamostaş heye nabête ew handere. Çone mamosta heye detwanêt jîngyekî aram û pergal³ le polda saz bikat keçî peşewî û nasûdey⁴ polî dîke degirêtewe. Awatî min beşînî sirûşe⁵ be xwêneran bikewine giftûgo derbarey çonetîy handanî hem “*riskanî sozekî*”⁶ û hem “*twanistî hevbendkarî*”⁷ -î lay mamosta û fêrxwaz.

Babetêkî seranserî lem kitêbeda birîtîye le: çon perînewey xawhengaw le civakêkî pitir mend,⁸ salarperist⁹ û kofermanewey¹⁰ bo civakêkî pitir bizoz,¹¹ takgera û dêmokrat karîgerî heye le ser karûbarî fêrge. Le Swêdî dûwênêda wişey “*giwêrayelî*” le gişt perwerde û fêrkarîda şapeyv bû. Emro lay zor kes ew peyve zengêkî nayetî¹² heye. Emro, le birî giwêrayelî, berpirsayetîy tak cexitî lesere, pirsiyarîş ewca dête ser çend û çonî ew berpirsayetîyey dekwête estoy tak. Emeş hem zarok û hem mezin degirêtewe. Lem kitêbeda dozî giwêrayelî beranber dozî berpirsayetî le şewazî helsûkewtî mamosta letek fêrxwazda dexeme ber giftûgo, lêreşda amaje be ciyawazîy helsûkewt dekem le nêwan mamostay serbe neretî salarperistane le layek û dêmokratane le layek.

Tojînewey deyekanî raburd derbarey saxtar û karkirdî mêşik be rûnî pêşanyan dawey ke jîrî û hest girêdirawî yekin. Hoşmendî yan lojîk, bîrî rûn û şirovekarîy sardusir nîye, hestîş le penada heye. Tojînewey hawçerxîş derbarey “*peywestbûn*”¹³, ke bas le pêwîstîy mirov dekat bo peywestîy hestekîy nêzik legel kesanî dîkey girîng, pêşanî dawey hevbendîy baş çî sengêkî girîngî heye bo fêrbûn, xoşguzeranî û twanay bo nimûne rêberayetîy kesanî dîke.

Tojînewey niwê dawey firewandinî riwageman dekat bo zanyar. Emeş karîgerî heye Leser dariştinî amanc û karûbarî fêrge, herweha Leser nêwerokî hem xwêndinî riştey mamostayetî û hem xwêndinî

¹ Ayetî: positive, pozetîv.

² Rûkar: aspect.

³ Pergal: rêkûpêkî, *order*.

⁴ Nasûde: naasûde.

⁵ Sirûş: îlham, inspiration.

⁶ Riskanî sozekî: emotional maturity.

⁷ Twanistî hevbendkarî: relational skills.

⁸ Mend: *static*, pêçewaney “*bizoz*” bo daynemîk, dînamîk: “*dynamic*”.

⁹ Salarperist: authoritarian.

¹⁰ Koferman: collectivistic.

¹¹ Bizoz: daynemîk, dînamîk, “*dynamic*”, pêçewaney mend: statîk “*static*”.

¹² Nayetî: negative, nêgetîv.

¹³ Peywestbûn: attachment, bonding, affiliation, connection.

dewamedar.¹⁴ Iemewla bes nîye fêrxwaz kat û koşîn bo babetî nerêtekîy fêrge terxan biken. Cige lewane debêt kar biken leser cilewgirtinî hest û sazkindinî hevbendîy baş letek kesanî dîke. Eme merci niwê dexate ser pîşey mamostayetî.

Supasêkî gerim arastey gişt ew kesane dekem ke katyan bo dîdarekanim terxan kird û bo ewaney be zanist û ezimûnî xoyan komekiyan kirdim. Supasî zorîşim bo Gun Zetterström larkander ke hestederane¹⁵ û be amojgarîy baş derbarey hem nêwerokî kitêbeke û hem poşake zimanîyekey, yarmetî dam.

Solna, payîzî 2007

Margareta Normell

¹⁴ Xwêndinî dewamedar: xwêndin bedem jîyan û karewe, life-long education.

¹⁵ Hesteder û hoşeder: *"be watay kesêk ke hestî be şitan dirust bêt û hoşî pêyan bişkêt"*, birwane: Celîzade, *"Zarawesazîy pêwane"*.

Destpêk

Sereta dawayek arastey xwêner dekem: bîr le mamostayek bikewe serdemî fêrxwazît, bûbête hokar bo ewey to hengawêkî girîng le firajûtinî xotda binêyt. Pêt waye çî bû ew mamostayey kirde kesêkî weha girîng? Aye twanay rûnkirdinewey weha baş bû to zû têdegeyîştît? Aye hîwabexş bû çünke birway be twanay to hebû? Aye wişe û kirdewey ew mamostaye bûn hestî lexo razîbûn û xulyay kuçkawî le toda serxist? Yan hokar degerêtewe bo ew hevbendîye dûrmewdayey têyda zanyar, kuçkawî û helwêstî ayetîyaney mamostake bû bo fêrbûnî babetî niwê giwêzirayewe bo toyîş?

Lewaneye rûdawêkî taybet bêtewe yadit ke to êsta paşkat be xalî werçerxanî bizanît. Bo min rêkewtêkî weha bû katêk mamostakem dîlkêşane raygeyand: “to dewenêkî pembe û şînit nexşandûwe! Minîş bînîm, her rêk rengî weha bû! Em deweney to jîn û hêzî heye!”. Polekeman, ew roje reşebadarey apirîl le mêrg bû, erikîş birîtî bû le nexşandinî beşêk le dewenekanî ew mêrge. Min rikim le nîgarkêşî debowe, ew deme waneke nawî weha bû. Min leber ewey hestim dekird lew buwareda tewaw bêbehrem, lew rêkewteda beşêkî leber naçarîy erikî lesermane û beşêkî wek berhelstîyekî behêz, crpnane çend hêlêkî rengalem da be kaxezekeda. Ca bizane wişe dilgermekanî mamosta çî sersamîyek bûn bo min. Min şitêkim nexşandû ew nasîyewe, şitêkî xawen jîn û hêz. Resenîy peyamekeşî be hîç corêk cêy guman nebû. Galtecarane nebû. Ew rûdawe wehay kird min ew dîde dijwarey hambû derbarey xom ke twanay derbirînim be nîgarkêşî nîye, bixeme jêr pirsiyarewe. Be sersurmanewe dîtîm ke wêneke detwanêt hest û mezac derbirêt û şitêk bilêt derbarey kesî firçe bedest.

Le mawey salanî mamostayetîm le amadeyî, hawkarim dedît twanay taybetyan hebû bo rêniwênîy fêrxwaz rûwe fêrbûn. Ewane kesanêk bûn tewaw şareza le buwarî wanekanî xoyanda belam hawkat kuçkawyekî nêw kar û arezûyekî helkirdin le gel fêrxwazanyan pêşan deda, ke min carûbar xoxwastî¹⁶ debûm. Lewe deçû derikî taybetyan hebêt bo pêwîstîy hem takî fêrxwaz bo ewey pêş bikewêt û hem grûp bo ewey yekgirtû bin. Şitêk hebû le kesayetîy ewanda debûwe mayey wireberzî bo kesanî dewrûber. Mirov le hawdemîy ewanda hestî be asûdeyî, azadî û herweha be wize, jiyan û amadeyî dekird. Car hebû mamostay weha sengî taybetyan peyda dekird lay ew fêrxwazey pêwîstî hebû bewey cige le dayikûbab peywestî kesêkî dîke bêt.

Paş çendîn sal kewtime ser karî derûnsarêjî¹⁷ û têgeyîştîm lewey taybetmendîy ew mamostagele tenha astî berizyan nebû le babetî xwêndinekanî xoyanda belkû le pena eweşda xawen hem riskanî sozekî bûn û hem twanay sazkindinî hevbendîy baş le gel kesanî dîkeda. Emeş bû wehay dekird fêrxwaz hest bikat bewey kesêkî lêselimênirawe. Beweş birway fêrxwaz be xotwan¹⁸ beriz debowe û han dedira bo têkoşîn le xwêndinda. Xwêndin nedebûwe tenha kar û erik belkû hawdemîyekî dîlkêş û pirwata le gel kesanî dîke. Helbet nakokî, peşewî û alozkanîş her hebûn, belam be corêk çare her dekiran.

Em şêwazaney mamostayan bo pêşwazî le fêrxwazan bûwe - û êstaş wehaye - handerêkî girîng le hewilî gorankarîy bo firewandinî dêmokrasî, yeksanîy zayend û serxistinî berpirsayetîy takekes le fêgeda.

¹⁶ Xoxwast: bexîlî, hesûdî.

¹⁷ Derûnsarêj: saykoterapîst, psychotherapist. Derûnsarêjî: saykuterapî, psychotherapy.

¹⁸ Xotwan: twanay xo.

Ême mewdayekî başiman birîwe piştew ew şêwaze salarperistey hebû le fêrgeda beranber mindal û fêrxwaz. Eme karîgerîy heye Leser pîşey mamostayetî. Fêrgeyek cexit Leser giwêrayelî û yekdîd bikat mercî taybetî heye Leser mamosta. Fêrgeyekîş cexit Leser berpirsayetî û guncandin bikat mercî taybet - belam ciyawaz -î heye. Dekirêt bilên eme kare le dû ferhengda: ferhengî giwêrayelî û ferhengî berpirsayetî.

Fêrgey serbe ferhengî giwêrayelî sextgîre, mewda le fêrxwaz û dayikûbab degirêt. Babetî giwêrayelî, zanyarî serbe salarperistî, kontrol û birwaname girîngin. Fêrgey serbe ferhengî berpirsayetî jîngeyek dereksênêt sîngfirewan, nêzikayetîy ziyatir le nêwan mamosta û fêrxwaz, mamosta û dayikûbab, rêberayetîy fêrge û mamostayan. Lêreda cexit Leser amanc, berpirsayetîy kesekî, bîrdanewe wek serçaweyekî zanyar, harîkarî û firajûtinî kesekîye. (Le çapterî şeşemda dême ser basî zanyarî serbe salarperistî û zanyarî serbe bîrdanewe).

Le fêrgey serbe ferhengî berpirsayetîda karî mamosta dinedanî tenha firajûtinî zanyar nîye lay fêrxwaz belkû firajûtinî civakîşe ke dekatewe hestî xonasîn û twanay harîkarî legel kesanî dîke. Kewate twanay civakî lay mamosta xoyîşî be radey twanay le wanekanî xwêndinda girînge.

Firajûtinî sertaserîy civakîş heta dêt ziyatir daway twanay civakî dekat le kesêk daway kar bikat bo ewey bête damezirandin. Çemikî twanay civakî be şêwey corawcor dête bekarhênan belam begîştî mebest lêy riskanî sozekî û twanay helkirdine letek kesanî dîke. Lem kitêbeda min weham be baş zanî em basane cuda bikemewe, beşêkî basî "*riskanî sozekî*" -ye, ke dekatewe twanay cilewgirtinî hestî xo, beşêkî basî "*twanistî hevbandkarî*" -ye, ke dekatewe twanay helkirdin legel kesanî dîke be corêkî ayetî.

Be boçûnî min hokarî zorbey kêşekanî fêrgey emro degerêtewe bo kizîy zanyar û peybirdin bewey mamosta le ferhengî berpirsayetîda pêwîstî be terxankirdinî kate bo serxsinî twanistî sozekî û hevbandkarîy xoyîşî. Lewaneyîşe katî hatibêt bîrêk bikeynewe le çaksazîy prosey wergirtin le rişte corawcorekanî mamostayetîda.

Ew rexneyey le mîdyada arastey şêwazî karî fêrge dekirêt rêk rûy le hawsemay nêwan mamosta û fêrxwaze. Gazende heye le pergâl, le zimanî zbir û rûşkên, le xodizînewey fêrxwaz le fêrge û le kizîy rêz le salarîyekanî nêw fêrge. Belam geran le dûy hokar û çareser le ferhengî giwêrayelîda dekirêt ke bûnî nemawe. Xawîy perînewe le ferhengî giwêrayelîyewe bo ferhengî berpirsayetî (ewe penca sale lêdanî mindal yasaxe) lem salaney dûwayîda bote hoy badanewey pendol, eweta le demî em nûsînedan hem siyasetmedar û hem beşêk le fêrkaran kewtûnete ser daway amirazî serber ferhengî giwêrayelî bo çarey kêşekanî perînewe bo ferhengî berpirsayetî. Nimûney ew amirazane nimoreye le pergâl û reftarda, deselatî ziyatir bo mamosta ta bitwanêt pena berête ber çarey cilewgîrane, firewandinî rêsa û yasaxkirdin, teskandinî hawbiryarî û axaftin.

Hoy em diyardeyêş be dîdî min hemwar nekirdinî bernamey xwêndinî mamostayetî û xwêndinî dewamedare bo guncan legel mercekanî fermannamey fêrkarî¹⁹ derbarey hevbandîy gorawî nêwan mamosta û fêrxwaz. Mercî ferhengî berpirsayetî Leser fêrge û xwêndin be rûnî le "planî fêrkarî" û fermannamey dîkeda nûsirawin. Zanist derbarey kame cor perwerdey zarok başe bo ewey le temenêkî herastir û civakêkî dêmokratda baştir amadey berpirsayetî bêt, heta dêt zortir debêt. Belam tojînewey niwê derbarey pêwîstîye derûnî, fizîkî û civakîye bingeyîyekanî mirov zor kem cêyan girtûwe le bername corawcorekanî xwêndinî mamostayetda. Katî tewawîş terxan nakirêt bo tojînewey û pêxistinî ew twanistî sozekî û hevbandkarîyey mamostay hawçerx pêwîstiyetî bo pirkirdinewey

¹⁹ Fermannamey fêrkarî: fermanekanî bingey fêrkarîye bo arastekirdinî xwêndin, beranber "*styrdokument*" -î swêdî hatûwe.

mercekanî planî fêrkarî. Awatî min eweye em kitêbe bibête handerêk bo rakêşanî serinc berew ew dozgele.

Erê çî bû, mamostayekit dozîyewe girîng bûbêt bo firajûtinî xot? Zanît taybetmendîy ew mamostaye çî bû? Çî bûwe hokarî ew hengawey to nat rûwew helkişan? Herçonêk bêt, pêm waye bîroke û hestêkî hênirane wirûjandin debine seretayekî baş bo xwêndinewey em kitêbe. Bo qûlbûnewey bîrkirdinewe le hevbendîy mamosta û fêrxwaz le fêrgey sedey bîstuyekemda, ezimûnekanî xot debine tewawkerî em têkste.

Çapterî yekem: Le ferhengî giwêrayelîyewe bo ferhengî berpirsayetî

Lem demeda civakî Swêd berastî kewtote bizawtin piştew ferhengî nerêtîy giwêralî û rûwew ferhengêk têyda weestogirtinî berpirsayetîy mirov heta dêt girîngtir debêt. Em gorankariye hem cihanî fêrge degirêtewe û hem dîdiman bo çemikî xwêndin.

Katêk Robert û Arvîd -î cûte sepan le filimî “Koçber²⁰ *Utvandrarna*” -y Jan Troell²¹ da xoyan amade deken bo lêpirsînewey salaney xizmetguzarî, Robert baş dezanêt çon welamî em pirsiyare bidatewe: “*Kên ewaney pêyan degutirêt serwer?*” Xoy û Arvîd heft “serwer” -yan heye. Yekem Xuda -ye, le xwar ewewe ustandare, paşan “*fermangey zewitkar*”²² û ewca serkarî dewlet, karmendî serkar, keşîş û le kotada ew cûtyarey karî le la deken. Emane ew serweranen “*bepêy fermanî yezdan deselatêkî bawikaneyan heye beser êmeda, wek fermanîdar, mamosta û serekxêzan*”.

Em perdeye pêşanî dedat çon ew dû lawe xoyan radehênin be welamdanewey dirust le lêpirsînewey xizmetguzarîda û be ciwanî ew ferhengî giwêrayelîye aşkira dekat ke raburdûmanî degirtewe û herweha çendîş asayî bûwe ew ferhenge bo ewaney têyda dejiyan. Femandaran yezdanizade bûn û leber ewe deba mirov giwêrayelîyan ban.

Belam kitêbeka Vilhelm Moberg²³ derbarey koçî swêdîyan bo Amerîka bas le berengarîy ew xelkeş deken ke giwêrayelîyan nedeselimand bo ew femandarey bedkarî be deselatekewe dekirde. Ewe tenha nehatî û pêwîstîy maddî nîye mirov han dedat bo koç, bigire daway weestogirtinî berpirsayetîy jiyanî xo û daway lêselimandine bew bawerey heyetî. Mirov berengarî ew giwêrayelîye debêtewe ke leser dogm (wişkebawer) damezirawe nek leser wîstî mirov û twanay weestogirtinî berpirsayetîy xo û kesanî dîke.

Êsta ke ême pişt dekeyne ferhengî giwêrayelî rûwew ferhengêkî ziyatir dêmokrat, karêke peywest bew gorankariye civakîyey em penca şêst saley raburd. Pêşkewtinî “*teknolojiy agadarî*”²⁴ (IT) azadîy

²⁰ Koçber: kesaneke koç deken piştew zêdî xoyan, beranber “*koçhên*” bo kesaneke koç deken rûwew nîştîmanî niwê.

²¹ Jan Troell (1931-) sînemakarî nawdarî Swêde, le şakarekanî:

- Koçber “*Utvandrarna*” (1971)
- Danîştwanî niwê “*Nybyggarna*” (1972)

²² Fermangey zewitkar: fermangeyekî dewletîye karî eweye samanî xelk zewit bikat beranber dawayekî leseryane.

²³ Vilhelm Moberg (1898-1973): nûser û rojnamenûsî swêdî, yek le berheme nawdarekanî çîwarîney “*koçbarî*” -ye ke birîtîye le:

- Koçber “*Utvandrarna*” (1949)
- Koçhên “*Invandrarna*” (1952)
- Danîştwanî niwê “*Nybyggarna*” (1956)
- Dûwa name bo Swêd “*Sista brevet till Sverige*” (1959)

²⁴ Agadarî: information. Le nûsînî kurdîy em rojgareda weha bawe “*zanyarî*” bo *information* belam “*zanyarî*” kêşey têkgîrsanî heye legel çemikî “*zanyar*” ke dekatewe “*knowledge*” wata “*zanist û huner*”. Em “*zanyar*” -e xoyetî le nawî “*Korî Zanyarî Kurd*” da heye û her diyariy ew kore xoyîşyetî.

Bo pêşandanî çiyawazîy *zanyar* û *agadarî*, degutirêt: *agadarî zanyarêkî rageyendirawe*. Bo rûnkirdinewey ziyatir derbarey “*zanyar*” birwane: Celîzade, “*Zarawesazîy pêwane*”.

helbijardin le buwarî hemecorda, cîhangîrî û tojînewey niwê derbarey helûmercî zîndewernasî (bayolojî), derûnnasî û civakî pêşanî dedat ke ême detwanîn û pêwîstîşe çalakanetir le pêşû helwêst bigirîn le karûbarî xoman û civak.

Emro zor mamostay fêrgey Swêd dekoşin bo gorînî saxtargelî konî deselat ke binemayan ezimûnî ekadêmî û helûmercî salarpestaneyê be saxtarî dîkey binemayan harîkarî, mitmane û berpirsayetîy hawbeş bê. Leber ewey çîdî zanyar pawanî fêrge nîye, binemay salarîy mamosta birwanamey nîye ba zorîş beriz bê, belkû riskanî kesayetîye û twanayetî bo sazkindinî hevberdîy baş letek fêrxwazda. (helbet mebest ewe nîye birwaname nagirînge).

Legel eweşda debînîn twanistî sozekî û hevberdkarî le xwêndinî mamostayetî û xwêndinî dewamedarda zor cêy serinc nîn. Weha seyr dekirên ke her lexora hebin, beweş zor mamosta û berêweber naçarin her bo xoyan nakokî û berengarbûnewey sext çare biken be bê ew amirazgeley emro berdestin û kareke hem hasantir deken û hem pitir serincrakêş û pirwata. Beşêk lew amirazane lem kitêbeda dêne berbas.

Ewe hêzî dêmokratxwaz nebû salî 1842, destûrî "*Erikî giştîy xwêndin*"²⁵ -î piyade kird, belkû hêzî abûrî û siyasîy deselatxwazane bû. Perînewe le civakî kiştukalewe bo civakî pîşesazî daway gelêkî xwêndewarî dekir. Ew firajûtine teknîkîye meziney bûwe mayey zengînî û xoşguzeranîy bo danîştwanî welat çî derfetêkî nedebû bebê sepanîy fêrgey giştî û naçarî bo hemû zarokan. Legel eweşda hawkat zemîney xoş kird bo firajûtinêkî dêmokratane çunke gel fêrbûn nawerokî peymanname û girêbest bixwênewe û le dozî corawcorda helwêst werbigirin le peyamî kesanî dîkey beder lew heft serwery basyan hat. Aştî, mafî giştîy dengdan û "*giyanî Saltsjöbad*"²⁶ zemîney bo firajûtinêkî dêmokratane berîntir xoş kird, têyda letek giwêrayelî bo fermanbaran, weestogirtinî berpirsayetî le naxî mirovî hawzêdda derfetêkî rûntirî bo saz bû.

Ew ferhengî giwêrayelîye bû wehay kird gelî Swêd xûy xwardinî xoy bigorêt. Paş rageyandêkî salanî 1970 kan katêk "*encumenî civakî*"²⁷ daway kird gel nan ziyatir bixwat. Eweş berhemî ferhengî berpirsayetîye emro gewre pirs be zarok dekat wîstî çîye, nek wek caran bilên "*wîstî to le daristane*".²⁸

Ewe berhemî ferhengî giwêrayelîye siyasetmedaran - ewendey min bizanim fêrkaran kemtir - daway çareserî tundtir deken le fêrgeda û daway deselatî ziyatir deken bo mamosta ta bitwanêt pena berête ber çareserî cilewgîrane, belam ferhengî berpirsayetî pitir cexit dekat Leser pêkhatinî mamosta û fêrxwaz.

Ferhengî giwêrayelî serinc le rast û hele, baş û bed, siza û xelat gîr dekat. Ferhengî berpirsayetî kat pitir terxan dekat bo rîşedoziy çonetîy peybirdin, bînin û çarekirdinî layenî sûdbexş le kobûnewey mirovgelda.

²⁵ Destûrî "*erikî giştîy xwêndin*" yasay xwêndin dekate erikêkî giştî le welatekeda. Ger guncaw bê, lewaneyê bo nimûne "*erikî giştîy serbazî*" û erikî giştîy be zarawe birwat.

²⁶ Peymanî Saltsjöbad: "*Saltsjöbadsavtalet*" peymanêkî girîngî Swêde, salî 1938 le nêwan sandîkay kirêkaran û komeley xawenkaran bestira. Lew peymanameyêda destawêjekanî mîlmilanêy herdû berey bazarî kar: kirêkar û xawenkar, biryar diran. Her lew peymanameyêda normî pêkhatinî herdû berey bazarî kar bê destitêwerdanî mîrî bizmarrêj kira. Em "*peymanî Saltsjöbad*" e lew demewe bûwe rêniwên bo peymanbestinî dîke û "*giyanî Saltsjöbad*" bûwe çemik. *Saltsjöbad* nawî nawçeyekî Stockholm-e ew peymaney lê bestira.

²⁷ Encumenî civakî: le Swêd encumenêkî fermanrewaye, lejêr çetirî wezaretî civakîda serperîştîy buwarî saxlemî (tendirustî), çawdêrî û dermansazî dekat.

²⁸ *Wîstî to le daristane*: pendêkî swêdiye be watay: wîstî to be hend nagîrêt çunke to mindalîf.

Hemû kes daway keşî aram dekat le polda belam çon ew aramîye dabîn bikirêt basêke ême leserî nakokîn. Le mêj nîye le xwêndinda şermandin²⁹ be destawêjêkî başî fêrkarî dejimêdira û êstaş nawenawe şermandin le fêrgey Swêdda debînret. Aye çend kes şarezay tojînewey niwên derbarey derhawîştey nayetîy şermandin leser twanay fêrbûn? Lem buwareda tojînewey niwê firen belam hêšta nexirawinete bernamew xwêndinî mamostayetîyewe. Huner lewedaye dû bas cuda bikeynewe: key şermandin karêkî rewaye bo yarmetî fêrxwaz reftarî xoy bigorêt, key şermandin birîtîye le derbirînî tûreyî û xosepênîy mamosta. Emey dûhem wergirtinî zanistî niwê le mindal rêbest dekat û beweş fêrbûn sextitir debêt. Wêray ewey şermandinî zor debête mayey bêşerimî. Nimûneş lêreda ew fêrxwazeye ke berdewam şikest dehênêt le waney fêrgeda û hestî şermezari deygirêt, belam bo sarêjkirdinî şermezariyekey xoy hîç çareyekî nîye cige le dirî, têkdan, rûşkênî û xosepandin beranber mamosta û fêrxwazî dîke.

Emro ême le mêjûy xomanewe û le raportî mêdyawe derbarey welatanî dîke baş dezanîn çî proseyekî mezine bo welatêk bîhewêt le fermanariyekî nademokranewe derbaz bêt bo fermanariyekî têyda twanay hawzêdan û mafî beşdarîyan le guzeranî siyasîda bête rêzgirtin û pejrandin.³⁰ lemyanda debêt mitmane bidirête Arvid û Robert - yiş beşdar bin û karigerîyan hebêt. Biryar, lay ewaney biryar deyangirêtewe, cêgir bikirêt. Rêz tenanet lewaneş bigirêt ke boçûnyan ciyawaze le boçûnî bawî zorîne.

Kewate pêwîste mitmane hebêt bewey prosey dêmokrasî hem derfetî heye û hem cêy daxwazîye. Ew mitmaneye le arada nebêt, destefermanî çawerêmane. Ewsa kesanêk ko debinewe û piştîwanî le piyawêkî behêz deken ke bitwanêt mişt le mêz bidat û ferman derkat bo raperandinî karûbar, piyawêk naçar nebêt giwê bo peyamî Arvid û Robert radêret, tenha erikî helsûranî karûbar bêt.

Perîneweş le ferhengî giwêrayeliyewe bo ferhengî berpirsayetî le fêrgeda proseyekî mezinî lew babeteye. Beşêkîman birîwe belam zorman mawe.

Ferhengî berpirsayetî, be pêçewaney ferhengî giwêrayeli, dawa dekat mamosta û fêrxwaz wêray zanistî nerêtîy fêrge, le prosey riskanî hestekîda piştîwanî bikirên, emyan le naxda hestî berpirsayetî serdexat û rê bo jiyânêkî xoş be watayekî akarmendane saz dekat. Ême pêwîstiman be dîdekî niwêye le zanyar ke têyda riskanî sozekî û twanay sazkindinî hevbendîy baş behend bigirên, ba pêwane û xiştendîy em core zanyare sextîş bêt. Emro serleberî em buwarî zanyare dirawete dest rêkewt. Hemîşe berêweber û mamosta hebûn be karameyî xoyan astî zanist, riskanî sozekî û hevbendkarîy fêrgey xoyan serxistûwe, belam pêwîste tojînewey ziyatir hebêt derbarey taybetmendîy ew core kesane.

Em prosey gorankariye birîtîye lewey mirov kemtir “derekîferman” bêt, be watay giwêrayeli mîkanîkaney biryarî derekî, biryarî kesanî dîke bêt, û pitir “xoferman” bêt, wate bo xoy berpirsayetîy bijare û helwêstî xoy bigirête esto, serferaz bêt. Mebestîş ewe nîye mirov tewaw serbexo gişt biryarêk bidat, belkû biryareke bayî ewende bîrî lê kirabêtewe û binemay hebêt ke mirov derfetêkî tewawî hebêt wek kes berpirsayetîyekey bigirête esto.

Derfetî helbijardin û berpirsayetî bo zor kes diyardeyekî geş û berxwaste, belam bedem alozkanî guzeran û ziyadbûnî bijarekanî jiyânî rojane, pêwîstiman pitir be komek debêt bo rêkirdin. Nexoşîy derûnî cewanan lem salaney dûwayîda baştirîn amajeye bo em diyardeye. “*Dezgey saxlemîy gel*” le raportî “*Cewanan, stirês û nexoşîy derûnî*”³¹ delêt jimarey cewanan ke çareserî derûnyan wergirtûwe le seretay sedey bîstuyekemda be berawird legel bîst sal pêştir heşt caran ziyadî kirdûwe. Hokarekeşî

²⁹ Şermandin: şermezarkirdin û şikandinewey kesî beranber.

³⁰ Pejrandin: danpêdanan recognition.

³¹ *Statens folkhälsoinstitut. Ungdomar, stress och psykisk ohälsa (SOU 2006:77).*

be pêy ew raporte degerêtewe bo zorîy ew hemû bijare û derfetaney dête rêyan katêk dêne ser pêkhênanî jiyani xoyan, hawkat kêberkê bo dozînewey kar sextitir debêt û mercî serkewtin le kar û jiyani kesekîda lêyan debête twanabeder.

Mirov xebat dekarat bo wedesthênanî azadî û derfet, belam ew hemû bijareyey dête rêy cewanan lewaneye bibine kêşe. Herzekarêkî wêl pêmi gut: “ger şikest bihênim her xomim kemterxem”. Cewan zorin lem xaleda berpirsayetîyekî ziyad degirne esto. Perînewe le ferhengî giwêrayeliyewe bo ferhengî berpirsayetî pêwîstî be kat heye û dawa le civak û fêrge dekarat le buwarî firajûtinî sozekî û hevbendkarîda berpirsayetîyekî gewretir bigirne esto lewey emro heye.

Demew kotay sedey bîstem zor le axêweranî karûbarî civakî hoşdarîyan deda lewey Swêd berêweye berew civakî “*dû - leser - sê*”. Emro ewe dakewte³² û deybinîn. Zorînewey hen xoyan be beşekî “*nêwcivak*” debînin û layekî dîkeş heye lay hem xoyan û hem dewrûber be “*civakbeder*” dêne jimardin. Nêzîke sêyekî civak be perawêzxiraw dadenrêt. Ewane kesanêkin lêyan naselimênrêt, rêzyan lê nagîrêt û nayene pejrandin le mafî xoyanda be heman ew corey bo danîştwanî dîke heye. Lewane kesanî bêkar, nexoşî dûrmewda, koçhênî le bazarî karda dekewine ber helawêrdin,³³ kesanî griftdarî leşekî yan derûnî, ew zarokaney pêwîstîyekanyan reşaw nagîrêt, kesanî alûde³⁴ û tawankaran. Le fêrge da ême hêşta kar leser çemikî wek: “napesend, pesend, zor baş û nayab” dekeyn. Dilnyam zor fêrxwaz hen nimire be layanewe tenha bo pêwaney berhemkarîy buwarêkî sinûrdar nîye, belkû pêwaneye bo astî mirovbûnî xoyan. Pêw waye le derewey dunyay fêrgeş zor kes heye hest dekarat tirincênirawete ew destebendîyewe.

Zanyarnorînêkî niwê, bo nimûne pêwîstîye bineretîyekanî mirov bo peywestî asûde, twanay cilewgirtinî hestî xo û sazkindinî hevbendîy heta dekarat baş letek kesanî dîkeda, detwanêt wirdekarî ziyatir bidate karûbarî fêrge. Giftûgoy nêwan mamosta, berêweber û tojeran yek lew rêgeyaneye bo ewey bizanîn çî başe bikirêt le fêrge da bo çareserî perawêzxistin û nexoşîy derûnî.

Çareserêkî taradeyek hasan belam karîger rexsandinî derfete bo fêrxwazan mawemawe legel gewresalêkî karameda le grûpî piçûkda ko bibinewe û bas le barudoxî fêrge biken. Fêrxwaz zorin ke daway kesî gewresal deken giwê bo cewanan radêrêt, bo xwast û boçûnyan, bo dîdyan beranber xoyan û kesanî dîke. Waney “*jînnasî*”, ke mxabin weha pê deçêt le demî em nûsînedada salî 2007 rûy le pûkanewe bêt, buwarêkî lew babete bû. Lewaneye lay zor kes em “*grûpî giftûgo*” -ye çareyekî tewaw sakar bêt, belam be boçûnî min nek تنها stirês û nexoşî kem dekatewe bigire debête mayey firajûtinî kesekîy fêrxwazan. “*Grûpî rêniwênî*” -y mamostayan, ke heta dêt ziyatir pere destênêt, ew karîgerîyey pêşan dawe leser fêrkanî beşdar lew grûpaneda.

Helbet çareserî dîkeş her pêwîstin belam çunke rûkarî sozekî û hevbendkarîy xwêndin û zanist be kirdewe nêzîkey tewaw feramoş kirawin, boye sûdêkî gewrey debêt ger derfet bidirête bîrdanewey hawbeş derbarey em base. Mebest ewe nîye mamosta bibête derûnsarêj (terapêst), ewende bese bitwanin sûd lew twana pişewerîye bigirin ke derbarey giwêradêrane. Dilnyam zor le xwêneran amojgarîy başyan heye derbarey hem çonetîy rêkxistinî ew core grûpaney giftûgo, hem çî pêwîste le xwêndinî dewamedarda û hem rêniwênî bo ew kesanî erikî rêberayetîy giftûgoy weha degirne esto.

Ême êsta dezanîn ke dekarat pere bidirêt be twanistî sozekî û hevbendkarî lay hem zarok û hem gewresalan. Deşzanîn zanyar lew buwaraneda begîştî debine hander bo fêrbûnî qûl, ne تنها rûkeş. Wek mamostayekî amadeyî zor car peroşî zanyar debûm lew buwaraneda, lay hem xom û hem hawkaranim û beçawî sersamî û kemêk xoxwastîyewe demnorîye ew hawkaraney xom ke xawen

³² Dakewt: reality.

³³ Helawêrdin: discrimination.

³⁴ Alûde: gîrodey mey û maddey hoşber.

twanay lêselimêniraw bûn û rêk leber eweş astêkî berzî pîşewerîyan le karda pêşkeş dekird. Paşan wek derûnsarêj lêm rûn bowe karîgerîy barî derûnî çende Leser gişt xerîkandiniman. Têşgeyîştîm ke jîrî û hest, her wek leş û derûn, girêdirawî yekdîn.

Deysa werin bizanîn ferhengî berpirsayetî çî pêwîste le riskanî sozekî û twanistî hevbandkarî û bizanîn çî karîgerîyekî heye Leser karûbarî rojaney fêrge.

Çapterî dûhem: Asûdeyî û fêrbûn girêdirawî yekdîn

Pirsiyarêk le xwêner dekeme destpêkî em beşe: mindalî xotî lê derçêt, kên ew sê kesey her le hatine dunyatewe heta emro karîgerîyê dûrmewdayan Leser to hebûwe? Deşê sereta weha bête berçaw ke bersivî pirsiyarî weha bineretî û qûlî kesekî katî gerek bêt, min pê m wa nîye katêkî zorî bûwê heta ew sê kese xoyan bo nîgayê nêwekîyê mirov xuya³⁵ deken. Cige leweş pê m waye wênekan şepolêk yadewerîyê beçêj le deng, bon, leş û hest be letekdabûnê ew mirove be dû xoyanda dehênin. Beşêk pitir xeyal le asûdeyî, xoşewîstî û hawbendî dekenewe, beşêkî dîke le nasûdeyî, nîgeranî û tenhayî, lewaneyîşe le satî şadimanî û aramî. Ca ger paşan pirsiyar bikem aye çî rû deda ger peywendî le gel ew kesane bihataye piçiran ber lewey geyîştbane em aste girînge? Pê m waye xwêner deygut ewsa kesî dîke peyda debûn û jiyânî emrom corêkî dîke debû.

Beşêkî sengîn le tojînewe derbarey firajûtîni mirovayetî rêk em base degirêtewe û le çemik degerêt bo *“meylî zigmakî mirov bo sazkindinî hevbendîyê hestekîyê behêz le gel kesanî girîngî dîkeda”*. Em pêwîstîye be dirêjayî jiyân heye û tenha bo salanî seretay mindalî nîye. Em buwarey tojînewe, be swêdî nawnirawe *“anknytningsteori”*, zor car be îngilîzî destewajey *“attachment theory”* bo bekar dehênrêt.³⁶ Dû kesayetîyê pêşeng lem baseda birîtin le pizîşkî îngilîz: John Bowlby (1907-1990) -î xawen çendîn berhem, *A Secure Base* (1988) yekiyane. Kesayetîyê dûhem tojerî hawkaryetî: Mary Ainsworth (1913-1999) -î nawdare be tojînewey *A strange situation* derbarey şewazî corawcorî sazkindinî hevbendî (le kitêbekey xomda *“Pedagogens inre rum”* - *“Naxî fêrkar”* (2004) da em basem rûn kirdotewe).

Lêreda em babete rûberêkî taradeyek firewan dagîr dekat çunke reftarî peywestbûn girêdirawî reftarî peydozane ye û beweş debête girêdirawî twanay mirov bo peydakirdin û piyadekirdinî zanistî niwê. Her bo nimûne, şewazî mamosta bo rakêşanî kesî beranber û helkirdinî leteke kesanî dîkeda, sengî yekcar gewreyê heye bo diyarîkirdinî ew komekey fêrxwaz pêy debirêt bo wedesthênanî zanistî niwê. Şewazî helsûkewtî fêrxwazanîş kar deken ser şewazî fêrkarîyê mamosta.

Wedesthênanî agadarîyê riwaletî le babetî hemecorda karêke be gişt kes dekirêt, belam ger biryare zanyar çalak û têkbeste bêt pêwîstiman be mamostayê riskanî sozekî û twanay sazkindinî hevbendîyê geşî hebêt le gel kesanî dîkeda. Eweye hasankarî dekat bo fêrxwaz zanyarêk peyda biken wata û bestên bidate jiyân û bibête yarîder bo firajûtîni twanay helsengandin û berpirsayetî. Lem bestêneda ezimûnî peywestbûn noreyan mezine. Ca leber emeye çend lapereyekim terxan kirdûwe bo derencamekanî tojînewey peywestbûn.

Ber lewey biçime nêw basekewe delêm hemû hevbendîyek nabine hevbendîyê peywestbûn. Peywestbûn girêdirawî wîstî asûdeyî û parastine le metirsî, ger ew pêwîstîye dabîn bû ewsa cêy hevbendîyê hevaletî, hawkaretî û corî dîkey hawdemî ke mebest lêyan şitêkî dîkeye nek asûdeyî nêwekî û parastinî derekî. Belam ew hevbendîyaneş dekwine bertawî nexşe bineretîyekanî peywestbûn lay kesanî beşdar.

Hevbendîyê peywestbûnî asûde be gutey Bowlby de kate *“binemayekî asûde”* a secure base ke debête serşar bo peydozîyê dîkey xo û dewrûber. Katêk binemay asûde dête dameziran ewca reftarî

³⁵ Xuyakirdin: pêşandan, aşkirakirdin.

³⁶ Bîrdozey peywestbûn: attachment theory.

peydozane çalak debêt û haniman dedat bo derbazbûn le hevbendîy peywestbûn û rûkirdine dunya û lewê fêrî serferazî debîn.

Hestî asûdeyî (yan kizîy asûdeyî) girêdirawî ezimûnî zûtirî mirove le nêzîkayetî û parastin le demî tirs û naaramîda. Giştiman dezanîn tirs û nasûdeyî nêwxo lewey cêman nebêtewe le civakda debête berbest le serincgîrî le karda û rêgir le fêrbûnî babetî niwê. Emeyan hem êmey fêrkar degirêtewe û hem fêrxwaz. Belam ger asûdeyî cêgir bêt ewa serincgîrî hasan û fêrbûn xoş debin.

Kewate bas le dû sîstemî ciyawazî reftare. Yekiyar rûy le nêzîkayetîye û yekiyar piştew nêzîkayetî rûy le derewe ye bo peydozîy dunyay nezaniraw. Êmey mamosta dezanîn ragirtinî hawsengîy em dû diyardeye çend dijware: pêwîstîy fêrxwaz bo rotîn, erikî diyarîkiraw û serincdanî berdewam le êmey mamostawe le layek û pêwîstîyan bo azadî û serxobûn le geran bedûway zanyarda le layekî dîke. Mamosta debêt xerîkî hatûço bêt le nêwan dû cemserda: wabesteyî û awtonomî, nêzîkayetî û mewdagîrî, sinûrdarî û azadî. Mamosta heye le hevbendîy wabesteyîda baştir heldeken û lewaneye bibine hokar bo xefekirdinî koşanî fêrxwaz rûwew serxobûn. Mamostay dîke heye baştir legel fêrxwazêkda hel dekar xoy zorbey karûbarî xoy raperênêt, lêreşda meylêk heye bo feramoşkirdinî pêwîstîy fêrxwaz bo rêniwênî û komek. Mamosta heye berpîrsayetîy fêrxwaz tesk dekatewe û heyşe ziyad firewanî dekar û... htd. Bo dozînewey hawsengîyekî lebar, mamosta pêwîstî be kate bo bîrkirdinewe le şêwazî hevbendîyekanî xoy.

Şêwazî helkirdin bedem salanî riskanewe le mirovda peyda debin û begîştî taser legelî demênin û karîgerîyan debêt leser hevbendîy mamosta û fêrxwaz. Şêwazî nayetî le peywendîgirtinda pêwîstî be gorankarî debêt û ew kare daway mewda dekar bo ewey mamosta bîr bikatewe lewey katî kobûnewey legel fêrxwazda rû dedat û reftarî xoy çî karîgerîyekî heye leser ew harîkarîye.

Xalî hîwabexş eweye emro tojeran pêyan waye layenî here karîger leser reftarî ême beserhatî mindalîman nîye belkû lêkdanewe êmeye bo ew beserhate. Kewate bîr le “çî” dekeynewe le hevbendîy peywestbûnî raburdûda girîng nîye, girîng “çon”-e. Girîng nîye bas le “çî” dekeyn, belkû “çon” -î bas dekeyn, karîgerî heye leser derfetî xoman bo gorînî şêwazî nayetîy reftarman. Boye min pêm waye karêkî başe ger ew kesey benyaze bibête mamosta le mawey xwêndinekey xoyda derfetî hebêt bîr le mêjûy jiyani xoy bikatewe. Çonetîy em kare welamî rûnî lay min nîye, belam dilnyam zor le xwêneran pêşnyazyan heye bo em mebeste.

Fêrxwazanîş pêwîstîyan be derfete bo axaftin derbarey hest û hevbendîy legel kesani dîke le katî karî rojaneda. Mamostayek mewday hebûbêt bo bîrdanewe le xoy û şêwazî hevbendîy xoy be kesani dîkewe baştir detwanêt hawkar bêt le axaftinî fêrxwazanda wek le mamostayekî ew heley bo nerexsabêt.

Peywestî asûde û nasûde³⁷

Derûnnas û tojerî îngilîz John Bowlby her zû kewte ser xulyay tojînewe le karîgerîy dabiranî zarokî biçûk le temenêkî zûda le dayikûbabî. Tojer boy xuya bû ke dabiran le dayikûbab, leber her hoyek bêt, bo nimûne kewtine nexoxane, dûr nîye zamî derûnî be dirêjayî temen le mindalekda cê bihêlêt. Hokerîş birîtîye lewey pêwîstîy mirov bo besterî behêzî derûnî be yek yan çend kesêkewe hêndey pêwîstîy xorak - bigire ziyatirîş - sextgîre. Yekem mebestî peywestbûn birîtîye le zîndûmanî fizîkî û

³⁷ Peywestî asûde: secure attachment û peywestî nasûde (naasûde), insecure attachment.

derûnîy mirov û destawêjîş birîtîye lewey be şêwazî corawcor yek yan çend kesêkî dewrûber xerîk bikeyt bo dabînkirdinî ew zîndûmane.

Leber eweyişe cînî zarokî newzad weha bernamerêj kirawe le peywendî bigerêt û her le seretawe amaden bo peywendî be kesanêkewe yarmetîyan biden bo firajûtin. Ger hevbendîyeke asûde bêt ewa reftarî peydozane dekwête ger û mindaleke heta dêt twanay baştir debêt bo diyarîkirdin û terazkirdinî berdaşt û diney hem nêwêkî û hem derekî.

Bem core mirov wurdewirde fêr debêt cilewî hestî xoy be corêk bigirêt, ne bigate helçûn û ne naçarî xefekirdin bêt. Her lêreda mirov pey debat bewey kesanî dîkeş hestyan heye û hestekanyan ciyawazin lewey xoy û deşbêt le kobendîda behendyan bigirêt.

Peywestî asûde daway amadebûn, lêbîstin û peroşîy hestekî dekat le yek yan çend kesêkî peroş. Bowlby pêşanî dawe çend sexte bo zorbey kes, betaybet zarok, zal bin beser dabiranî dirêjxayan lewaney mirov girêdirawyan.

Mary Ainsworth ke çendîn sal hawkarî bowlby bû, le tojînewekanîda derbarey dayik û zarok (temen 12-18 mang) pêşanî dawe ke hevbendîy zûtirî zarok letek serperîştekey (dayikûbab) karîgerî heye leser geşey reftarî peywestbûn lay ew zaroke. Lêreşda dû şadeste diyarî dekat: peywestî asûde secure attachment û peywestî nasûde insecure attachment.

Mindalî xawen peywestî asûde ewanen kunçkaw debûn le ast lîstokî³⁸ nêw jûrî ezimûnge, xembar û nîgeran debûn katêk dayikiyan bo maweyekî kurt xoy lêyan bizir dekird, belam her zû paş ewey dayik peyda debowe jîr debûnewe û dekwetnewe ser peydozîy jûrî geman. Dayikekan peroşî mindalekanyan bûn, pêwîstîy mindalekanyan behend degirt û bersivî guncawyan hebû bo sîgnalî zarokekanyan.

Mindalî xawen peywestî nasûde le tojînewekey Ainsworth da dû corin: mindalî rara³⁹ yan bexowegilaw.⁴⁰

Zarokî rara ewanen be bizirbûnî dayikiyan tewaw depeşokan û paşanîş dûway hatinewey dayikiyan be hasanî jîr nedebûnewe. Emane daway nêzikayetîy dayikî xoyan dekird belam ke ew nêzikayetîye dabîn debû le tûreyîda retyan dekirdewe û ewca zû dawayan dekirdewe. Katêkî zorî derbird ta dûbare serincyan dedayewe lîstokekanî jûreke û layan sext bû bikewine gemekirdin. Be boçûnî Ainsworth hokarî em bare birîtîye lewey em zarokane xawen dayikanêk bûn pêşbînî le reftaryan nedekira. Carêk bersivî guncawyan debû bo sîgnalî mindalekanyan, carêkî dîke na. Em dayikane leber her hoyek bêt zor bedem pêwîstîy mindalekanewe nedeçûn.

Nexşî peywestî bexowegilan ew mindalaney degirtewe ke bertekiyan pêşan nededa, ne be bizirbûnî dayik û ne be geranewey. Lewe deçû ew baseyan la girîng nebêt. Belam astî horimonî kortîsol⁴¹ ke horimonî stirêse - le xwênyanda zor beriz bû. Gerçî bertekiyan pêşan nededa belam, be çawedizîlke, ewperî serincyan dedaye reftarî dayikiyan, bemeş gemekirdin xefe dekira. Em dayikane be hasanî derikiyan be pêwîstîy mindalekan nedekird û bersivî guncawyan bo sîgnalekanyan nebû. Hokarîş bo em reftarey dayik hemecore, bo nimûne dayikeke tûşî xemokî bûwe yan mindalekey newîstûwe.

Paşan tojerî dîke nimûneyekî dîkeyan diyarî kird le nexşî peywestî nasûde û nawyan na: peywestî peşêw disorganized/disoriented attachment. Emyan basî le dayikanêke gerçî mayey asûden bo mindaleke belam hawkat hereşen leser jiyanyan. Bo nimûne dayikanî xawen nexoşîy derûnî yan zor

³⁸ Lîstok: kelûpelî gemey mindal.

³⁹ Rara: ambivalent.

⁴⁰ Bexowegilan: avoidant.

⁴¹ Kortîsol: cortisol.

alûde. Mindal lêreda dekewête dîlêmmayekî⁴² bêcarewe. Nêzk bibimewe başe yan dûreperêz bim? Rêk êsta kamyar baştire? Handerî çûn bo lay dayik wek handerî xo lê ladan behêze, beweş mindal dekewte barêkewe tojeran nawyan na “xalî tezîn” frozen position - le cêy xoyan detezin, hem be leş û hem be hoş mat debin.

Lem salaney dûwayîda tojînewey zor lem babete kirawe û encamî hawşêweş wergîrawe le hevbendîy bawik û mindal. Bo zanînî ziyatir birwane em şakare: *Handbook of attachment* (1999). Lewêda be dirêjî bas le tojînewekanî em deyan saley dûwayî buwarî peywestbûnî kirawe. Be zimanî swêdîş em kitêbe heye: “*Anknytningsteori - betydelsen av nära känslomässiga relationer*” - “*Bîrdozey peywestbûn – sengî hevbendîy nêzikî hestekî*” (2006).

Nexşekanî peywestbûn le berayî temenda rengirêj debin û binemayan girêdirawî ezimûnî mindalekeye le dozînewey baştirîn rêge bo wedesthênanî parastin û nêzikayetî le kesî serperîşt. Kewate her çîwar nexşekey peywestbûn, le riwangey mindalekewe, baştirîn rêgen. Ger bawikêk be hasanî wîstî mindaleke behend negirêt lewaneye begijdaçûn baştirîn rêge bêt heta dête ser bar. Ger bawikeke her netwanêt behendî bigirêt ewa çar nîye debêt mindaleke hewil bidat xoy karekey xoy raperênêt. Ger dayikêk mayey metirsî bêt leser jiyânî mindaleke, baştirîn rêge bo mindaleke matbûne, xoragirîye bew hîwayey em care hîç karesatêk rû nedat.

Wêray ew dilerawkêyey ezimûnî peywestî nasûde le zarokda peyday dekat, le salanî dûwatirî temen debine hoy astengîy sozekî û hevbendkarî meger mindaleke kesî dîke bidozîtewe bo peywestbûn yan komek bikirêt ta derhawîştay hevbendîyekanî xoy derik bikat. Em derikkirdine weha dekat mirov le bestênî xoyda mewda bigirêt lewey raburd û hewil bidat şewazî dîke bidozîtewe baştir kara bin.

Çîrokekey Tove Jansson derbarey kîjole biçûke tirsinokeke, zor baş, hem ciyawazîy peywestî asûde û nasûde pêşan dedat, hem çareserî sûdbexş çon dexeyte kar.

Tûtîkkî (too-ticki) gutî: Êwe baş dezanin mirov ger wek pêwîst bitirsênrêt be hasanî penhan⁴³ debêt. Ewca kwargehêlkîneyekî xward her le topebefirîneyekî ciwan deçû. Deydey. Em Nînnî (Ninni) - ye be şeweyekî xirap tirsênirawe le layen jinêkewe serperîştî bûwe belam mindalekey xoşnewîstûwe. Min ew jinem dî, zor dizêw bû. Tûre na, eweyan mirov têy degat. Jineke tenha sardusir û twancgo bû.

Dêwe Mûmîn (Moomin) gutî: twancgo çîye?

Tûtîkkî gutî: dey, bêne pêş çawî xot le lîncawêkî kwarg helnûtêyt û bikewîte nêw kwarge xawênkiraweke. Helbet asayî eweye dayikit tûre bêt. Belam nexêr, tûre nebêt. Sard û rimêner bilêt: “têdegem lewey to pêt waye sema weha dekirêt, belam tikaye le nêw xorakekeda ew semaye meke”. Şitêkî lem babete.

Dêwe Mûmîn gutî: wey, çend naxoşe.

Tûtîkkî be selimandinewe gutî: edî, newaye? Ew jineş rêk wehay dekird. Le beyanîyewe heta şew her twancgo bû heta lêwarekanî kiçeke kalbûnewe û penhan ma. Heynîy pêşû her hîç nedebînira. Jineke day be min çunke be gutey xoy natwanêt serperîştîy xizmêk bikat ke tenanet berdîd nebêt.

(Le kitêbî “*Det osynliga barnet*” - “*Mindale penhaneke*” - (1962) lapere 100)

⁴² Dîlêmma: kêşey dûsere, dilemma.

⁴³ Berdîd: diyar, deşet bibînêr, *visible*, pêçewaney “penhan” bo ewey nadiyare, nebînirawe: *invisible*.

Xêzanî “Mûmîn” cêy “Nînnî” dekenewe û DayeMûmîn le penawpêçda nûşteyekî dozîyewe bo tîmarkirdinî “ger nasîyawêk temawî yan lêl bû”. Ew dermaney dedaye Nînnî û berbere baştir debînira. Kareke katxayene û xwêner têdegat lewey dermane rastîyeke birîtiye lew asûdeyî û roşinayîye hestekîyey werî degirêt le nêw xêzaneke. Nînnî hêdî hêdî peywestî DayeMûmîn debêt, ewîş nêzîkayetî dedatê û le metirsî deyparêzêt. Her bo nimûne DayeMûmîn deygut: “lêre lay ême to tewaw asûdeyt. Hergîz bîr lew jine dizêwe mekewe. Ew natwanêt bêt û to berêt...” (lapere 106). Paşan katêk Nînnî dewêrêt berastî tûre bêt, her zor tûre bêt û be rûnî pêşanî bidat, ewca tewaw û serleber berdîd debêt bo hemwan. “DêweMûmîn hawarî kird: ewe debînêrêt, ewe debînêrêt! Ay çend şîrine!” (lapere 114).

Kewate ew corey ême helsûkewt legel dewrûber dekeyn bertawî ezimûnî zûtire. Nêzîkayetî û peroşî, zarok fêr deken çawenor bin pêwîstîyekanyan dabîn bikirêt. Xemsardî û kemasîy peroşî, mindaleke fêr deken dunya cêy mitmane nîye. Derûnnasî firajûtin Erik Homburger Erikson (1902-1994) -î amerîkayî le kitêbî “*Identity, youth, and crisis*” - “*Cewan, nasname û sextang*” (1968) denûsêt:

Wek zûtir amajem pêda, “hestkirdin be mitmaney bineretî” debête pêşmercî bingeyî bo çustîy hoş. Eme meylêkî yekcar zale beser mirov xoy û beser dewrûberda û seretakanîşî degerête bo beserhatekanî salî yekemî temen. Mebestîşim le “mitmane” hem helwêstêke pir hîwa beranber kesanî dîke û hem hestêkî bineretîye le xobawerî.⁴⁴

Ungdomens identitetskriser (1979) lapere 83.

Sengî peywest bo firajûtinî mêşik

Pêşkewtinî demarnasî le buwarî rûmalkirdinî mêşikî mirovda detwanêt yarîderman bêt bo baştir peybirdin be girîngîy hevberdîyekanî peywestî asûde. Ciyawaz le zor giyandarî şîrderî dîke, mirov be mêşikêkewe dezêt zorî mawe ta piley riskanî tewaw. Ew mêşike tenha pêncyekî kêşî mêşikî kesêkî riskawe û ewca firajûtinîşî tenha gîrodey mîratî cênêtik nîye belkû be pileyekî gewreş gîrodey dewrûbere. Emeş betaybet buwarî hestekî û buwarî hevberdkarî degirêtewe.

Demarnasî amerîkayî Paul Maclean (1913-2007) bîrdozey heye derbarey “mêşikî sêpalû”⁴⁵ - mêşikî xişok,⁴⁶ mêşikî şîrderî dêrîn⁴⁷ û mêşikî şîrderî niwê⁴⁸ - em bîrdozeye bas le firajûtinî mêşik dekat bedem rewî resînewe.⁴⁹ Mêşikî xişok welamderî karkirdekanî laskî mêşike,⁵⁰ mêşikî şîrderî dêrîn welamderî mêşikî nawende⁵¹ û mêşikî şîrderî niwê bo twêkilî mêşike.⁵²

⁴⁴ Xobawerî: bawerbexobûn.

⁴⁵ Mêşikî sêpalû: triune brain.

⁴⁶ Mêşikî xişok: reptilian complex.

⁴⁷ Mêşikî şîrderî dêrîn: paleomammalian complex, limbic system.


⁴⁸ Mêşikî şîrderî niwê: neomammalian complex, neocortex.

⁴⁹ Resîn: evolution.

⁵⁰ Laskî mêşik: brainstem.

⁵¹ Mêşikî nawend: diencephalon.

⁵² Twêkilî mêşik: cerebral cortex.



Marianne Sonnby-Borgström. Affekter, affektiv kommunikation och anknytningsmönster (2005).

Ta ew demey newey giyanewer bê serperîştîy taybet twanîwyetî dewame be jîyan bidat, ew mêşike firyay kewtûwe ke têyda bertek û remekî zigmak fermanî reftarî kirdûwe. Bo nimûne reftarî wek xwardin, reftarî serbe zayend, nêzîkbûnewe û dûreperêzî.

Piley dûhemî firajûtînî mêşik legel serheldanî giyardarî şîrderda peyda bû. Peywestî asûde, çawdêrî û peroşî pêwîstbûn bo ewey şîrder bijêt. Emeş daway saxtarî taybetî dekird le mêşikî çawdêrda hebêt bo lêkdanewey pêwîstîy nêzîkayetî û parastinî bêçûwekan û dabînkirdinyan.

Berdewambûnî resîn geyîşt be geşekirdinî twêkilî mêşik neocortex parçey here niwêy mêşik. Emyan bo karkirdî balatire, bo nimûne ramanî derhest,⁵³ bexodaçûnewe, cilewgirtinî crpnî, planrêjîy ayende, helsengandin. Rayelekanî nêwan twêkilî mêşik û mêşikî nawend zemîney saz kird bo ew bestere sozekîye behêzaney hen le nêwan zarok û dayikûbabda û bo ew peroşîyey pêwîste bo temenî dirêjxayenî mindalî.

Ew sê beşey mêşik xawen nêzîkey sed milyar demarxanen, erikiyan wergirtin û helsengandinî agadarîye. Xanekan le torbendîdan û torekanîş le seranserî mêşikda hawkarin. Leber ewe nakirêt bilêyn em zanyare yan ew yadewerîye le cêyekî diyarîkirawî mêşikda heye. Bo nimûne yadewerîy yekem rojiman le fêrge watakêşekêyek⁵⁴ dexate ger gişt mêşik xerîk dekat:

- Çendîn berdaştî hoşekîy derekî dênewe afirandin, bo nimûne: şewaz, reng, bon, şewey xelk
- Seredawî fîzîkî, bo nimûne: girjîy hoş, tezûley zk, pê lertzîn
- Hestî derûnî, bo nimûne: tirs le neguncan, şanazîkirdin be mezinayetî... htd.

Heta harîkarîy nêwan beşe ciyawazekanî mêşik baştir bêt, mirovîş baştir heldesûrêt. Mangî augustîy 2007 giwêbîstî tomarî bernameyekî radyo bûm têyda Peter Eriksson -î kemtemenî tojerî "xanekoleke"⁵⁵ basî dekird çon xoy û hawkaranî seretay salanî dû hezar geyîştin bewey mêşik berdewam xanedemarî niwê dirust dekat, ke zûtir mirov ewey nedezanî. Le ezimûn beser mşkda derkewt ke baştirîn hokar bo ew niwê afirandine birîtîye le jîngeyekî zengîn û alugor, werizş û dûr le stirê. Afirandinî niwê karîgerîy gewrey heye leser twanay yadkirdin û fêrbûn. Bedem bîstinî em basewe bîrim dekirdewe eger letek ewaneda pêwîstîy zigmakî xoyişiman le bûnî wata û bestênî

⁵³ Derhest: abstract, pêçewaney berhest.

⁵⁴ Watakêşekê: association.

⁵⁵ Xanekoleke: stem cell.

bixeyne ser, ewa bernameyekî taradeyek serleberman bo siyasetî fêrkarîy dariştûwe û ewey demênêt helwêst lê wergirtine.

“Radyoy fêrkarî”⁵⁶ bernamey “nhênîyekanî zaroketî” hebû le salanî 2006-da çend carêk le têtê-we pexîş kiran, beşî sêhemî basî le “bîrdozey peyustbûn” dekird. Lewêda pêşan dira ke rûber heye le mêtîkî zarokî zor feramoşkirawda çalakî têda yan zor kize yan her nîye, her ew rûberane lay mindalî asûde cencalin be bester û xalî peywendî û germeçalakî. Nasûdeyî stirêsî lê dezêt û leş bo xoragirî le ast girjî û pestanî weha horimonî kortîsol dênête berhem. Belam stirês ger bîndirêj bêt û çî nawbirêk bo wiçan û gurcbûnewe peyda nebêt, karîgerî nayetîy dexate ser firajûtinî mêtîk. Her bo nimûne tewjimî berdeyamî kortîsol debête hoy xawkirdinewe yan xamoşkirdinî afirandinî xanedemarî niwê.

Kewate firajûtinî torî besterekanî mêtîk bertawî hawsemay zûtirî nêwan mindal û serpeştekeyetî. Zanay amerîkayî Daniel J. Siegel (1957-) nûserî yek le beşekanî kitêbî “Attachment and human survival” - “Peywestbûn û zîndûmanî mirov” (2004) ke rawêjekanî debine serçawey beşêkî nêwerokî em çaptrey min, bas lewe dekat mêtîk çon bertawî ezimûne:

Beserhat çexmaxey sîgnalî demar dedat û emîş cîn taw dedat, cînîş berhemhênanî protînî bedeste ke derfet xoş dekat bo dirustbûnî hevbendîy sînapsî.⁵⁷

Peywestî asûde, aramîy lê dezêt û karîgerîy ayetî heye Leser geşey mêtîk. Emîş xoragirîy mêtîk ziyad dekat beranber ew girjî û pestane hemecorey paşan bedem jiyane dêne rê. Belam kemasîy peroşxorî le berayî temenda, kospî sextî dirêjxayen peyda dekat bo helkirdin legel kesanî dîke.

Encamî tojînewey demarnasî pêşanî dedat ke bo nimûne kesanî tûşî pejarey sext û trawma⁵⁸ bèn û derfetî çarekirdinewey nebûbêt, paşan wek dayik û bab, bê ewey mebestyan bêt, be corêk reftar deken mindalekanyan lêyan bitirsîn. Eweş peyweste be çonetîy harîkarîy beşe ciyawazekanî mêtîkewe. Ger ew sê beşey mêtîk ke basyan hat bitwanin harîkarî biken ewa mêtîk le astêkî beriz û be corêkî têtbeste kar dekat. Belam mirov ger stirês û şeket bêt yan beserhatî sextî dîbêt û derfetî baskirdin û çarekirdinî bo nelwabêt, ewa mêtîk corêkî dîke kar dekat. Ewsa dûr nîye pêşarî⁵⁹ twêkilî mêtîk rêbest bêt û dabirêt le mêtîkî nawend û laskî mêtîkewe. Beweş mirov le astêkî nizimtirda deçerxêt, wate bîrkirdinewey rûn le lay sext debêt, pitir crpnane reftar dekat, pêy sext debêt bîr le helsûkewtî xoy bikatewe, hawsozîy lawaztir debêt.

Emeş barêke êmey mamosta xomanî têda debînînewe. Demew kotay rojêkî pirkar, hoş ledest dedeyn û bêzarane le telefonda welamî gazendekanî bawikî fêrxwaz dedeynewe. Dekewîne belgekarî û rûnkirdinewe keçî dezanîn ew kare çend pûçe betaybet beranber ew bawike. Belam paş rojêkî baş bertekiman deçête astêkî beriztir, hem aramî û hem twanay bîrkirdinewey xoman radegirîn. Ewsa cige le lêbîstin û pêşandanî derikandinî bertekî beranber, detwanîn gutekanî helsengênî û ger guncawbin çon çareyan bikeyn.

Şewazî peywestbûn le demî metirsîda taw dedirêt, lew basey sereweş dezanîn ke lewaneye kesêkî xawen peywestî nasûde le doxî stirêsda ziyadtir le kesanî dîke bertekî deçête astî nizimtirewe. Wata le barî wehada girjî û pestan asantir sîstemî zengî metirsî dehrûjênin, sîgnalekan nagene pêşarî twêkilî

⁵⁶ Radyoy fêrkarî: *Utbildningsradion* (UR), dezgeyekî mêdyayî swêdîye le kotay 1928 -ewe xerîkî pexîşanî bernamey zanyar û fêrkarîy hemerenge.

⁵⁷ Sînaps; Synapse, besterî demare, saxtarêke le koendamî demarda bo geyandinî sîgnal le nêwan dû xanedemarda.

⁵⁸ Trawma: trauma, şokî derûnî. Girêy derûnîy sarêj nekiraw.

⁵⁹ Pêşar: parçe, beş yan layenî pêşewe. Beranber “piştîr” bo parçe, beş yan layenî piştewe. Birwane Celîzade, “Zarawesazîy pêwane”.

mêşik ke erikî bîrdanewe û hêlsengandinî le estoye. Girjîyeke dirêje dekêşê û reftarî nacorî ziyatir lê dezê û rêbestinî sextitir debêt. Ewca rîgey çarekirdinî derhawîşte zêde nacorekeş, bo nimûne be daway lêbûrdin, ewîş sextitir debêt.

Peywest û fêrkarî

Zorbeman dezanîn mirov, le pênew xoşguzeranî û helkirdinî baş le civakda, pêwîstî heye be hevbendîy nêzîk û asûde. Derhawîşteş bo kesaneî netwanin hevbendîy nêzîk û dûrmewda legel kesaneî dîke damezirênin û ragirin, zor car debête “jiyanêkî nacor”, eweş dezanîn. Jine cewanêkî wêl taze karkinar kirabû, pêwî gut: “lemewdûwa çi grûpêk nîye min bigirête xoy”. Beşêkî zorî asûdeyî le guzeranda girêdirawî bûnî hestî hawbendîye. Êmey mirov bûnewerêkî grûpkarî û bo dabînkirdinî hestî asûdeyî pêwîstiman be kesaneî dîke heye. Leber eweye kesaneî beder le hevbendîy hestekîy nêzîk legel kesaneî dîkeda pitir berşkestin⁶⁰ hem be leş û hem be giyan.

Em diyardeye le fêrgeda be nîgeranî û sextîy hoşgîrî⁶¹ xuya debêt û encamekey bo civak begîştî debête erikî firewantir le buwarî saxlemî, tawankarî û karûbarî civakîda.

Hevbendîyekanî serbe peywestî asûde hênde bineretîn hem bo sazîrdinî hawbendî û hem bo twanay fêrbûnî babetî niwê, her debêt dabîn bikirên nek tenha le xêzanda belkû le fêrge û buwarî karîşda. Kewate mamosta û fêrxwazîş debêt katyan hebêt bo bexodaçûnewe, bo firajûtinî hestekî, bo giftûgo derbarey hokarekanî dinedan û xefekirdinî twanay fêrbûn û twanay sazîrdinî hevbendî legel kesaneî dîkeda.

Mamostam zor dîwe be qûlî lem base geyîştûn û karî xoyan lew çêweyeda hemwar kirdûwe. Fêrxwazîşim zor dîwe ke ne kat ne cêwrêyan hebûwe bo giftûgo derbarey ezimûn û beserhatî xoyan le guzeranî fêrgeda. Belam le seranserî welatda projey behadar û afirênerane piyade dekirên (komet⁶² tenha yekêke lewane) û min pêw waye ême zorî ke dexwazîn mêdya serinc bixate ser karî weha baş, wek parsengêk bo ew hemû progiramey bas tenha le sextangî⁶³ fêrkarîy deken.

Diyardeyekî seyre serleberî buwarî fêrkarî peyrewî lew zanyar û ezimûne nekat ke heye derbarey pêwîstîy mirov bo besterî nêzîkî hestekî letek kesaneî dîkey girîngda. Le hendêk bestênda kareke pêçewaneye û debête mayey kosp û rêbestin le hevbendîy serbe peywestî asûde. Emeş sê nimûneye lew base û dawam lêt eweye bîr bikewe û bizane hawrayt yan boçûnî dîket heye.

- Serxobûn le bestênî fêrkarîda be amancêkî xwaziraw dezanrêt. Fêrxwaz debêt fêr bêt le pirsî corawcorda helwêstî serbexo wer bigirêt, rexnegirane bîr bikatewe, berpirsayetîy xoy hebêt û... htd. Herçî wabesteyîye zor car yan be neriskan yan be basêkî serbe xêzan dadenrêt.

Belam ger baş bîrî lê bikeynewe, mamosta û fêrxwaz tewaw wabestey yekdîn. Fêrxwaz karîgerîy heye leser şêwazî fêrkarîy mamosta, şêwazî bîrkirdinewe, norî û hestî beranber xoy û kesaneî dîke. Fêrxwaz heye to be dîdarî ew şadiman debêt, heye pêt xoşe lêt dûr bêt. Mamostaş bo fêrxwaz heman base.

⁶⁰ Berşkest: nasikî, amadey şikest û zamdarbûn.

⁶¹ Hoşgîrî: focus, concentration, sêregîrî.

⁶² KOMET: bernameyekî fêrkarîye, mamosta û dayikûbab ko dekatewe bo şarezabûn le destawêjî bekelk bo çareserkirdinî nakokî û kemkirdinewey hera le fêrge û le nêw xêzanda.

⁶³ Sextang: , tengije, buhran, qeyran, *crisis*.

Wabesteyî aşkiratir debêt katêk mirov hogirîy beriz denirxênêt, kêberkêy pê xoş nabêt, bo salî dahatûş daway heman pol û heman mamosta dekat, mirov tasey kesêk dekat piştîwanî bêt, kesêk berpirsayetiş letek beş bikat.

Bedegmen nebêt em babete letek koşanda bo serxobûn wek diyardeyekî behadar nayete berbas. Legel eweşda dezanîn çend girînge bo nimûne berêweber le fêrgeda ne tenha debêt bîrî rûn û twanay biryarî hebêt bigire twanaşî hebêt giwê bo fêrxwaz û karmendan radêrêt û gutarî civîn û konferensyan behend bigirêt. Ewsa detwanî twanay biryar û kar le rêberaytîy xoyda biniwênêt belam çî pêwîst nakat wabesteyî xoy be karmendanî fêrgewe bişarêtewe. Wabesteyî le rastîda serxobûnêkî resene û serxobûn debête goşegirîy ger girêdirawî wabesteyî nebêt. Le cînekanimanda biryarî hem wabestebûn û hem serxobûniman dirawe. Debêt geşe be herdû layen bidirêt û baştirîn zemîneş bo ew kare hevbendîyekanî serbe peywestî asûdeye.

- Kêberkê girîngtîre le harîkarî. Emeyan le rastîda bote şaçemik le fêrgew Swêdda. Giştî kêberkê legel yekdî dekat, fêrgekan le nêw xoyanda, fêrxwaz le nêw xoyanda û mamosta le nêwxoyanda. Birawe xelat dekirêt. Zanyar le piley yekemda bote amirazêkî kêberkê nek "amirazêk bo jîyan". Raste cexit Leser harîkarî dekirêt belam tenha le çend bestênêkda û zor car tenha eger miroveke sûdî berhestî lê bibînêt. Leber eweye bo nimûne peywendîy hawçerxî torbendî kurtimewdan. Aye ême ta çî radeyek bîr dekeynewe lewey kêberkê kadêrî doraw berhem dênêt û bedem katewe pûkanewey layenî hestekîy lê dezêt? Mirov degate barêk çîdî seyrî xoy nakat, bîr lewe nakatewe twanay çende, çî dewêt û boçî dest dedat. Tenha seyrî kesanî dîke dekat û xeyalî lay eweye kê le kê baştire. Katêkî zorman bo ewe terxan kirdûwe kesanî dîke çon seyrî ême deken. Ewaney zor gîrodey kêberkên, biçûktirîn wirdekarîy kesî "berengar" şî dekenewe, belam her berêwe xo wêl deken.

Le çapterî çiwaremî em kitêbeda, Olle Österberg -î mamosta layene nayetîyekanî kêberkê bo karûbarî nêw pol rûn dekatewe. Nimûneş pêşkeş dekat derbarey corêkî fêrkarîy ke derfet nedate kêberkêy nêwxoy fêrxwazan.

Fêrgew Swêd este amancfermane⁶⁴ zûtir rêsaferman⁶⁵ bû. Belam Sverker Lindblad -î tojerî fêrkarî delêt le rêy çendîn corî berwardkarîy mîllî û nêwdewletîyewe, serincgorî peyda bûwe, lebirî kar be arastey amanc ketûynete berwardî fêrge, şarewanî û dewletan û bew core pilebendî berhem dênîn. "*Karûbarî fêrge serinc le çend dozêk degirêt û dozekanî dîke -î kemtir xo bedest berawirdewe deden - serincbeder demênin*".⁶⁶

Zor le cewanan, mercî serkewtin le kêberkêda beranber kesanî dîke le kar û guzeranî kesekîda, be bargiranî debînin. Debête mayey girjî û rûkeşkarî. Wize le birî azadbûn û bizozî, xefe dekirêt û xaw debêtewe. Erê, raste kêberkê xoşe, betaybet ger bo geme û be wîstî azad bêt. Ewe min lêreda berengarî debimewe birîtîye lew bîrokeyey kêberkê ke le fêrgeda heye û debête mayey stirês le birî firajûtin û şadimanî.

⁶⁴ Amancferman: be arastey amancêkî diyarîkiraw kar dekat.

⁶⁵ Rêsaferman: rêsa biryarî cor û nawerokî kar dekat.

⁶⁶ Lindblad, S. *Läraryrke under omstrukturering*. Forskning i fokus, nr 29. Myndigheten för skolutveckling 2006.

- Twanay hestekî, hawsozî û xonasî le gutûbêjî⁶⁷ buwarî fêrkarîda be basêkî temawî dadenrên ewîş degerêtewe bo ew xeyale çewte şêlgîrey hest û jîrî leyek cuda dekatewe. Erê, car heye babetî peywend be hest, hawsozî û xonasînewe dêne berbas, belam nêzîkey gişt ew carane barudoxî sextangî, bo nimûne katêk diyardey *çepandin*⁶⁸ serhelledat, nek wek beşêk le karûbarî rojane. Wek eweye waney îngilîzî tenha ew katane bigutirêtewe ke mêwanêkî îngilîz bête seredan, yan wane civaknasî tenha salanî helbijardin [î siyasî] bigutirêtewe.

Feramoşkirdinî ew agadarîyey hestekaniman berdewam pêmanî deden rêk wek feramoşkirdinî bîrkirdinewey lojîkane, sinûrdarman dekat. Lêreşda herdû la girîngin nek em yan ew.

Civak sûd le fêrgeyek debînêt têyda derfetî hevberdîy peywestbûn hebêt. Wata pêwîste ême çawdêrî ew babetane bîn ke zemîne xoş deken yan debine kosp bo firajûtinî hevberdîy lew core.

Peywest û tundûtîjî

Başe ke mirov xerîkî koşane bo hawsemayekî ayetî legel kesanî dîkeda bo carûbar weha rûxêner û dirindane reftar dekat kesanî beranber bîdizênin û terey biken? Yek le pênasekanî tundûtîjî, kizîy peywestbûne.

Zarokî newzad ew tabilo spîye nîye be ezimûnî rojgar pir bikirêtewe, wek John Locke (1643-1704) -î feylesûfî roşinakî⁶⁹ pêy wabû. Reftarî peywestbûn, ke bo parastine le barî metirsîda, her le seretawe le naxmanda heye. Xalêkî dîkey zigmak koşane bo sazîrdinî hevberdîy sûdbexşî pêwîst bo xonorînî geş û girîng bo twanay têhelkêşîrdin û çarekirdinî ezimûnî hestekî.

Hêzêkî zigmakî dîkeş birîtîye le twanay rêkxistinî beserhatekaniman le nexşî wehada guzeranî pê behadar bêt. Ewca ême her le zanewe be şêwe, be mezac û behredarî le yektir cudayin. Zarok heye pitir rûxoşe, heye be leş yan be derûn behêze, xoragire, xwazoke û... htd. Hawkat jîngey dewrûberîş bedem rewî jiyanewe karîgerîy gewrey heye leser norîniman bo xo û bo dewrûber. Kewate bas lewe nîye kamyân: zigmak yan jînge, bigire le herdûkiyane: hem zigmak û hem jînge. Le derawî⁷⁰ mîratî cînewe û be yarretîy ezimûn û beserhatekanî berayî temen, mindal dîdî xoy beranber xoy û dunya daderêjêt.

Ger ew zaroke biçûke kesêkî nêzîkî hebêt welamî sîgnalekanî bidatewe û pêwîstîy nêzîkayetîy fîzîkî û derûnîyekanî dabîn bikat, ewa mindaleke wîrdewirde fêr debêt ke dunya weha deçerxêt. Pêwîstîyekanî dabîn dekirên. Peywesteke asûde debêt, lêreşda mindal fêr debêt cilewî hestî xoy bigirêt bo ewey ne helrijêt (bo nimûne tûreyî fermanbeder) ne xefe bikirêt (tûreyî nagate astî agayî).

⁶⁷ Gutûbêj: dîbeyt, dêbat, *debate*.

⁶⁸ Çepandin: serkirdineser, kelegayetî, *bullying*. Birwane kitêbî "*Berengarîy çepandin*", nûsîn: Erling Ronald & Grete Sørensen Vaaland, tercemey le norwêjîyewe: M. Mudîrî.
http://komak.nu/kurdi/kteebkhane/kteebikomak_pdf/berengariy_chepandn_20110822.pdf

⁶⁹ Roşinakî: rênîsans, roşengerî, *Renaissance*.

⁷⁰ Deraw: serşar, xal û hêlî destpêk.

Guzeran begîştî berderike,⁷¹ xoşrewt û behadare.⁷² ewsa mirov baştir çarey mercekanî guzeran dekat û baştir bergey pejarey jiyaniş degirêt, ke her dêne rê. Mindal birêkî baş yarmetî werdegirêt bo çarekirdinî dilşkan, şikest û doran û mitmaneyek le naxî xoyda deçênêt bo derwesthatinî bargiranî. Ezimûnî geş debête mayey umêd be bûnî komek ger pêwîst bêt.

Belam ger kesêkî nêzîk nebêt bedem hawarî mindalekewe biçêt yan welameke direng direng bêtewe, ewsa emîş tê degat ke jiyane wehaye. Kesanî dewrûber cêy mitmane nîn. Çend sextîş bêt, mirov debêt xoy karûbarî xoy raperênêt, ewca metirsî heye tundûtîjî bibête take rêge bo cilewgirtinî hestî tund ta baştir xoragirtin. Hest beşêkin le jiyaniş ême û bê ewan natwanîn bijîn. Tojînewey hawçerxî hestnasî delêt mirov be polêk hest - yan wek tojeran delên: şahest (hestî binema) *Affect* -ewe dezêt. Şadimanî (ke binemaye bo xoşewîstî) rikukîne (ke binemaye bo dizandin) dû danen lew şahestane û debêt bedem jiyane teraz bikirên bo ewey mirov bitwanêt wabeste û nêzîkî kesaniş xoşewîstî xoy bêt, belam herweha amade bêt bilêt na û xoy dûr rabirêt le diyarde û kesanêkî baş nebin boy. Ezimûn pêşaniş dawe ke rêgirtin le peywestbûn lewaneye bibête mayey tundûtîjî.

“Adem bomî degêrête ke be mindalî zorbe kat hestî be tenhayî kirdûwe. Bîrî dêt çon bo şîv le dewrî mêzeke bêdeng dadenîşt û giwêy le giftûgoy gewrekan degirt. Bîrî dêt çendî dekoşa bo ewey basêk bidozête lêy bidûwêt. Belam hîçî nededoziyewe pêy wa bêt bekelk bêt. Leber ewe be bêdenîş dadenîşt û hestî dekirîd wek bilêy penhan debêt, tenanet le xoyişî penhan debêt. Dête we yadî katêk dayikûbabî bo bazariş deçûn bo şar çon emyan debird, yan deba le otomobilekeda be tenya danîşêt û çawerwan bêt yan pelkêş dekira le nêwan dûkanekanda wek sakêkî nacor.

Lê mîrî: edî carêk nebû mîrîyart lê biken çî û çonit dewêt? Le welamda gutî: kes mîrîyart le sakêkî nakat çî û çonî dewêt”.

Ême giştiman wabestey hawdenîşêkî hestekî le kesaniş nêzîkimanewe. Nasname bew core şêwerêj dekirêt, wate ême xoman çon pênasê dekeyn. Ew kesey hest bikat dewrûber be kolebarî dezanin, xoy lê debête kolebar. Ew mindaley nexşî peywestî xoladeraneye, xoy rahênawe be xefekirdin hestî tirs û tûrebûn. Çunke derfetî kem pê dirawe yan her nedirawe, hestî lew core derbibirêt.

Belam hestî behêz “debêt derfetî derbirînî hebêt”. Ger derfetî derbirînî guncawyan nebêt, bo nimûne le rêy wişe, muzîk û çalakî fîzîkîyewe, ewa tundûtîjî çawerêye bo derbirîn. Adem -î le nimûnekey sereweda basî hat, ezimûnêkî dirêjxayenî heye le xefekirdinî hestî nayetî, nexşî peywestbûnî xoladerane bû. Adem destî be hemû hestekanî xoyda ranedegeyîşt, boye guzeran le lay xolemêşî û bêtam bû, neşî dezanî bo carûbar weha xirap tûre debêt. Hawkarekanî lêy detirsan û xoyişî dû car be tundûtîjî siza dirabû.

Leweş bitirazêt tundûtîjî heye rûy le miroveke xoyetî. Katêk mirov agayane leşî xoy be nexorî (anorêksya anorexia), pîrxorî (bulîmya bulimia nervosa) û xo zamdarkirdin azar dedat lewaneye seyr bête berçaw belam mebestekî girînge, ewîş xefekirdinî hestî yekcar besoye. Le ferhengî swêdîda weha bawe kişan pena bo em derbirîne biben û kuran tundûtîjîyeke arastey derewe, kesaniş dîke, biken.

Lewaneye janî leş serinc Leser hestî yekcar besoy wek peşewî û tirs la bidat û emêş lêkdaneweyek bêt bo “reftarî xoazardan”.⁷³ Êmey mirov bûnewerî grûpkarî û bo aramîy xoman pêwîstiman be kesaniş

⁷¹ Berderik: dekirêt derikî bikeyt, *comprehensible*.

⁷² Aaron Antonovsky. *Unraveling the Mystery of Health: How People Manage Stress and Stay Well*. San Francisco, Jossey-Bass, 1987. *Hälsans mysterium*, Stockholm, Natur och kultur, 1991.

⁷³ Xoazardan: self-harm.

dîke heye, ger ew kese arambexşe bûnê nebêt ewa mirov hewil dedat her xoy çarey dîke bidozêtewe û firay xoy bikewêt.

Peywestî asûde dekatewe mitmane be xo û be kesanî dîke. Herweha mitmane be dezge û sazimangeli civakî. Kes neydewêra biçêt paşekewtî xoy be bank bispêrêt ger mitmaney be sîstem û karmendanî bank nebûwaye. Ne dayik û ne bab neyan dewêra mindal le zaroxane û nexoxane cê bihêlin ger dilnya neban lewey pêşwazîy dirust û çawdêrî û komekî pêwîst dabîne.

Pelamardanî têrorî em deyan saley raburd pêşaniman dedat çon mitmane be guzeranî rahate û bawerpêkiraw debezêt. Her lenakaw seferî otubus (pas) û firoke bo kar bêt yan geştyarî, debête projeyekî metirsîdar çunke sernişin dezanin dûr nîye dewrûberyan bombiçên kirabêt. Civak naçar bûwe deramedêkî zor bo parêzgarîy hemecor terxan bikat û çendîn welat dahatêkî zorî geştyarîyan ledest çûwe.

Ême dezanîn ger mitmane tewaw rma çî rû dedat. Nimûney here pergîr lew baseda cenge, ke têtêda ew reftarey katî aştî le nêw mirovda napesend bûwe, debête hem pesend û hem mayey dakokî. Lewaneyê derhawîştey here bed le ceng û betaybet le eşkencedan birîtî bêt lewey ziyane degeyênêt be mitmaney bineretîy mirov be xoy û be kesanî dîkey nêw civak.

Eşkence wate azardanî bergebederî⁷⁴ leş û derûn. Xo bînînewe le tenhayî û ew penambûne⁷⁵ rehayey parastin lew bedkarîye hênde serlebere, dûr nîye bo maweyekî dirêjxayen bibête mayey rmanî tewawî mitmane be kesanî dîke. Raste mirovî xawen ezimûnî serbe peywestî asûde begîştî baştir xoy radegîrêt le kesî dîke, belam gîşt kesêk pêwîstî be komeke bo çarekirdinî yadewerî lew babete. Ewca leber ewey zor car ceng û nakokî debine hoy penabirdin bo welatanî dîke ke têtêda peybirdin be nehameyîy mirovî penaber kurtî dehênêt, leber ewey zor kesîş xoyan tenanet le bîstinî beserhatekanî penaberan la deden, derfetî mirov bo bûjanewe û derbazbûn lew nehameyîyaney beserîda hatûn, sextitir debêt.

Zor fêrxwaz hen le fêrgey Swêdda cengdîden û xawen nasiyarî eşkencexor û kujrawin. Karmendanî fêrge pêwîstyan be zaniste derbarey derhawîştey ezimûnî weha bo ewey baştir pey berin be lawazîy mitmaney fêrxwaz û dayikûbab be mamosta û kesanî dîkey gewresal le fêrgeda.

Peywest û rêberayetî

Bo êmey mamosta, katêk bîr le norey xoman dekeynewe wek rêber bo zarok û cewanî xawen ezimûnî hemecorî peywestbûn, zanist derbarey bîrdozey hawçerxî peywestbûn detwanêt bibête amirazêkî behadar.

Bo rîşedoziy ew hawbendîyey heye le nêwan peywest û rêberayetîda tojîneweyek leser fêrxwazî polî pêncem kira. Sereta dawa le mindalekan kira wêney xêzanî xoyan bikêşin bo ewey tojer lew nîgaranewe corî hevbandîy mindal le xêzanekey xoyda derik bikat. Ewca mindalekan le rûy “asûdeyî bineretî”, xonazîn û birewyan le nêw mindalanda, têtê kiran. Le sîwsê mindal, hevdeyan be xawen peywestî asûde daniran, dûwazdeyan xawen peywestî nasûde bûn û helsegandinî çiwaryan narûn bû. Paşan mindalekan dabeş kiran beser grûpî biçûkda û dawayan lê kira biryar biden birêkî diyarîkirawî pare çon bête xerckirdin. Le her grûpêkda mindalî xawen peywestî asûde û nasûde têkel kirabûn. Dawaşyan lê kira her grûpêk rêberêk helbijêrêt berpîrsayetîy kareke bigîrête esto. Ew

⁷⁴ Bergebeder: bergey negîrêt.

⁷⁵ Penam: xiyab.

rêberane deba le kotada hem raportêk derbarey encamî grûpkarîy xoyan pêşkeş biken û hem serperîştîy piyadekirdinî biryarekeş biken.

Mebest le tojîneweke diyarîkirdinî corî peywestbûnî rêberkan bû. Encam pêşanî da ke şeş le hevde mindale asûdekan û tenha yek le nasûdekan be rêber helbijêrdiran. (Ew çîwar mindaley helsangandinyan narûn bû wela niran).

Le tojînewey dîkeda dawa le zarokî polî yekem kira nawî ew hawpolaney xoyan binûsin ke eman amaden dawetyan biken bo salrojî xoyan. Heşt mindal şepirêwane hatine helbijardin û serinc diraye “asûdeyî bineretî” -yan. Pênc lem mindalane be xawen peywestî asûde daniran û sêyan be nasûde. Welamî poleke pêşanî da ke mindale asûdekan le nêwan çîwar ta heft dawetnameyan hêna belam nasûdekan hîç.

(Utbildningsradio, Barndomens mysterier, del 3: Trygghetens betydelse. 2006.)

Tojeran le rûnkirdinewey encamî tojînewekanda delên mindalî asûde be şêwazêkî cuda le şêwazî mindalî nasûde helsûkewt legel dewrûber deken. Mindalî asûde wehay dadenêt kesanî dîkeş her wek dayikûbabin (yan kesanî dîke serperîşt), wate nerim, yarmetîder û xoşireftarin. Em mindalane geşnorin beranber hem xo û hem kesanî dîke. Pêwîstan bêt daway harîkarî le hevalanyan deken. Emane ger rûberûy kêşeyek bikirênewe wehay dadenên kêşeke çareserî heye û xoşyan twanayan heye ew çaresere bidozinewe. Ew helwêste debête mayey serincî mindalekanî dîke boye wehay bebaş dezanin mindalî asûde be rêber helbijêrin.

Herçî mindalî nasûdeye ewa fêr bûwe kesanî dîke mayey mitmane nîn û leber ewe debêt mirov pişt tenha be xoy bibestêt. Kewate mindalî weha ne daway yarmetî le mamosta û hevalanî xoy dekat û ne komekî hevalanîşî dekat. Zarokî weha ger rûberûy kêşeyek bikirênewe, leber ewey birwayan be xotwanî dozînewey çareser kize, xêra wire ber deden. Emane layan sexte pêşbînî le bertekî beranber biken û leber ewe hawsemayan legel hevalanda belawe sexte, carîş heye pena debene ber tûreyî zêdero.

Werin temaşay geştêkî fêrxwazan bikeyn mamosta têyda rêberyan.

Nimûne

Rojêkî geşî seretay mangî junîye û fêrxwazanî temen şeş sal le geştêkî melewanîdan. Xatû “durîs”-î mamosta û dayikî yek le fêrxwazan letekiyandan. Geştekeyan zor serkewtû bû belam katêk xoyan ko dekenewe bo geranewe “êlîyas”-î fêrxwaz diyar nîye. Tirs le hemwan denîşêt û nîgeran debin lewey neka aw birdibêtî. Durîs û dayikeke hest deken peşokan wîrdewirde hêriş dehênêt. Herdûkiyan deçine awekewe bo pişknîn û dawa le mindalekan deken dewrûberî nêzîk bigerên. Paş de xulek dayikeke telefon bo jimarey 112î firyadiresî dekat û hanayan bo dênêt. Êlîyas paş pazde xulek le daristanekewe ser der dekat û bêçûwe melêkî le çingdaye.

Ew barudoxey peyda debêt hereşe û hejendî bedemeweye û debête hoy tawdanî nexşekanî peywestbûnî hemwan. Debêt nexşe corawcorekanî peywestbûn çî encamêkiyan hebêt bo durîs û rêberaytîyekey katêk tê degat elîyas bizir bûwe?

Eger durîs serbe nexşî peywestbûnî rara bêt dûr nîye tirs û rikukîney xoy bibine serçawey bertek. Xoy heldedate nêw aweke û xêra dêtewe derê. Hewil dedat be hawarkirdin beser fêrxwazanda weha

biken û yan neken, fêrxwazan aram bikatewe. Zor le xoy dekat bo ewey karêkî sîstematîk encam bidat belam karekey ajawle ziyad dekat. Satêk le dayikeke deparêtewe û satêkî dîke fermanî dedatê. Bîrkirdinewey rûn û planrêjî lê dijwar debêt, nayetewe bîrî çî fêrbûwe derbarey helsûkewt legel pêşhatda. Le nêwan umêd û naumêdîda gîr dexwat. Heta çendîn hefteş paş ew pêşhate xewî dezirê û berdewam bîr lewe dekatewe ke dûr nebû rû bidat.

Nexşî peywestbûnî bexowegilan, durîs dexate ser barêkî dîke. Tewaw xamoş debêt û xerîke bilêm pekkewte. Lewaneyê biçête awekewe belam be nabadil û bê ewey bizanêt lewêda çî bikat. Le dayikeke be perêze û bertekî mindalekan derik nakat. Her zû çî umêdêkî namênêt bewey carêkî dîke elîyas bibînêtewe. Çendîn mang paş ew pêşhate serêşey sext û sistbûnî leş daydegirin.

Ger durîs xawen şêwazêkî asûdey peywestbûn bêt, twanay baştir debêt bo berbestkirdinî tirs hem lay xoy û hem lay fêrxwazan. Twanay bîrkirdinewey xoy deparêzêt û zanînî xoy derbarey doxî xnkân bo dayikeke rûn dekatewe. Twanay debêt mindalekan aram bikatewe û dayikeke han bidat telefon bo jimarey 112 -î firyadiresî bikat. Dezanêt ger çûwe nêw aweke çî bikat başe bo geran bedûway elîyasda. Peşokan xoy bo emîş melas dawe, belam umêd be encamî geş gewretire le naumêdî. Em detwanêt be wişe û be nîgay çaw peywendî legel dayikeke rabigirêt. Katêkî beserhateke kota debêt peywendî legel layenêkî pîşewerda degirêt bo beserkirdinewey pêşhateke. Durîs boy derdekewêt ke nîşanekanî stirês paş çend dîdarêk xaw debinewe.

Mamosta le karî xoyda zûzû tûşî pêşhatî weha nabêt tirsî mergî pêwe bêt, belam helbijardinî em nimûneye bo eweye be rûnî pêşanî bideyn nexşî ciyawazî peywestbûn be kirdewe çîn. Bertek û ciyawazîyekan taradeyek hawcorin le her doxêkî nêw polda ke mamosta be dijwarî bizanêt.

Pêm waye xwêner hem nimûney geşteke le karûbarî xoyda denasêtewe hem encamî tojînewekan derbarey rêberayetî û nexşî peywestbûn. Zorbeman ezimûnî heye bo nimûne legel berêweberî wehada ke asûdeyî lê dedirewişêtewe û bo karmendan debête çira. Kesanî dîkeşiman dîwe stirês û peşokan be dewrûberî xoyanda bilaw dekenewe. Nîşaneyekî rêberayetîy baş birîtiye le “asûdeyî bineretî” le kesayetîy rêberda. Eweş dekatewe mitmane be xotwan û hunerî kesanî dîke bo zalbûn beser kosp û helûmercêkî le karûbarda dêne rê.

Serencam⁷⁶

Raste nexşekanî peywestbûn taradeyek cêgîrin, belam wek zûtir bas kira, negornîn. Ger weha ban çî dî lêreda pêwîstiman be baskirdinyan nedema. Her eweş nîye bilêyn: “çî” rûy dawe le mindalîda karîgerî heye leser jiyânî gewresalî, belkû le pena eweşda mirovî gewresal “çon” derwanête ew beserhate, ew mebestey mirov le mêjûy xoy peyday dekat. Kewate nexşêkî nasûde dekirêt bigorêt be asûde le rêy ew peybirdiney mirovî gewresal wedestî dehênêt derbarey mêjûy jiyânî xoy. Her emeşe hokar bo ewey min ew babete le kitêbêkda ke derbarey hevbendîy nêw fêrgewe dexeme berbas.

Kesanî xawen nexşî nasûdey peywestbûn katêk debine mamosta, bo raperînî karûbar wabestey fêrxwaz û mamostay asûde debin. Car heye mamostay xawen ezimûnî sûdbexş debête kesî peywestdar bo ew fêrxwazey pêwîstî be serxistinî mitmaneye be xo û be kesanî dîke û herweha pêwîstî be komeke bo gorînî şêwazî helwêstî xoy le şikest û bo helkirdin legel dost û hevalanda.

Leber ewey hevbendîy mamosta - fêrxwaz zor car çendîn sal dexayênêt, zor fêrxwazî nasûde derfetêkî degmenyan dest dekewêt bo helçînî ezimûnî niwê legel mamostay asûdeda. Fêrxwazî

⁷⁶ Serencam: concluding reflection.

weha detwanêt bo nimûne têbigat lewey kesêk heye boy peroşe, be dîdarî şad debêt, kesêk tûre debêt belam bê rûşkênî, kesêk katî pêwîst yarîder û piştîwane, kesêk pey debat tenanet bew peyve kemey dêne derbirîn. Fêrxwaz fêr debêt ke boy heye bigirî û berhelstî bikat bê ewey le kobendîyeke derkinar bikirêt, be gişt kemasîyekaniyewe lay hevalanî xoşewîst debêt.

Eme rûkarêke le pîşey mamosta ke ême kemtir lêy dedûwêyn. Rûkarêkî dîke eweye peywestî asûde fêrbûn hasan dekat û peywestî nasûde kosp dexate rêy peydakirdinî zanistî niwê.

Be dîdî min bîrdanewe le çonetîy karîgerî ezimûn û beserhatî jiyaniman Leser xoman, beşêke le karî pêwîst bo serxistinî astî xonasîn. Le fêrgey nêw ferhengî berpîrsayetîda xonasîn beşêkî girînge le twanay pîşey mamostayetî. Em wişaney Tomas Tranströmer (1931-2015) -î honer (şa`îr) maweyeke bûnete serşarî ramanekanî xom:

Wek çon dirext salebaziney xoy heye, minîş le henawî xomda rûxsare zûtirekanî xom bar dekem. Ewane koy parçekanî "min"-n. Awêne tenha em dûwa rûxsarem debînêt, min hest be gişt zûtirekanim dekem.

(Kitêbî "Minnena ser mig" - "Yadewerîyekan min debînin" - (2006) lapere 40).

Zanist derbarey reftarî peywestbûnî mirov detwanêt bibête mayey geşesendinî raman le hevbendîyman letek fêrxwaz, dayikûbab û hawkaraniman. Mirov madam detwanêt pey berêt bewey rû dedat katî dîdarî kesanî dîke, deştwanêt bîr le şêwazî reftarekey xoyîşî bikatewe û beweş behadartir debêt.

Le kotada demewêt bîhênimewe bîrtan ke tojînewe zor car giştandin dekate binema. Tenanet le buwarî peywestbûnîşda. Leber ewe birêk wirayî başe hebêt katêk encamgîrî dekeyn lewey çî core karîgerîyek lem core mindalîye dekewêtewe û ezimûn û beserhatî ew mindalîyey çî tawêkî hebûwe Leser salanî dîkey temen. Mirov naşêt be dilnyayîyewe bilêt mindalîyekî dijwar, naçarekî debête mayey jiyaneî sext le gewresalîda. Helbet katêk bas dête ser takekes layenî dîkey karîger zorin.

Çapterî sêhem: Riskanî sozekî

Mebest le riskanî sozekî çîye?

“herrî” harry mamostay riştey xanesazî (bîna) ye le amadeyî. Herrî carûbar firavîn letek fêrxwazanda dexwat bo ewey baştir aşinayan bê û herweha pêşî xoşe giwêradêrî basekanyan bê. Rojêk debînêt çon “sîmon” simon -î fêrxwazî xoy bê hiç hokarêkî diyar Leser xwanî fêrge herayek legel fêrxwazêkî dîke berpa dekat. Ewca be dengî beriz dekewête bole derbarey xwardineke. Paşan katêk aşkira debêt ke qawey nêw termozeke gerim nîye, termozeke beriz dekatewe û hawar dekat: “qawey sardîş bixoynewe!”.

Ber lewey termozeke le zewî rakêşêt, herrî dest dexate ser şanî û pêy delêt: “were, to û min, deçîn qawey taze saz dekeyn”.

Sîmon termozekey dagirt û be dû herrîda çûwe aşpezxane.

Werin wirtir le rewî hestekîy em doxe wird bibînewe. Sereta sîmon le rêy zimanî ceste û be dengîşewe pêşanî dedat ke tûreye. Dewrûberîş pey nabat be hoy tûrebûneke. Raste xwardinî naxoş û qawey sardewebû debête mayey herasanîy belam hêzî bertekî sîmon le ast rûdawekeda nebû. Cige leweş sîmon dekewête hera legel fêrxwazêkî dîkeda bê ewey hokarêkî diyarî hebêt. Îdî heste û şalaw dênêt û ger herrî firya nekewtba bew corey hate pêş dûr nebû tûreyî sîmon derhawîştey xirapî lê kewtbyewe, hem bo xoy û hem bo kesani dîke. Dûr nebû be dawêşandinî termozeke kesêk zamdar ba.

Ew bertekey sîmon çon lêk bideynewe? Ême nazanîn paşxanî ew tûrebûne çîye. Hokarî hemecor zorin bo ew diyardeye. Bo nimûney kêşe legel dostekeyda, encamêkî xirapî hênabêt le twanadozîy⁷⁷ matematîkda, nîgeranî le nexoşêkî nêw xêzan û ...htd. Belam lewe dilnyayn ke hokarêk “heye” bo em heste û mercîş nîye sîmon bo xoy bizanêt hokareke çîye. Lewaneye netwanêt girêdanêkî guncawî “rûdaw – hest” (hokar - encam) derik bikat. Lewaneyîşe ciyawazîy bo nimûne nîgeranî û tûreyî, xembarî û tûreyî, nakamî û tûreyî, şermezarî û tûreyî... Be rûnî nezanêt. Narûnî le hestda lewaneye tûşî tirsî bikat û bo xefekirdinî ew tirse tûretir debêt. Lewaneyîşe şermezar bê lewey natwanêt cilewî hestî xoy bigirêt û leber ewey tûreyî barêkî asantire şermezarîyeke xefe dekirêt û tundûtîjîyeke pitir ser dekat.

Reftarî sîmon kemasîy pêşan dedat le riskanî sozekîy ewda. Hêştta negeyîştote ew astey cilewî hestekanî xoy weha bigirêt hem bo xoy bekar bin û hem bo dewrûber berçare⁷⁸ û berderik bin.

Bêyne lay herrî: fêrxwazekan û basûxwasyan behend degirêt. Katî ew firavîne herrî agay le reftarî yekbeyekî fêrxwazane û debînêt çon sîmon dekewête wirûjan. Lewewe têdegat ke sîmon mezacî tewaw nîye û ber lewey bigate reftarêkî tundûtîj em firya dekewêt.

Gişt êmey le fêrgeda kar dekeyn em doxe denasînewe, deşzanîn berpirsayetîy rêbestin le ziyadbûnî hera çend sexte, helbijardinî helwêstêk têyda sîmon şermezar nekirêt belam pêşanî dewrûber bidirêt katî herşe û tundûtîjî çî bikirêt başe.

⁷⁷ Twanadozî: taqîkirdinewe, îmtîhan.

⁷⁸ Berçare: çare dekirêt manageable.

Ew şêwazey herrî helîbijard bo çareserkirdinî doxeke pêşanî dedat ke ew detwanêt cilewî hestî xoy bigirêt. Dûr nîye be têkdanî aramîy firavîneke tûre bûbêt û leweş tirsabêt sîmon bedkarîyek bikat, belam cilewî hestî xoy degirêt, be corêk reftar dekat hem hêminane û hem dabir. Dêt û dest dexate ser şanî sîmon, emeş zor car karîgerîy arambexşî heye. Alûy adirînal⁷⁹ be nêzîkbûnewey leşekî hem berhemhênanî kortîsol ke horimonî stirêse kem dekatewe û hem berhemhênanî oksîtosîn⁸⁰ ke horimonî aramîye ziyad dekat. Herrî pêşnyaz dekat ke wêkira qawey niwê saz biken. Bew core zemîne bo berdewambûnî hawbendîyeke xoş dekat - ke le wişekanî “ême”, “to û min” da cexitî leser dekirêt - nek bo lêktirazan. Herrî nakewête nirxandinî reftarekey sîmon belkû arastey reftareke degorêt ewîş be pêşnyazî çûn bo karêkî dîke.

Reftarekey herrî pêşanî dedat ke em le rûy sozekîyewe mirovêkî riskawe. Mebestîşim le riskanî sozekî:

- Twanay diyarîkirdinî hestî hem xo û hem beranber
- Nasînî hokarî hestekanî xo
- Twanay derbirînî hestî xo
- Bergegirtinî hestî dijwar (nek xefekirdinyan yan sirkirdinyan be bo nimûne narkotîka)
- Cilewgirtinî hest be corêk ne helçin (bo nimûne katî tûrebûn) ne xefe bikirên le agayî mirovda
- Serincdanî ew agadarîyaney le hestda hen
- Rexasandinî derfetî bîrdanewe, bo ewey hest, bîroke, zanyar û ezimûnî zûtir wêkira bibine binaxe bo dirustkirdinî reftar.

Ewe twanistî sozekîye lay herrî weha dekat lew doxeda reftarî ewende dirust bêt. Em reftareye debête hoy berdewambûn û bigire geşekirdinî hevbendîy baş le nêwan herrî û sîmon paş beserhatî aşxaneke.

Peywestî asûde yarmetîman dedat katî pestan û bargiranî, jîrîy xoman biparêzîn. Wate beşe ciyawazekanî mêşik detwanin letek yekda be corêkî têkbeste û teraz, harîkarî yekdî bin. Lewaneye herrî ezimûnî dîkey zorî hebêt derbarey zalbûn beser doxî tirsinakda. Birway be xotwan heye bo çareserkirdinî kêşeke û pêşî wehaye kesanî dîkeş hen harîkarîy biken ger pêwîst bêt.

Belam ger herrî nexşêkî nasûdey peywestbûnî heba (ezimûnî penambûnî twana katî metirsî), yan rêk lem doxeda ew şeket yan nîgeranî şitêk ba, ewsa lewane bû tewjimî xwên le pêşarî mêşikda (ke beşêk le erikekanî bîrdanewe û helsengandine) bîdaye kizîy. Beweş pitir crpnane û kemtir hawsozane reftarî dekird.

Şêwazî pêşwazîy mamosta le reftar û gutarî napesendî civakî le fêrxwazewe karîgerîy gewrey heye leser corayetîy karûbarî fêrge. Bîr bikewe ger herrî beranber tûreyîyekey sîmon berzepê hestaye û be dengêkî beriz hawarî kirdiba: “sîmon! Eme reftarî nêw aşxane nîye. Termozke danê û biro êre çol bike!”. Emyan debûwe amajeyekî rûn bo napesendîy reftarekey sîmon. Dey ewsa çî debû? Herrî lewane bû be helriştinî tûreyî xoy û bew rêgirtine dabiranekey le reftarî sîmon, dabîn ba. Lewaneş bû hestî be core asûdeyîyek kirdiba be daşkanî sengî sîmon le rêy ew deselatniwandiney wedernan pêşanî dedat. Ewca sîmonîş lewane bû bertekî wireşkawane, bêdeselatane û şermezarane pêşan bidat. Bo çarekirdinî ew hestaneş lewane bû bikewête rikukîne hem le herrî û hem le fêrge wek dezgeyek ke deselatî ewey heye le aşxane derî bikat.

⁷⁹ Alûy Adirînal: Alig yan Rijêney Adirînal: Adrenal Glands (Suprarenal Glands).

⁸⁰ Oksîtosîn: Oxytocin.

Mebestî min eweye derikirdinî sîmon be hîç corêk nedebûwe handerêk bo reftarî baştir le ayendeda. Girîman baştir bû, ewsa metirsîyekî gewre serî heldeda ke birîtiye lewey sîmon fêr debû hestî xoy xefe bikat, nek diyarîyan bikat, bergayan bigirêt û şêwazêk bidozêtewe bo cilewgirtinyan be corêkî pesend bin hem lay xoy û hem lay dewrûber. Emey herrî deykate yarretîdanî sîmone çarey tûreyî xoy bikat bê ewey kes birîndar bêt, eweş twanay herrî - ye le cilewgirtinî hestî xoy ke debête mayey ew helsûkewte. Ew derge bo berdewambûnî hevberdîyeke dekatewe, nek bo lêktirazan. Em helwêstey herrî şîmaney zore bibête hoy damirkanî hestî şermezariy lay sîmon. Êmey mirov bûnewerêkî grûpkarî û be wêlkirdin û kenarxistin tewaw deşkêyn, şermezar debîn.

Edî şermezarkirdin karkirdêkî girîngî nîye wek sîgnalêk ke ew reftare le nêw grûpda napesende? Erê, diruste, belam şermezari tewaw xerîkiman dekat be çarekirdinî ew hestî şermezariyewe û gişt rêgeyekî dîkey rageyandinman lê debestêt, leber ewe debêt ême le bestênî fêrkari da wirya bîn. Dekira bo nimûne herrî tûrebûnî xoy bewe pêşan bidat ke deng beriz bikatewe û bilêt: "sîmon! Ew termoze dabinê! Lebirî ewe rûnî bike bizanim bo tûreyt! Ewe min debînim şitêk heye!" Gutey weha cexit leser hestî sîmon dekat û hawkatîş amaje be napesendîy reftarekêşî dekat. Emîş derwaze bo diyalog dekatewe nek bo tirazan.

Huner lewedaye dû rêge leyek cuda bikeyewe: yekem, şermezarkirdinêk yarretîy fêrxwaz bidat xoy letek grûpda biguncênêt (bî ewey xoy bizir bikat), dûhem: şermezarkirdinêk tenha bo ewey mamosta hest bikat cilewî barudoxeke degirêtewe dest.

To delêyt çî? To bayt le aşxaneke helwêstit beranber sîmon çî debû?

Ger hest nebêt, jîrîş nabêt

Kem nûser heye wek Fyodor Dostoyevsky (1821-1881) gişt şebengekanî derûnî mirovyan rûn kirdibêtewe. Eme ragiwesteyeke le "Notes from underground" - "Yadaştêk le jêrzemînewe" (1864) xwêner têyda legel ew tewjime hestekîyeda pelkêş dekirêt ke bewlay derûniyewe beradeyekî berzîş leşekîye:

Le mal yekem xerîkbûnî min xwêndinewe bû. Demwîst be yarretîy berdaştî derekîy hestewe gişt ewey bêwiçan hereşey helçûnî dekird le naxmda, kir bikem. Le berdaştî derekîy hestîş tenha xwêndinewem bo mabowe. Helbet xwêndinewe sûdî zor bû - deyrûjandim, diney dedam⁸¹ û azarî dedam. Belam demnadem zor xirap bêzarî dekirdim. Axir wêray gişt nehametîyek, carûbar demwîst biçime der û bicûlêw, ew deme her lenakaw xom gîrodey hewesbazîyekî tarîkî, gumanawî û dizêw dekird - hewesbazîş na, bigire tenha abirûçûnêkî pûç. Şeydayîye sakarekanim be hoy ew zûtûreyîye berdewame ziyadhestyare derdedarey xomewe, tadar û tund debûn.

Helçûnî hîsterîk, be firimêsk û girijbûnî masûlkewe, deygirtim. Le pena xwêndineweda min çî deretanêkî dîkem nebû, wate hîç şitêk nebû le dewrûberim be lay minewe cêy rêz bêt, serincim rabikêşêt. Gişt henawim le taw xem û tase hatibûwe coş.

(kitêbî "Anteckningar från källarhållet" - "Yadaştêk le jêrzemînewe", 1986, lapere 55)

⁸¹ Dinedan: stimulation.

Eme corêke le hestî mirov. Giştiman, her nebêt carêk, hestî wehaman hebûwe. Leber ewe çîrokî piyawî çalekey jêzemîn peywestî êmeye. Ew tewjimî hestey le beyaniyewe heta şew bedûmaneweyê be endazey zanistiman derbarey babet, bîrkirdinewey lojîkî û planrêjîy rêbazbend⁸² karîgerî heye leser berhemî pîşewerîman. Kem buwarî kar heye hêndey fêrge hestî têda sîxnax bêt. Şadimanî, girjî û arezû hen, belam nîgeranî û gumanîş amaden. Le her rojêkî karda, her rojêk, tenanet baştirîn mamostaş lewaney hestî wek babay jêzemîneke bîgirêt - tûre, dinediraw, azardiraw, bêzar û tenha. Ewca çareserkirdinî ew hestaneş her beşêkin le twanay mamostayetî, beşêkin le hunerî pîşewerîman.

Peydozîy le jiyânî hestekîy mirovda heta em çend desaley raburdû kat û deramedî wehayan bo terxan nedekira, yek le hoyekanî ew diyardeyêş kizîye le rêbazekanî peydozîda. Keçî giştiman dezanîn hest çî noreyekî girîngî heye le jiyanda. Hest handerîn, sirûşbexşîn, debine hokarî helimet birdin û bezîn, pêkenîn û giryan, xoşewîstî û kîne.

Hest hem hêzyan heye hem araste. Bayex û bestên dedene guzeran û pêman delên û têman degeyênin ême bûnewerî zîndûyn. Yarmetîman deden beserhatî xoman û kesani dîkeş derik bikeyn bo ewey helsûkewtîman be corêk bêt sûdî tenha bo xoman nebêt belkû bo ew grûpeş bêt ême beşêkîn lêy û bo ew bestêneş bêt laman girînge.

Bîrkirdinewe be bê hest bûnî nîye. Fêrbûn proseyeke hem bîrkarane hem hestkarane. Katêk lenakaw basêkîman bo rûn debêtewe û delêyn: “aha!” Hestêkî azadbûn le naxmanda peyda debêt. Ewe rûdawêkî hestekaraneye pitir lewey bîrkarane bêt. Zanyar û fêrbûn be piley yekem bo dozînewey rastî nîye belkû bo peybirdine be ezimûnekanî xoman.

Le bestênî tojîneweda çemikî “bîrdozey şahest” affect theory û “bîrdozey hestnasî” cognitive theory of emotion dêne arawe bo bas le tojînewey niwêy buwarî hestnasî. Çemikî şahest affect, hest feeling, soz emotion zor car wek hawwata bekar dehênrên meger le seretawe rûn bikirêtewe ke watay ciyawazayan heye. Dîsan tojerî ciyawaz em çemikane be şewey kemêk ciyawaz bekar dehênin, emaneş debine kosp bo xwênerêkî babetekey mebest bêt. Em buware meydanêkî zor berînî mawe bo peydozî û berdewam raportî niwê dêne berhem. Legel eweşda min pêman waye ew zanyarey emro berdeste detwanêt bibête dinederî mamostayan bo wirdbûnewe lewey dox heye le karûbarî fêrge da mirov pêy dabîn debêt û heyîşe debête bargiranî.

Profîsorî demarnasî le zankoy Iowa -y Amerîka: Antonio Damasio (1944-) tojîney heye derbarey çon jiyânî hestekîy mirov gorankarî beserda dêt paş ewey mêşik tûşî zebirî corawcor debêt. Tojînewekan zanistî taze deden derbarey makî hest û çonetîy karyan le astî demarnasîda. Tojînewekanî Damasio û hî tojeranî dîkeş pêşyanan dawê ke sozî mirov be hîç corêk zanistbeder nîye wek zûtir basî lê dekira. Be teknîkî hawçerx dekirêt, rêk wek twana û hestewerekanî dîkey bo nimûne: yad, bînîn, bîstin û... htd, peycorî lê bikirêt. Belam ewey le çawî tojînewe dûredeste, “hestandin”⁸³ -î sozekane. Emyan her ewendî lebare le layen kesî xawen hestekewe bas bikirêt belam xoy nadat bedest rêbazî zanistîyewe. Ême debînîn miroveke tûreye yan şade belam “hestandin”-î naxekîy ew kese lew rik û xoşîye derdest nîye. Axir merc nîye rêk ew hestandine bêt ke kesêkî dîke heyetî lew hestane.

Deysa “hest” çîye? Damasio le kitêbî *“Looking for Spinoza: joy, sorrow, and the feeling brain”* - *“Geran bedûy Spinoza - da: şadimanî, xem û mêşikî hestyar”* (2003) em pênasewe de kate pêşnyaz:

⁸² Rêbaz: method, rêbazbend: methodic, rêbazdozî: methodology.

⁸³ Hestandin: beranber att *“uppleva”* -y swêdî bekar hatûwe ke de katewe rengdanewey babetêk le hoş û hestda. Zûtir le tercemey dîkeda *“derhestandin”* bo *“tecrîd” abstraction* û *“berhestandin”* bo *“tecsîd” concretization* bekarhênirawin.

*Hest peybirdine be doxêkî taybetîy leş letek peybirdine be şêwazêkî taybetîy
bîrkirdinewe û herweha peybirdine be endêşey weha, babetî taybet bigirête xoy.*⁸⁴

Wate, be pêçewaney boçûnî baw, le pêşda bertekî leşekî dêt û hestandinî derûnî bedûyda. Ewe firimêsekanî bû babay nêw çalekey jêzemînî têgeyand ke hest be xem dekat, xemeke nebû firimêskî helrijand.

Ewe doxêkî leşekîye wehaman lê dekat hest be xoşî bikeyn û bîr le diyardey geş bikeynewe, katêk êmey mamosta paş waneyekî serkewtû, hestî hem xawbûnewe û hem dinedanîş demangirêt. Belam waneyek letek fêrxwazî xemsard, bertekî leş degorêt - masûlke gij debîn, pestanî xwên beriz debêtewe, henase pelepel dekat û rûkeşîy debêt. Gorankarîy leşekî debête hoy hestkirdin be westiyayî û nîgeranî û dûrkewtinewe le fêrxwazekan. Endêşe wêney têdaye şikest û nasûdeyî pêşan deden. Paş waneke, ger derfetî giftûgoman hebêt letek hawkarêkî jîr, debête yarîder bo terazbûnewey hem prose bîwkîmayîyekanî leş û hem tewjimekanî endêşe. Belam bertekî hawkarêkî najîr astî heste naxoşekan ser dexat.

Gorankarîyekanî nêw leş, le mêşikda wek nexşêkî demarekî neural, ba bilêyn core nexşeyekî leşekî, xoyan pêşan deden. Emane debine wêneyekî xeyalkird û ême pêyan delêyn "hest". Emane agadarîyman dedenê derbarey hem doxî xoman û hem şêwazî pesendî helsûkewtîman lem çirkesateda letek xoman û dewrûber. Kewate hest birîtîye le bertekî leşekî û derûnî beranber diney derekî û nawekî. Em hunere bo xizmetî zîndûmanî mirov geşey kirdûwe.

"Tirs" pêman delêt katî eweye yan bergirî le xoman bikeyn yan helêyn, dena lewaneye tûşî bela bîn. "Xulya" lêreda wate şitêk heye sûd yan xoşî bedemeweye. Debêt rîşedozi têda bikeyn. Hest besterî nêwan leş û derûnin. Ewane hestandinî ême radehêzin, debine binema bo biryardan û haniman deden bo kirdar.

Damasio rûnî dekate resîn çon geyîştûwe be mirovî hawçerx: firajûtin le karkird û bertekî sakar û otomatîkewe destî pêkirdûwe û geyîştote sîstemî pitir wirdekar û aloz. Nimûne le astî zûtirî em bare birîtîye le rêxistinî mêtabolîzim,⁸⁵ rêflêks⁸⁶ -î sakar û karkirdî hemecorî bergirîy leş. Lew asteda bîrkirdinewey aloz pêwîst nebûwe û mêşik hêştta "twêkile mêşik" (cerebral cortex) -î peyda nekirdûwe.

Le astêkî dûwatirda reftarî rêflêksasay xoladan û nêzîkbûnewe debestirênewe be dizandin û arezû, siza û xelatewe. Paş ewe firajûtinî remek û dineder dên, wek hestkirdin be bîrsêtî, arezûy sêks û peydoziy kunçkaw. Lêreda be rûnî derdekewêt ke bertekî leşekî dekewête pêş peybirdin be pêwîstîyekan. Eweta prose here girîngekanî jîyan, bo nimûne xorak wergirtin û newexistinewe, pêş ewey saxtarî taybet be hestandinî agamendane le mêşikda geşe bikat, her kara bûn.

Em astî firajûtiney êsta geşey hestî bedemeweye. Damasio "soz" (*emotion*) le "hest" (*feeling*) cuda dekatewe. (Lay Silvan Tomkins (1911-1991) ke bîrdozekey le ktîbekey xomda "*pedagogens inre rum*" - "*naxî fêrkar*" (2004) bas kirawe, watay çemikî soz û hest kemêk ciyawazin le hî Damasio). Damasio çemikî "soz - *emotion*" bo bertekî fîzîkî (leşekî) beranber rûdawêk terxan dekat û "hest - *feeling*" -îş bo *hestandinî derûnîye* le heman rûdaw. Damasio denûsêt: "*soz û herweha bertekî xizmanî wî dûy leş dekewin, hestîş dûy agayî*". (Lapere 13).

⁸⁴ *På spaning efter Spinoza: glädje, sorg och den kännande hjärnan, 2003, (s 88).*

⁸⁵ Mêtabolîzim: metabolism, prosew wergirtin, helweşandin û serfkirdinî xorak û dermane le leşî giyanewerda.

⁸⁶ Rêflêks: reflex, bertekî xonewîst.

Emotions-proper		Hest - soz
Drivers and motivations		Remek û dineder
Pain and pleasure behaviors		Reftarî serbe jan û arezû
Immune responses Basic reflexes Metabolic regulation		Bergirîy leş Rîfileksî bineretî Rêkxistinî mêtabolîzim
Damasio. <i>Looking for Spinoza: Joy, Sorrow, and the Feeling Brain</i> (2003)		

Damasio sê cor soz le yek cuda dekatewe: sozî paşxan, şasoz (sozî berayî) û sozî civakî.

- Sozî paşxan “*Background Emotions*”
Derencamî gişt prose rêkxer û çalakîye berdewamekane ke wêkira agadarman dekenewe lewey ême bûnewerî zîndûyn. Zorbey ew çalakîyane ême lêyan bêagayn (bo nimûne: berhemhênanî horimon, bergirîy leş, twandinewe xorak û... htd), belam ger hest ragirîn detwanî bilêyn asayî deçerxêt yan ta êsta çon bûwe êstaş her wehaye.
- Şasoz “*Primary Emotions*”
Birîtîn le şadimanî, sersurman, tirs, kîne, xem, dizandin. (tomkins sêy dîkeyan dexate ser: xulya, newîstin û şermezarî). Emane giştyan şewazî bertekî zigmakin û binaxeyan birîtîye le polêk doxî leşekî ke be corêkî taybet dêne hestandin. Her yek lemane şewazêkî demarekî taybet be xoy heye. Bo nimûne katêk mirov çawî be kesêkî xoşewîst dekwêt melbendî bînîn sîgnal denrêt bo saxtare cudakanî mêşik. Lewê agadarî rêk dexirên û nexşêkî taybetî lê peyda debêt ke derûn tercemey dekat bo şadimanî. Kewate leş û derûn wêkira dehonrênewe û cudakirdinewey derbirînî leş le derbirînî derûn karêkî sexte.
- Sozî civakî “*Social Emotions*”
Bo nimûne şermezarî, tawanbarî, xoxwastî, şanazî, bêrêzî, berzinirxandin, peroşî. Emanîş rêk wek sozekanî dîke leber ewey behadarin bo zîndûman, bedem resînewe geşeyan kirdûwe.

Tojeran sozî civakîyan lay bûnewerî xawen mêşikî zor biçûkîş dozîwetewe. Damasio bas le kirme biçûkekey C. Elegans (*Caenorhabditis Elegans*) dekat ke tenha 302 xaney demarî heye (mirov çendîn milyarî heye) û legel eweşda ger metirsîy kemîy xorak peyda bê legel kirmî dîkeda ko debinewe û be grûp dexion çunke bemeyan şansî zîndûman ziyatire. Kewate aste berayîyekanî reftarî pêşkewtûy civakî, bo nimûne geran bedûy asûdeyî nêw grûp, harîkarî, helwêstî xonewsîtane û dabeşênî kar, lêreda hen.

Mirov bûnewerêkî civakîye û sozî civakî pêwîstin bo harîkarî û helkirdin le cîhanêkî alozda. Gişt xêzan, civak û ferhengêk girêdirawî hest û reftarî wehan yarîder bin bo parastinî yekbûnî grûpeke. Ew hestane hokarî serbe resînyan heye, ba le civakî hawçerxda herdem guncawîş nebin. Le bernameyekî radyoda giwêbîstî Damasio xoy bûm basî le tirs dekird ke sozêke lem rojgareda kemptir cêy bayex pêdan. Mirov çîdî ew bêderetane nîye le ast hereşey dirinde û metirsîy dîke wek zûtir ke be destey biçûk koçerî deştuderan bû. Emro metirsîy dîke hen hereşeman lî deken, belam ew destkewte abûrî û siyasîyaney lem serdemeda le rêy ragirtinî tirs (u dirustkirdinî dezgey parastinî corawcor, bo nimûne çek û yasay nademokratî) peyda dekirên debine hoy têkelbûnî tirsî lebar legel tirsî nalebar.

Min pêm waye ême le bestênî fêrkarîda debêt serinc bideyne herdû hestî tirs û şermezarî û herweha karîgerîyan Leser fêrbûn zor ziyatir lewey emro deykeyn. Ême dezanîn bexoda raperimûnî lawaz, ke zor car rîşey degerêtewe bo tirsêkî zêdero le şermezarbûn, debête xefekarêkî behêz bo twanay wergirtinî zanistî niwê.

Kewate dekirêt, le rêy wirdbûnewe le xoman û le karîgerîy şewazî helsûkewtiman Leser fêrkarî û hevbendîyman legel fêrxwaz, geşe be twanay pîşeweraney xoman bideyn. “*Grûpî rêniwênî*” buwarêkî lebare bo em kare. Lewêda derfet heye mamosta bas le rûdawî rojaney weha bikat ke pêwîstiman heye be derikkirdinyan. Komek û ezimûnî kokirawey hawkaran yarmetîman deden barudoxî diwar her le katî karda çareser bikirên û pêwîst nekat bibine bargiranî û helgîrên bo şewinxûnî.

Zanist derbarey bîrdozey peywest û şarezayî le nexşî peywestbûnî xoman yekêke lew twanageley tawî geşî heye Leser pîşewerîman. Twanayekî dîkey girîng hunerî giwêradêrane bo ew agadarîyey hestekaniman berdewam pêşkeşî deken û behendgirtinî ew sîgnalaney katî helwêstgirtin.

Hunerî berengarbûnewey sozekî⁸⁷

Mirov, katêk hest be hereşey helçûn dekat, pêwîstî be corêk cilewngirtinî ew hestane debêt bo ewey çareyan bikat. Mamosta ger bo nimûne le layen hawkarêkewe birîndar bikirêt, yan bibîstêt ke wergîrawe lew karey maweyeke xewinî pêwe debînêt, merc nîye demudest hestî xoy pêşan bidat. Hawkareke lewaneyê le berdem fêrxwazanda ew mamostayey birîndar kirdibêt û ewîş wehay be baş zanîbêt çawerê bikat heta fêrxwazan deron û ewsa bertek biniwênêt. Peyamî wergirtinî kare dilpesendeke rêk pêş dîdarî dayikûbawan geyîşt û ew dîdare cêy şiyaw nîye bo pêşandanî şadimanî bew peyame. Ewca lewaneyê helçûnî şerengêzaney yek le dayikûbab dîdareke têk bidat û hestî helatin le dîdarke lay mamostake dirust bikat belam ew hesteş nabêt piyade bikirêt gerçî zorîş tund bê. Le barî weha mirov pêwîstî be hunerî berengarbûnewey sozekî heye, wate şewazêk bo zalbûn yan rêkxistinî ew hestane be corêk ne helçin û ne xefe bikirên.

⁸⁷ Hunerî berengarbûnewe: coping strategy.

Beşêk le twanay pêşeweraney mamosta birîtîye le çareserkirdinî hestî naxoş, rik, bêdeselatî û nezanî. Were le doxêk wirdbibînewe têyda toy mamosta têdekoşît bo handanî “Hanna” -î fêrxwaz. To erikêkit pê spardûwe û ewîş be rûnî raygeyandûwe ke benyaz nîye cêbecêy bikat. To gişt zanistî xot, hemû xeyalbazîy xot û serleberî twanay afirandinî xot gird dekeytewe bo ewey hanna xulya peyda bikat belam bêşûd.

Bergirîy hanna her ziyad dekat. Hestî rik û bêdeselatîy hereşey zalbûn deken beser toda û toş degerêyt bo hunerêkî berengarbûnewey guncaw bo ewey derwestî ew doxe dijware bêyt. Debêt em hunere çon bêt? Fermû eme çend pêşnyazêk û xalî hawbeşyan eweye to doxeke heldesengênît:

- To be xotî deselimênît ke bergirîy hanna peywestî to û erikeke nîye belkû peywestî basêke le to dûredest. Eweş yarmetît dedat mewda le kêşeke bigirît. Rizgart debêt le xo lomekirdin û baştir detwanît helsûkewt letek doxekeda bikeyt.
- Legel xotda biryar dedeyt ke bertekî hanna derfetêkî rahênane bo çareserkirdinî doxêkî dijwar derbarey peywendî letek fêrxwazda. Çareserîş bo nimûne eweye le hoşî xotda bilêyt: dilnyam hanna rojane çendîn car em hestey heye ke min êsta heme. Eweta berdewam şikest dehênêt le ast mercekanî fêrgeda. Xirap nîye mirov carûbar hestî fêrxwazan derik bikat beranber erikî fêrge.
- Bîr dekeytewe ke “grûpî rêniwênî” bem zûwane dîdaryan heye û toş lewê detwanît doxeke bas bikeyt û yarmetîy le grûpeke werbigirît bo bîrdanewe le baseke.

Bo ewey bitwanît yek lew huneraney berengarîy piyade bikeyt debêt hem bizanît boçûnî xot çîye û hem bitwanît bîr le şêwaze corawcorekanî çareserî doxeke bikeytewe. Wate lem doxeda to dezanît ke to hest be tûrebûn dekeyt, bêçareyt û mamostayekî xirapîşît. To biryar dedeyt tûrebûnî xot pêşanî hanna nedeyt çunke helsengandinî xot delêt doxeke baştir nakat. Kewate biryar dedeyt ke derwestî heste naxoşekan bêyt û be bîrî xotîda dehênît ke em doxe beşêke le karî mamostayetî û to gişt ew taybetmendîyanet hen ke pêwîstin bo em pêşeye.

Eger to twanistî sozekî û zanistîy pêwîstit hebêt bo em helwêste (ke le nexşî peywestbûnî asûdeda hasantir debêt) tewjimî xwên le “lobî pêşar” frontal lobe da ziyad dekat û pestanî xwên kiz debêtewe, emeş derfet xoş dekat bo bîrkirdinewey rûn, bo bekarhênanî helsengandinî xot û bo dozînewey rêgeyekî çareser ke nebête hoy xirapitirbûnî doxeke ne bo to û ne bo hanna. Lewaneye bes bêt bilêyt: *“têdegem lewey natewêt erikeke cêbecê bikeyt, belam min kemêkî dîke dêmewe û şadiman debim ger bibînim to destit pê kirdûwe”*. Wate to gutekey hanna depejrênît bê ewey lêy biselimênît, to be peymanî geranewet hevbendîyeke radegirît û agadarîşî dekeytewe le şêwazî bertekî xot eger ew dest bekar bûbêt.

Belam ger twanistî sozekî û zanistî kurtî bihênin (bo nimûne be hoy nexşî nasûdey peywestbûn), ewa dûr nîye hestî tûreyî, şermezarî, peşewî yan tenhayî zal bin beser toda. Nasnamey pêşewerît dekewête jêr pirsiyarewe û twanat nabêt agayane bîr le hestî xot bikeytewe, ke lewaneye bikatewe ewey to hestekanî xot xefe bikeyt û tûşî girjî û sirî bibît. Tewjimî xwên le “lobî pêşar” da xaw debêtewe û pestanî xwên ziyad dekat. Dûr nîye dawa le hanna bikeyt jûreke cê bihêlêt û bilêyt: “ger ewe nekeyt ke min dawat lê dekem ewa pêwîst nakat le polekeda bimênît!”. Bemeş pirdî (mirovaney) giftûgoy nêwantan derimêt û peywendîtan beyekewe namênêt. Beweş metirsîy zore derfetî fêrbûnî hanna lawaztir bêt.

Xefekirdinî hestî nalebar nabête hoy bizirbûnyan, belkû hem bargiranîy Leser leş ziyatir debêt hem heste nalebarekan dûrmewdatir debin. Belam ger agayane reftar legel ew hestane bikeyt û hawkat twanat hebêt doxeke be corêkî dîke bixeyte ber helsengandin, ewa aşkira bûwe ke bargiranîyekey

leser leş û derûn kiz debêtewe. Be boçûnî min pêwîste mawemawe katî kobûnewe hebêt letek hawkarani dîkeda bo bîrdanewe û axaftin derbarey doxî wek emey hanna, çunke hem zor wizekêşe û hem be hasanî ser denêt be xorexney⁸⁸ berhemkujewe. Legel hawkaranda peydakirdinî riwange bo rûdawekan hasantire, mirov baştir detwanêt pey berêt bewey tenanet le nêw ewey le yekem nîgada tenha rûxêner û naberderike, lewaneye wata û bestên hebêt.

Hunerî berengarbûnewey agabeder zor car be “*bergirîy derûnî*” nawzed dekirên. Mebest lemanîş her rêkxistinî heste, betaybet ew hestaney hereşey zalbûn deken û dijaware agayî pêyan bûwêrêt. Pêw waye xwêner şarezay ew koçerxî⁸⁹ bergirîye heye ke le nûsyarda⁹⁰ nawyan dêt, bo nimûne be *weberdan*,⁹¹ *nikûlî*,⁹² *hemûtwan*,⁹³ *xefekirdin*⁹⁴ û *hizirandin*.⁹⁵ Belam lêreda min demhewêt cexit bixeme ser dû hunerî bergirî - ke girêdirawî ezimûnî peywestbûnin: “*derhawîştinî xoparêzane*” û “*serincgorîn*”.

Gişt çirkeyekî şîyarîyman⁹⁶ şepolî agadarî dadebarên besermanda, hem le dewrûberewe û hem le naxî xomanewe. Ger twanay dabêjîn neba bo weladanî agadarîy kemtir girîng mirov neydetwanî bijêt. Ême berdewam naagayane ew beşe heldebijêrîn ke mayey serince, wate zorbey agadarî wêl dekirêt.

“*Derhawîştinî xoparêzane*” wate, zarok le peywendîda be kesî peywestdarewe, beşêkî ezimûn û zanist derdehawêjêt bo xoparastin le hestî zor behêzî nasûdeyî û tirs. Metirsîy geşekirdinî em core bergirîye ziyad dekat betaybet ger em dû diyardeye hawkat peyda bin:

- Le demî nasûdeyîda, mirovî peywestdar direng direng welamî pêwîstîyekanî mindaleke dedatewe le nêzîkayetî û parastin.
- Mindaleke ezimûnêk û zanistêkî derbarey dayikûbab peyda kirdûwe, boy nîye pêşanî bidat.

Fermûn emeş nimûne:

Îda (Ida) ke za dayikî 48 salan bû. Hatinî Îda bernamebeder bû, dayikeke wehay dezanî le skuza botewe. Em xêzane pêştir sê mindalî hebû, nyazî mindalî dîke le arada nebû. Demî peydabûnî Îda xêzaneke planyan dariştû bo geştêkî “*dewrezewî*”⁹⁷ belam naçar man geştekeyan leber dûgiyanîyeke helweşêninewe.

Le demî mindalîda Îda zorî debîst çî percû⁹⁸ yeke û çend xoşewîstî hemwane. Dayikûbab zoryan Îda xoşdewîst belam nakamîş bûn bewey dîsan azadîyan bertesk kirayewe. Em hesteyan rêy degirt le welamdanewey pêwîstîyekanî nêzîkayetî û asûdeyî Îda. Hawkatîş hestyan be tawan dekird lew hestî nakamîyeda û leber ewe hewilyan deda hem be xoyan û hem be Îday biselimênin ke Îda geştirîn rûdawî jiyanyane.

Bo xoparastin le nasûdeyî mezin dûr nîye twanay derhawîştinî xoparêzane lay Îda geşe bikat. Mebestîş weladanî ew ezimûne besoyeye ke birîtîye le kemîy peroşîy dayikûbab. Îda wek mindalêk

⁸⁸ Xorexne: rexne lexogirtin.

⁸⁹ Koçerx: mîkanîzim, machinery.

⁹⁰ Nûsyar: literature.

⁹¹ Weberdan: projection.

⁹² Nikûlî: denial.

⁹³ Hemûtwan: omnipotence.

⁹⁴ Xefekirdin: repression.

⁹⁵ Hizirandin: intellectualization.

⁹⁶ Şîyar: (hoşîyar) pêçewaney bêhoş û xewtû.

⁹⁷ Dewrezewî: be dewrî zewîda.

⁹⁸ Percû: mûcîze, *miracle*.

twanay nîye bîr lewe bikatewe dayikûbab pêy delên toman xoş gereke belam le katî dijarîşda be corêk reftar deken delêy em tenha mayey herasanîye. Îda bedem katewe xoy radehênêt be xoladan le “herasankirdinyan” û bew core hasantir detwanêt zanînî kemasîy ewan derhawêjêt û tenha basî ewey em “geştirîn rûdawî jînyane”, rabigirêt.

Kewate agadarî derbarey kemperoşî wela denrêt wek ewey kemptir girîng bêt. Lay ew mindale biçûke eme şêwazêkî lebare bo xoparastin le nasûdebûnêkî zor behêz, belam bedem katewe em derhawîştine naagayaney agadarî debête kêşe. Îda ger bo nimûne bibête mamosta, tenanet katî stirêstîş, pêwîstî heye bewey têbigat lewey mirov carûbar şitêk delêt belam karêkî tewaw cuda dekat.

Şêwazêkî dîke bo xoparastin le kemasîy nêw hevberdîy serbe peywestbûn birîtîye le “serincgorîn”.

Reftarî peywestbûn le demî metirsîda taw dedirêt û ger kesî peywestdar lew demeda berdest nebêt, lewaneye mindaleke (kesî gewreş) bo xoparastin le hestî nasûdeyî, serinc bigorêt rûwew layekî dîke.

Mamosta heye, bo nimûne, koşanêkî zor terxan dekat bo projeyekî katxayen bo xoladan le xemî çewtîy xwêndin le polekeyda. Zarok le zaroxaneda lewaneye be çirî wazî biken bo feramoşkirdinî xemî dûrîy dayikûbab. Le hendêk bestênda, katêk kesî peywestdar berdest nîye, em bergirîye zor başe, belam ger bibête nexşêkî cêgîr, ewa kêşeye. Pêwîstî waye mamostay xawen projey katxayen karekey xoy zor pîşewerantir cêbecê dekird ger daway yarmetîy bikirdaye derbarey xwêndinî nêw polekey xoy.

Ême giştiman xawen hunerî agayane û agabederî berengarbûneweyn. Min sûdêkî zorim bînîwe le axaftinî mamostayanî grûpî rêniwênî derbarey şêwazî corawcoryan bo derwesthatinî doxî bargiran le karda. Yek lew mamostayane gutî ew birway be yezdanêk heye û ew birwayey katî here dijarw dête hanay. Mamostayekî dîke basî kird çon le kotay rojî pirkarda, êwarekey be bilûzçinî debate ser û heta nexşekanî çinîneke aloztir ban em baştir deytwanî hoşî xoy le karî rojgarekey dûr bigirêt. Bew core detwanî pişûy pêwîst werbigirêt bo ewey karûbarî sbeyrojî pê helsûrêt.

Car heye min wek rêniwên lew dîdaraney grûpî rêniwênîda derikim be hunerî berengarbûnewey wehay xom kirdûwe ke zûtir lêyan bêaga bûm, eweş yarmetî dawim ew reftaraney xom bigorim ke lam baş nebûn berdewam bim leseryan. Her bo nimûne, le derfetêkda bom derkewt ke min wek rêber bo çareserkirdinî tirs û peşewî weha rahatibûm helwîstî salarane pêşan bîdem, çalakî û hoşiyarkirdinewey zêdero - taybetmendîyekin zorim la napesende ke lay kesanî dîkey deybînim.

Bo zanînî ziyatir derbarey bergirîy derûnî û axaftinî dîkey çust em kitêbe here başey Marianne Sonnby-Borgström bixwênewe ke min sûdim lê wergirtûwe bo nûsînewey em beşe: *Affekter, affektiv kommunikation och anknytningsmönster* (2005).

Twanistî sozekî le pişey mamostayetîda

Sven-Eric Liedman -î mêjûnasî endêşe, le kitêbî “*I skuggan av framtiden*” - “*Le sêberî ayendeda*” (1997) basî Samuel Pepys (1633-1703) dekat, ke nawdare bewey le sedey hevdehemda nexşî girîngî hebûwe le rêkxistinî hêzî zeryayî îngilîzda belam leweş ziyatir nawdare be bîrewerîyekanî xoy. Pepys paş çendîn sal xwêndin le zankoy Cambridge biryarî da mamostayekî taybet bigirêt fêrî matematîkî bikat. Le bîrewerîyekanîda ke hî salî 1662 n pepys bas lewe dekat çî rencêkî bedest “*xîştey carandin*”⁹⁹

⁹⁹ Xîştey carandin: Multiplication table.

-ewe kêşawe: “*kajêrî*¹⁰⁰ çiwari beyanî rabûm û kewtime ser xwêndinî xiştey carandin, ke sextitirîn base min tûş hatibim le jimêrkarîda” (Liedman, 1997, lapere 199).

Pepys -î bîstuno salan, ke wêray xwêndinî berfirewanî akadêmî, xiştey carandinî nedezanî, pêşaniman dedat zanistî here girîng û behadarîş be pêy kat dêne gorîn. Le serdemî ewda zorîne xelk bo fêrbûn rûyan le şiwênî dîke dekird nek le fêrge. Kem kes basewad¹⁰¹ bûn. Belam bêsewadîyan nakatewe ewey nezan bûn. Ewey pêwîst bû le zanistî, bo nimûne kiştukal, masîgirî, asingerî û tîmarkarî be şêwey dîke peyda dekiran, zor car be şagirdîy lay kesanî karzanî gewresal, be serincdan û fêrbûn, be hewilî kesekî ta hêdî hêdî ew hunere fêr debêt ke pêwîste bo helkirdin le civakda.

Êmey mirovî sedey bîstuyekem seyrman pê dêt kesêk xwêndinî akadêmî hebêt û xiştey carandin nezanêt. Liedman delêt “belam xiştey carandin rikaberêkî zalî lê peyda bûwe, ewîş jimêrke. Mirov nazanêt ew xizmetkare dilsoze çendî dîke kara demênêt”. (lapere 212).

Kewate kame zanîn û twana girîngin, basêke bedem katewe gorankarîy beserda dêt. Zanistî bineretî ke birîtîn le xwêndinewe, nûsîn û matematîk her le seretakanî pîşesazîyewe girîngîyan peyda kirdûwe. Le ferhengî giwêrayelîy Swêdda, heta nêzîkey dû newe ber le êsta, eweş bebaş dezanira fêrxwaz çend *nizaxwanîyekî*¹⁰² nêw nizanamekan ezber biken, twanayan hebêt jimêrkarîy “hizirza” (tenha be mêşik, bê pena birdin bo destawêjî wek kaxez û pênuş w kelûpelî dîke) cêbecê biken û herweha tomarî şahanî swêd bizanin, be naw û salewe.

Katêk min mamostayekî cewan bûm le amadeyî *Eksjö* pirsiyarim kird nawî dûwazde kurekey Yakub-î peyamber çîye, nîwey poleke destyan helbirî. Le ferhengî berpîrsayetîy emroda zanistî weha hîç girîngîyekî pê nadirêt. erikî fêrge emro her ewe nîye pakete zanistî amadekiraw le neweyekewe bo neweyekî dîke bigiwêzêtewe, belkû deşbêt destawêj bidate fêrxwaz xoy bigerêt bedûway ew zanisteda ke pêwîste bo helkirdinyan le civak û guzeranî karda.

Belam ewey min pêm waye tazeye û fêrgey emro le hî dûwênê cuda dekatewe birîtîye lewey fêrxwazî emro pêwîstî be yarmetîye bo helwêst wergirtin le jyanî kesekîy xoy. Le guzeranêkî pir le gorankarîy berdewamda, pir le mercî berdewam bo xoguncandin û derfetî jimarbederî helbijardinda, mirov pêwîstî be xonasîni bineretîy heye. Mirov debêt le rûdawekanî guzeranda wata û bestên bibînêt û bizanêt ke derfetî heye berpîrsayetî weesto bigirêt û karîgerîy hebêt.

Min dilnyam lewey mamostay ayende katêk debîstêt mirov heta sedey bîstuyekem ewca be ciddî awrî le twanistî sozekîy mamosta dawetewe, be radey sersurmanî emroy ême le têkoşanî pepys bo fêrbûnî xiştey carandin, sersam debêt.

Pêwîstîy fêrxwaz le fêrge da be komek bo geşedan be layenî sozekî û hevberdkarîy le kesayetîy xoyda daway mamostay karame dekat lew buwareda. Le bîrdozeda peybirdin heye be sengî kesayetîy mamosta. Emeş be rûnî le kotaraportî peycoyî “komîtey riştey mamostayetî”,¹⁰³ nawzed be: “fêrkarî û rêberayetî - rişteyekî mamostayetî rûwew harîkarî û firajûtin”¹⁰⁴ nûsirawe. Be hoy em peyame swêd salî 2001 niwêkarî kird le xwêndinî riştey mamostayetîda. Sê hokarîş bo gorankarîyeke rageyendira:

¹⁰⁰ Kajêr bo kat (beranber şêst xulek) hour danirawe bo cudakirdinewe le katjimêr bo amêrî kat pêşandan watch.

¹⁰¹ Basewad: kesêk xwêndinewe û nûsîn bizanêt.

¹⁰² Nizaxwan: *Hymn*, sirûdêkî diyarîkirawî dînî - lêreda dînî mesîhayetî mebeste.

¹⁰³ Komîtey riştey mamostayetî: *Lärarytbildningskommittén*.

¹⁰⁴ *Att lära och leda. En lärarytbildning för samverkan och utveckling* (SOU 1999:63).

- Nêwendpertî¹⁰⁵ fêrge û herweha amancfermanî¹⁰⁶ û encamfermanî.¹⁰⁷
- Ew rexneyey be piley yekem arastey riştey mamostayetîy em rojgare dekirêt ke neytwanîwe be radeyekî lebar zaroxane, fêrge û xwêndinî gewresalan le bestênêkî firewantirda cêgîr bikat.
- Riştey mamostayetî neytwanîwe derfet saz bikat bo fêrxwazanî rişteke, geşe biden be twanay pêwîst bo pîşey mamostayetî ta erikî civakî û peroşmendaney xoy beranber fêrxwaz cêbecê bikat.

(SOU 1999:63 lapere 9 û bedûwawe).

Lew kotaraporteda cexit dekirêt Leser xwêndinî dewamedar, binemay zanyaraney fêrkarî, zanistî babet û behay hawkoy binema.¹⁰⁸ Hawkat sengî xonasîn û firajûtinî kesekîy mamostaş pêşan dedirên:

Bîrdanewe zemîne xoş dekar bo têgeyiştin le saxtarî kerestey xwêndin. Le bîrkirdinewey fêrxwaz û le jîngey corawcorî fêrkarî û herweha bo nasînî berbestekanî geşekirdinî twanay fêrbûn û twanay civakîy fêrxwaz. Wêray eweş bîrdanewe, lay mamosta debête mayey firewanbûnî xonasîn û firajûtinî kesekî.

(SOU 1999:63 lapere 63 û bedûwawe)

Pêwîstî waye tojînewey niwê zor kesî beaga hênawe le pêdawîstîyekanî xoşkirdinî zemîne bo firajûtinî twanistî sozekîy mamosta belam çonetîy dabînkirdinyan le karûbarî fêrkarîda hêştâ narûne. Raste, proje zorin le fêrgekanda kar deken bo cexitkirdin rêk Leser firajûtinî sozekî, belam nêzîkey giştyan rûy le fêrxwaze. Firajûtinî twanay mamosta debête basêkî lawekî.

Serincrakêş eweye dariştinî nêw pêşnyazeke bas lew hevbendîyey nêwan reftarî peywestbûn û reftay peydozîy mirov dekar, ke le çapterî pêşûda basim lêwe kird. Bo nimûne cexit dekirêt Leser ewey zanyardozi¹⁰⁹ le mirovda hêzêkî bizwênî xoriske: “geşekirdin û xizmetkirdinî xulyay peydakirdinî zanyar, ke şamebeste lay mirov, erikî fêrgeye”. (heman serçawe, lapere 8)

Ewca sengî kesayetîy mamostaş, bo serkewtinî ew xulyaye, dête rûnkirdinewe:

... Leber ewe, norey mamosta heta dêt ziyatir girêdirawî twanay mamostakeye bo pêkhênanî dîdarî kesekî. Kesayetîy mamosta pitir biryarî erikî mamostayetî dedat nek ew noreyey pêy spêrdirawe. Her mamostayek debêt norey xoy bistênêt û şayanî ew noreye bêt - beweş salarîy xoy biniwênêt - nek noreyek yan rêbazêkî pê bispêrdirêt. Salarî basêke mirov le proseyekî dêmokratanneda peyday dekar. Beweş mamosta pêwîste bibête hawkarêk ke pêgey xoy le rêy helwêstî akaraney geşekirdû, lêbîstin û mitmanewe peyda bikat.

(heman serçawe, lapere 8).

¹⁰⁵ Nêwendgîrî: centralization. Nêwendpertî: decentralization.

¹⁰⁶ Amancfermanî: wate amanc arasterêj û fermandere.

¹⁰⁷ Encamfermanî: wate encam arasterêj û fermandere.

¹⁰⁸ Behay hawkoy binema: lêreda wek çemik beranber “värdegrund” -î swêdî û “value-system” yan “common principles” -î îngilîzî danirawe, mebest lêy koy ew behageleye le civakêkda be binema degîrên.

¹⁰⁹ Zanyardozi: geran bedûway zanyarda.

Le zor cêy “rênamey fêrge” da çemikî wek: lêbistin, xonasî, mitmane, twanay civakî û bîrdanewe dêne berçaw. Wişekan beranber twanistgelêkin ke herdem nîşaney fêrkarîy baş bûn. Belam le ferhengî giwêrayelîda mirov pêy weha nebû twanistî lew babete derfetî firajûtinî heye. To bilêy be pêwîst zanirabin? Ew deme hunerî pîşewerane birîtî bû le zanistî babet û şitêkîş rêbazî kar. Pêw waye lew zamaneda, mamostayek peroş ba û bîrî le reftarî xoy kirdibawe, lay fêrxwazan debûwe diyardeyekî geşî naasîy. Fêrxwaz meger bextewer ba tûşî mamostay weha debû serbarî zanistî babet, peroşî fêrxwazeke bêt wek kes. Ewsa (u ta radeyek êstaş) boçûnî giştî deygut mamosta yan pey be fêrxwaz debat yan nabat, heye zigmak fêrxwaze û heye na. Dîdî lew babete cêy sersurman nîye bo serdemanêk têyda mirov pêy weha nebû rêbazî zanistîy pesend bitwanêt peycorî le layenî sozekî bikat. Lewaneye her eweş hokar bêt bo zalbûnî twana û prosey hoşekî le xwêndinî riştey mamostayetî û herweha xwêndinî dewamedarda. Lew serdemaneda mamosta tenha pêgey pîşeke bes bû bo wedesthênanî mitmaney fêrxwaz. Le ferhengî berpirsayetîda mitmaney fêrxwaz be koşan wedest dêt, leber ewe twanay peybirdin be hestî xo û kesanî dîke û herweha cilewgirtinyan, debête hunerêkî girîng.

Êsta ême dezanîn ke twanistî sozekî tenanet le temenî gewresalîşda peyda dekirêt. Be yarmetîy teknîkî niwê, tojînewe le hestî mirov mewdayekî başî birîwe û gerçî carê zorî mawe belam tojînewey niwêy em rojgare detwanêt zor layenî helwêstiman, le xo û le beranber, rûn bikatewe. Em baseş girînge bo civakêk têyda cexit pitir Leser berpirsayetî bêt nek giwêrayelî, amanc bêt nek rêsa, helwêstî çalak bêt nek wedûkewtinî xamoş. Firajûtin naçarman dekat twanistî sozekîy mamosta, wek zanistî babet, bikeyne babetî xwêndin, rahênan, helsengandin, têkbestin û geşekirdin.

Mebest le, bo nimûne, “peroş” çîye? Kesî peroş çî ciyawaze le kesî xemsard? Mebest le “xonasî” û le “twanistî sozekî” çîye? Emane serbe çî core zanyarêkin? Çon wedest dehênrên?... htd. Min pêw waye gewretirîn berokgîrî bo mamostayanî sedey bîstuyekem rêk birîtîye le peycorîy kesayetîy xo û karîgerîy ew base Leser hawsemay mamosta letek fêrxwazda. Karêkî baş Leser dozgelî serbe “behay hawkoy binema”, bo nimûne, sext debêt bebê twanayekî lebarî sozekî.

Hawkat letek eweşda debêt bîselimênîn ke mirov hen kemasîyan hênde zore le buwarî hem riskanî sozekî û hem twanistî hevbandkarîda, kelkî mamostayetîyan pêwe nîye. Leber ewe debêt prosey cêgirtin le xwêndinî riştey mamostayetîda beser bikirêtewe. Çapterî heftem em xale ziyatir rûn dekatewe.

Lem çaptereda cexit kiraye ser layenî sozekî le twanay mamostayetîda. Le nêw basekeda amajem be sê amiraz kirdûwe ke pêw waye sûdbexşin bo serxistinî twana lew buwareda. Dûwanyan zaniste derbarey bîrdozey hawçerxî peywestbûn û zaniste derbarey peyamî tojînewey niwê le buwarî hestekîy mirovda. Xwênerî serincgîr derikîşî kirdûwe bewey min deçimewe ser sûdî “grûpî rêniwênî” bo têhelkêşkirdinî bîroke û kirdewe (bîrdoze û praktîk) le rêy bîrdanewe û axaftinewe. Çîrokî beşdarbûwan giyan debexşin be bîrdozekan û yarmetîman deden riwange bikeynewe be rûy ezimûnî karûbarî rojaneman letek fêrxwazda.

Belam karûbarî fêrge çend girêdirawî soze hêndeş girêdirawî hevbandîye, boye riwangey “hevbandkarî” debête basî çapterî dahatû.

Çapterî çiwarem: Twanistî hevbendkarî

Le ajawlewe pergal peyda debêt¹¹⁰

Arja Paulin le zanistname (têz, duktoraname) -y xoyda be serdêrî: “*Mawey yekem le pîşekeda - le fêrxwazewe bo mamosta*” (2007), Fêrgey balay mamostayan -î Stockholm¹¹¹ rîşedozi kirdûwe derbarey ew kospaney dêne rêy tazemamosta le seretay karyanda.

Kerestey tojîneweke birîtîye le raportî bîstupênc mamosta derbarey beserhatî yekem sê terimînî karyan wek taze mamosta. Emeş çend nimûneyeke le basekanyan:

Fêrxwazêk erikekanî xoy cêbecê nakat. Yekêkiyan bedilf xoy dêt û deçêt. Hîçî beser hîçewe nîye û çî berhemîşî nîye. Kurêkî dîke xemsarde, direng dêt. Kurêkiyan peşêwe û nîgagîr¹¹² nabêt. Zor fêrxwaz yarîderyan heye. Kiçêk le polda deydate giryan û kes nazanêt boçî. Fêrxwazêkî niwê lay sexte cêy xoy le grûpda bidozêtewe, xoy dekate sawa yan “kilawin” (galtecar, clown), pena debate ber reftarî bergirîkirdin. Yan, to bilêy şêt bêt? Yari legel ewaney dîke nakat. Başe, le çî detirsêt? Kiçêkî zor lawaz heye hîç nanûsêt, nasrewêt, berdewam dêt û deçêt, seyr diyare, “penk” (punk) -e, meylî xokuştinî heye.

Mindal zorin paşxanyan wêrane. Yekêkiyan xizmêkî heye xoy kuştûwe, hî dîke heye alûden. Bawikêk destî bo kiçî xoy birdûwe. Dayikêk be şêrpence mirdûwe.

(lapere 129 û bedûwawe).

Gerçî serleberî ew nimûnane zadey yek pol nebûn dîsan pêşanî deden pîşey mamostayetî çî mercêkî gewrey heye leser twanistî hevbendkarî. Tenha zalbûn beser zanistî babet û beser hunerî fêrkarîda bes nîn, mamosta debêt derwestî fêrxwazî xawen reftarî derikbeder bêt. Axir ew fêrxwazaneş xawen heman mafî fêrbûn û firajûtînin wek gişt ewaney dîke.

Helbet êsta degutirê le hemû serdemanêkda mamosta ew erikêy hebûwe. Ewe diruste belam perînewe le ferhengî giwêrayelîyewe bo ferhengî berpirsayetî mercî leser kesayetîy mamosta, tewaw ziyad kirdûwe. Zûtir le katî waneda, mamosta direwişawe bû. Mamosta şirovey dekird, wanebêj bû, peycorîşî dekird. Mamosta bû nimirey dadena û deba mameley hemwan wek yek baye.

Êsta xwêndin ziyatir kesekîye û fêrxwaz debêt berpirsayetîyekî firewantir bo xwêndinî xoy bigirête esto. Fêrxwazîş çawenore mamosta xoy le pişt perdey pîşekeyewe neşarêtewe, bigire bûwêrêt bête pêş, bûwêrêt wek kes xoy pêşan bidat. Fêrxwaz mamostayekî dewêt giftûgoy pê saz bêt û pergalî pê dabîn bêt, mamostayek bitwanêt tûre bêt bê tolesendinewe û rûşkênî.

Encamgîrîy Arja Paulin û berhemî tojînewekey ew pêşanî dawê ke gewretirîn kosp le rêy tazemamostada rêk hevbendîye - letek fêrxwaz, dayikûbab û hawkaran. Kêşekan lem çiwar xaleda gird debinewe:

¹¹⁰ Ajawle: peşêwî û bêserûberî, chaos.

¹¹¹ Arja Paulin, *Första tiden i yrket- från student till lärare* (2007). Lärarhögskolan, Stockholm.

¹¹² Nîgagîr: eye-contact.

- Peybirdin be fêrxwazî kêşedar û çarekirdinyan
- Dabînkirdin jîngeyekî aram le polda
- Helkirdin letek hawkaranda
- Derikkirdinî dayikûbab

Hokarî em kospane degerêtewe bo alozîy pîşeke, kêşey hemîşeyî kemîy kate, belam ber le giştyan kemasîye le twanistî hevbandkarîy mamostada. Çare çîye letek fêrxwazî xemsard yan xawen reftarî nacor? Çî dekeyt legel dayikûbabî xemsard yan cîredirêj? Çî dekeyt letek hawkarêkda pêt waye erikî xoy cêbecê nakat?

Zanistnameke bo çarekirdinî kêşeke, pêwîstîy gorankarîy repêş dexat le xwêndinî rişteke da û herweha le bernamey destpêkî karda:

Be piley yekem mebest le hunerekanî serbe twanay civakîye, letek ewanîşda zaniste derbarey dijwarîyekanî hen lay fêrxwaz û twanay çarekirdinyane beşêweyekî pîşewerane.

(lapere 180).

Katêk çîrokekanî nêw zanistnameke dexwênimewe çend basêk heye betaybet serincim radekêşin. Yekemyan ew bargiranîye dijwarey karî mamostaye. Lewe naçêt hîç derfetêkî wiçan û dabiranyan hebêt. Berdewam bîr dekenewe lewey çon firay gişt erikekanî xoyan bikewin. Cige le wanekan, planrêjî, civînî corawcor, telefonkirdinî bêkeleber letek dakubabda, nîgeranîy le peşewîy nêw pol û derbarey nimiredanan. Mamosta hoşî zor lay fêrxwazî kêşedare, tûşî bêxewî debin û kat hergîz beş nakat. Mamosta, tenanet ger rêniwên (mêntor) îşyan hebêt hest be tenhayî deken beranber gişt ew mercaney leseryane. Kospekan xerîke bilêm le çarebederin.

Babetî dûhemî serincrakêş xoragirîy mamostaye û hêdî hêdî baştirbûnî barudoxekeşe. Peşewîy nêw pol, bedem şarezabûn le fêrxwazan, kiz debêtewe, belam nek bo hemwan. Mamostayek lêy aşkîra debêt ger basî doxî poleke bo fêrxwazan bikat, aram debinewe. Mamostayekî dîke delêt polêkî astî şeşem zor aramtir bowe paş ewey letek sê mamostay dîkeda axaftinyan legel fêrxwaz û dayikûbabda damezirand bo çareserî kêşey nêw pol. Giştyan dilgermane hatine pêş û derencam keşî grûpkarîy le polekeda hate gorîn.

Babetî sêhemî bo min serincrakêş birîtiye lewey mamosta bedem katewe fêr debin hokare ciyawazekanî peşewîy nêw pol leyek cuda bikenewe. Boyan derdekewêt ke fêrxwaz mamostay taze têt dekat, fêrxwaz heye bêzare, heye nexoşe. Mamosta debînêt milmilanêy deselat heye le nêwan grûpî ciyawazî fêrxwazanda, emeş mercî gewre dexate ser twanay rêberayetîy mamosta. Ger mamosta hokarî ajawle û pergâl bidozine karekeyan sûdbexîştir debêt û paşan debête yarîder bo çarekirdinî kospekan.

Babetî çiwarem eweye ke axêwerekani zanistnameke, ew bîstupênc jiney kirabûne sê grûp, giftûgoy Arja Paulin - yan zor pê xoş bûwe. Zoryan pêwîst hebûwe be derfetêk bo baskirdinî barudoxî karî xoyan bo kesêkî peroşî basekeyan bêt û herweha sûdekî zorîşyan lew giftûgoye wergirtûwe. Grûpekan mawemawe dîdaryan hebûwe, her carey sê kajêr, axaftinîş hênd çirupir bûn keleberî nedawe ne bo wiçan û ne bo encamgîrî. Tenha beserçûnî kat rawêjiyanî ragirtûwe.

Çîrokekanî zanistnameke mawemawe dênewe ser kêşey fêrxwazî xemsard û ser kêşey karlêk legel fêrxwazda wek dû kospî here gewrey kar. Kerstin Palm û Ulrika Nimstrand le tojîneweyekî dîkeda

pêşanî deden ke lay fêrxwaz hevbendî letek mamosta gewretirîn sengî heye Leser xulyayan bo xwêndin. Emyan zanistnameye le zankoy Linköping be serdêrî: “handan - hevbendî. Hevbendîy fêrxwaz - mamosta çon pêş dexirêt?”.¹¹³ Lem zanistnameyeda giftûgo letek şeş fêrxwazî polekanî nawendî û şeş mamostada kirawe derbarey dîdyan bo hevbendîy mamosta - fêrxwaz. Le encamgîryekeda nûsirawe:

Encamî dîdarekan pêşanî dawê hevbendîy mamosta û fêrxwaz girîngtirîn handere bo fêrxwazan. Emeş be piley yekem fêrxwazî kemterxem degirêtewe, ger hevbendîy letek mamosta baş nebêt, xulyay bo xwêndineke namênêt û bêbak debêt.

Ewca min pirsiyarim le xwêner heye: to çon derwanîte fêrxwazî bêbak, hawkarî kêşedar û dayikûbabî cîredirêj? Key ew katet heye bo bîrdanewe le karûbarî rojane? Axêwerekani zanistnamekey Paulin giştyan jin bûn. Pêt waye ger tojîneweke Leser piyaw ba encamekey ciyawaz debû?

Ger min bîr le derfetî bîrdanewey pişeweraney xom dekemewe le mawey bîst salî mamostayetîm le amadeyîda, xerîke bilêm bûnyan nebûwe, meger gişt ew caraney nîgeran debûm le pêşhat û xom tawanbar dekir le kurthênan û şikestêkî dehatine rê. Bîrkirdinewey geldest le keşêkî aramda, le hiç yek lew çîwar fêrge amadeyîyey karim lêkirdin, bûnî nebû.

Pêwîstîy mamosta be derfetî şarezabûn le tojînewey niwêy serbe babetî waney xoy basêkî girînge û be boçûnî min rêk eweş girînge mamosta derfetî bîrdanewey geldestî hebêt derbarey hevbendî letek fêrxwaz, hawkar û dayikûbabda. Derfetîş tenha bo tazemamosta nebêt belkû bo gişt mamostayekî kara. Betaybetîş girînge mirov bîr lewe bikatewe helwêstî xoy çî karîgerîyekî heye Leser hevbendîy letek fêrxwaz û dayikûbabîyan.

Pirsiyarekanî serewe girîngin bo mamosta, çî taze bêt û çî azimûde. Hunerî sazkindinî hevbendîy baş be piley yekem le dîdarî kesanî dîkeda geşe dekat û le “grûpî bîrdanewe” da mirov tûşî şêwazî dîke dêt ke debine yan hander yan kosp bo firajûtin û fêrbûnî hem mamosta xoy û hem fêrxwazekanî. Lewêda mamosta debînêt ke kêşekanî xoy degmen nîn û lay kesanî dîkeş hen, lewaneye ewan mamostay ezimûndartirîş bin û bibine yarîder bo dozînewey çarey baştir bo sazkindinî hevbendî letek fêrxwaz û dayikûbabîyan ger şêwazekey xoy serkewtû nebû.

Olle Österberg -î mamostay fêrgey balay mamostayan, le raportî “Giftûgo derbarey jîyan le polêkda”¹¹⁴ bas le beserhatî xoy dekat ke mawey salêk karî letek polêkî astî pêncem kirdûwe le nawçeyekî kenar Stockholm. Olle deywîst bizanêt çî rû dedat ger bigerêtewe nêw pol û ew bîroke tazaney, salanêke wek mamosta le fêrgey balay mamostayan le Stockholm xerîkiyane, le polda bixate ger.

Olle bo ewey baştir sîstembend le beserhatekanî karûbar wirdbêtewe de dîdarî axaftinî letek Bertil Egardh -î tojerî ziman, derûnşîkar û fêrkar, saz kirdûwe. Dîdarekan tomar dekirên û paşan rêk wek xoyan le raportekeda wişenûs dekirên. Lêreda be rûnî aşkira debêt helwêstî mamosta beranber fêrxwaz - wate twanistî hevbendkarîy mamosta - çî karîgerîyekî heye Leser karûbarî pol.

Rûdawî yekem birîtî bû lewey mamostakanî dîke kewtine dildanewey olle çunke rêk ew poley berkewt. Boyan rûn kirdewe ke ew pole her le seretawe, le astî yekemewe, peşew bûwe, mamostay zor gorîwe û nakokî sextî heye le nêwan fêrxwazanda. Dayikûbab be gazenden û dawa deken

¹¹³ Kerstin Palm & Ulrika Nimstrand. *Motivation- relation. Hur kan förhållandet elev-lärare förbättras?* Linköpings universitet (2003).

¹¹⁴ Olle Österberg. *Samtal om livet i en klass* (1998).

mindalekanyan bigiwêzirênewe bo polî dîke. Olle ber lewey giwêbîstî em base bêt biryarî dabû be wîrdî bîr bikatewe le rewî yekem dîdar letek fêrxwazekanda.

Min demwîst be şitêk dest pêbikem yarîder bêt bo ewey her yek le fêrxwazan hest bikat dinyay ew mayey serince. Şitêk pêşanî bidat ke min salariy xom bekar dehênim bo afirandinî keşêkî kar û şêwazêkî harîkarîy weha ke bibête yarîder bo ewey wîrdewirde û le rêy mitmanewe fêrxwaz bitwanêt le hest û hoşî xoy nêzîk bêtewe.

(Olle Österberg. *Samtal om livet i en klass*, 1998 lapere 8)

Lêreda bîrokeyekî rûn heye pêşanî dedat mamosta biryarî dawê dîdarî fêrxwazanî çon bêt û herweha pêşanî dedat mamosta xoy biryarî rêşakanî helkirdin dedat. Zûtir sê kur le polekeda zal bûbûn bewey polekeyan kirdibûwe meydanî kêberkê û huner ewe bû mirov yekem bêt, baştir, beriztir û... htd bêt. Olle debînet em doxe çî karîgerîyekî xirapî heye Leser keşî grûpkarî û herweha fêrbûnî kesekî. Leber ewe erikî weha dedate fêrxwazan kêberkê helnegirêt. Erikêk bo nimûne birîtiye lewey fêrxwaz wêneyek le kitêbî civaknasî helbijêrêt û paşan bo polekey rûn bikatewe bo rêk ew wêneyey helbijardûwe. Erikêkî dîke eweye hemû hestewerekanyan bixene kar bo baskirdinî kalayek, hestêk, xulyayekî heyane.

Sereta ew sê kure dekewine sûkkirdinî erikekan û be “galtecarî” yan nawzed deken. Belam olle sûre Leser cêbecêkirdinyan, pêdagîrî dekat û zor car “handbirêk” yiş radekêşêt. Le raportekeda denûset:

Sextirîn kêşey cilewgîrî birîti bû le bergirîy ew sê kurey amade nebûn em beha û dunyanorîye biselimênin, ewan deyanwîst berhemkarî, xelat û derhawîştin kara bêt. Ger bom hebêt wêneke tîjtir bikem, delêm le dîdî minda ewan niwênerayetîy mirovnorîyekî faşîstaneyan dekird. Mirovnorîyek daway deselatî sitemkarane, dizandinî kemasî û dizandinî lawazîy bikat.

(lapere 27).

Hawkat legel ewey olle dabir û yeknewaze derbarey corî helsûkewtî fêrxwazan, giwêyiş dedate ciyawazîyan û twanay xoragirîyan, bo nimûne le danîştinî aramda. Car heye kelên dexate karî bédengîyewe û erikî grûpkarîy corawcoryan pê despêrêt ke paşan debêt giftûgoy Leser biken. Rahênanî serincgîrî, serincdane berdaştî hestewerekani xo û giftûgo derbarey xonorîn û beranbernorînî fêrxwaz beşêkî zorî karî yekem terimînyan dagîr kird.

Ewca kerestey zanisteke, be şêweyek xonasîn ziyad bikat, girê dedirêt be cîhanî fêrxwazewe. Lêreda waney dewletî romanî be nimûne dehênimewe. Olle dastanî romulus romulus û rîmus remus yan bo degêrêtewe û hawkat xeyalî lay grûpkarîy nêw polekeye. Olle bo rawêjkarekey xoy Bertil -î bas dekat çî hevbedîyek debînet le nêwan kure zalekanî nêw pol û rûdawî mêjû.

Hest dekem “berzenimûne” (ideal) -y romanî be corêk lem kuraneda zîndûwe. Xwastî deselat, xwastî zalbûn. Rê nedan be kesêk bête emdîw şûrewê, bo nêw perjîni xo. Tirsêk heye le naxî em kuraneda rêyan nadat be nîgarkêşî yan be her şêweyekî dîke “ez” -î xoyan derbibirin. Emane pitir le tomarer¹¹⁵ deçin. Kelûpel qeriz deken. Wanekanyan dexwêninewe û paşan deyanewêt ewey xwêndûyanetewe pêşkeşî biken. Em qerizkirdinî kelûpeleş her hawbeşe legel romanekan. Axir romanekan tenanet

¹¹⁵ Tomarker: rîkorder, amêrî tomarkirdin.

xudawendekanî xoşşiyar le girêk (yonanî) qeriz kird. Lem nawaxineda kogriftêk¹¹⁶ heye nêzîke, ne tenha lew sê kurewe, belkû le giştimanewe. Emeş rehendêkî dîke dedat bew nawaxine mêjûkirde. Ême êsta ke mêjûy roman dexwênînewe wird debînewe le şêwazî rastandinî berzenimûneyan. Ême detwanîn bedem şûn helgirtinewey¹¹⁷ firajûtinî ewan, le corî çerxandinî xoman wird bînewe.

(lapere 35).

Helwêstî asûde, yeknewaz û rêzdaraney olle keşî poleke degorêt. Wirdewirde meydanî kure bizêwekan bertesktir debêt, fêrxwaze bêdengekane dekewine go û şêwazî helsûkewtî nêwxoy fêrxwazan gorankarîy beserda dêt. Olle bem core basî lê dekat:

Debînim hevbendîy axaftin le nêwan fêrxwazanda ziyadî kirdûwe. Le aşxane dadenîşin û dedûwên. Le polda dadenîş û dedûwên. Wa hest dekem heta dêt ziyatir yektiryan xoş dewêt.

(lapere 30).

Zor fêrxwazî poleke xawen xesletî wehan bote rêbest le xoguncandinyan letek mercekanî fêrgeda. Hemû fêrxwazan derdyan çêştwe le dest peşewîy nêw poleke û le dest berteskîy derfetî xoderbirîn. Rêdan be zalbûnî kure lasarekan bûwe mayey xefekirdinî firajûtinî ew fêrxwazaney le xwêndinda bê kêşe bûn.

Ew şêwaze yeknewazey olle le girêdanî fêrkarî be kesayetîy firecorî fêrxwaz û rêbestin le kêberkêy nêwxo, keşî karûbarî gorî. Bem kareş ew fêrxwazaney le xwêndinda bêgrift bûn, derfetî firewantirî xwêndinyan bo rexa û geşeyan kird.

Taybetmendîy fêrkarîyekey Olle Österberg lewedaye xwêndineke be cîhanî fêrxwazewe girê dedat û yarmetîyan dedat wişe biken be poşakî endêşe û beserhatî xoyan. Axaftin şapêgey heye. Bo nimûne herayek rû dedat û em le fêrxwazan depirsêt, basî ew herayey bo rûn bikenewe. Fêrxwaz dekewine baskirdin nek nirxandin. Çî rûy da? Boçûntan çîye derbarey ewey rûy da? Pêtan waye lemewla guzeraniman çon bêt başe? Nirxandinî dirust û hele, çak û bed zor car debine kosp û rê le axaftineke debestin. Helbet nirxandin le helwêstî fêrxwazanda beranber yekdî bûnî heye. Katêk ew sê kure bizoze raydegeyênin ke benyazin yek le kiçekan nestşkên biken, olle zor tûre debêt û boyan rûn dekatewe ke reftarî wehayan lê pesend nakat. Sereta naçar debû deng beriz bikatewe û agadaryan bikatewe, belam bedem katewe deytwanî “handbirêk” xaw bikatewe û hawdemîyan legel fêrxwazanda xoştir debû.

Mebest le twanistî hevbendkarî çîye?

Raportî “giftûgo derbarey jiyar le polêkda” nimûneyekî rûn pêşan dedat le mamostayek ke twanay heye hevbendîy geş le polda saz bikat. Kem mamosta heye bigate ew aste, belam nimûneke mayey sirûşe hem bo bîrdanewe û hem bo lêwefêrbûn.

¹¹⁶ Şûn helgirtinewe: helgirtinewey cêpêy kesêk yan diyardeyek.

¹¹⁷ Kogrift: komelêk griftî têkbeste, *complex of problems*.

Giştiman dezanîn peywendî legel kesanî ciyawaz hestî ciyawaz debexşin. Dîdar heye letek fêrxwaz, hawkar yan dayikûbab, mirov têyda xoy be karama û dameziraw dezanêt. Dîdarî dîke heye hestî nîgeranî, stirês û dûdilî debexşin. Kesanêk hen xoşiman dewên, hen xoşiman nawên. Hen detwanin letek zor kesda hawkar bin, hen تنها letek çend kesêkda. Mirov heye berdewam û le bestênî hemecorîşda be rêber dête helbijardin, heyîşe bedegmen yan hergîz. Heye torî firewan û cêgîrî heye le hevbendîy hem kesekî û hem pîşewerî. Heyîşe dewrûberî çolewanîye.

Firajûtinî twanistî mirov bo sazkindinî hevbendî letek kesanî dîke bertawî çendîn hokare, hem cînkird (zigmak, mîratî) û hem jîngekird. Wek le çapterî dûhemda dîman, nexşî peywestbûnîş norey gewrey heye. Her çon behrey zigmakîy muzîk û matematîk hen, lewaneye behrey civakîy zigmakîş hebêt.

Be boçûnî min zor girînge mirov bizanêt hokar çîye kesanêk hen le sazkindinî hevbendîy pîşeweraneda ziyatir serkewtûn û heyîşe kemtir. Emey pêy degutirê twanistî hevbendkarîy birîytye le çî? Toy ke êste eme dexwênitewe pêt waye ciyawazî çîye le nêwan dû dîdarî geşeda, yekiyen to têyda hest be razîbûn dekeyt le koşanî xot û lewey dîkeda narazî?

Min dêm û rîşedozi le helsûkewtî mamostay nêw nimûnekey pêşû dekem le peywendîda be fêrxwazanewe û degem bem heft xale. Wişekanî nêw cûtkewane lêreda hewilîkî mine bo pênasekirdinî çemikî twanistî hevbendkarî.

- Belay olle -y mamostawe kesayetîy fêrxwazan û çonetîy girêdanî xwêndin be cîhanî corawcorî ewanewe, basêkî “serincrakêşe”.
- Mamosta “detwanêt cilewî hestekanî xoy bigirêt”, wate hestî xoy ne xefe dekat û ne rê helçûnyan dedat. Tûre debêt belam sûkayetî be kes nakat. Car heye dête wirûjandin, belam xoy radegirêt û yeknewazîy xoy têk nadat.
- Mamosta “twanay hawsozî” -y heye. Wate mamosta pey debat bewey fêrxwazî şerfiroş û xeyalpert natwanin be hasanî xoyan letek karûbarî fêrgeda biguncênin. Begîştî, mamosta nakewête nixandinî reftaryan belkû hewil dedat derhawîştey reftarekan çareser bikat be şêweyek arastey geş bêt.
- Mamosta “peros” -e hem bo pêwîstîy xoy be axaftin derbarey karekey legel kesêkî dîkey gewresalda û hem bo pêwîstîy fêrxwazan bo rêzgirtin le cîhanyan. Mamosta le derfetêkda, katêk yek le fêrxwazan basî merg dehênête pêş, giftûgoyek legel fêrxwazan derbarey merg saz dekat û lenakaw gişt poleke debine layengirî.
- Mamosta “twanistî hoşandin”¹¹⁸ -î heye. Wate: katêk fêrxwazan helwêstêkî taybet deniwênin, mamosta serinc dedate hem naxî xoy û hem hest û mebestî fêrxwazan, çon bîr dekenewe û amancyan çîye lew helwêste.
- Mamosta xawen “derikî hawbendî”¹¹⁹ -ye, ewey Aaron Antonovsky (1923-1994) -î civaknas be binemay dezanêt bo derûnsazî. Dakewt begîştî watadare,¹²⁰ berderik û berçareye.
- Mamosta begîştî “helwêstêkî na-nirxêner” -î heye beranber fêrxwazan, wate ziyatir bîr le watadarî dekatewe, nek başe û xirape. Lay mamosta “lêreda bîrt le çî kirdotewe?” Pirsiyarêkî bawe.

¹¹⁸ Twanistî hoşandin: mentalization capacity, çemikêkî serbe derûnnasîye be watay norîn le diyardeyek le riwangey corawcorewe, *xonorîn* le riwangeyekî “*dereki*” -yewe û *beranbernorîn* le riwangeyekî “*nêweki*” -yewe.

¹¹⁹ Derikî hawbendî: sense of coherence.

¹²⁰ Watadaretî: meaningfulness.

Twanistî hevbandkarî le pîşey mamostayetîda

Ême, wek zûtir bas kira, piştew ferhengî giwêrayelî - ke têyda tundûtîjî û bêçareyî deselimêndirêt - debizwêyn rûwew ferhengî berpirsayetî - ke têyda hawbiryaretî, rawêj û berpirsayetîy hawbeş debine şêwazêkî gurctir, dêmokratanezir û pesendtir bo rêkxistinî civak. Belam em rewte katî xayandûwe. Bebîrim dê bawikim, ke mamosta bû, zor bedaxewe deyrwanîye yasaxkirdinî lêdan le xwêndinda: deysa şerengêzekan çon çare bikeyn?

Lem serdemeda sinûrdanan bo cewanan basêkî germe, hem lay mamostayan û hem lay dayikûbab, çunke ferhengî berpirsayetî mewdayekî berfirewantir dedat be kesanî gewresal helsengandinî xoyan hebêt bo pirsî reftar legel mindalda. Jesper juul -î danmarkî ke çarekarî xêzane¹²¹ le kitêbî “*Konsten att säga nej med gott samvete*” - “*Hunerî gutinî na be wîjdanêkî aramewe*” (2006) denûsêt êsta debînî:

Neweyek le dayikûbab heye, lewaneye yekem car bêt le mêjûda, hewil dedat norey dayikûbawiketîy xoy le naxewe - le bîr, hest û nirxandinî xoyewe - helçinêt, çunke çî pêkhatinêkî ferhengî yan pîşewerî le dewrûberda nîye bibête piştîwan.

(Lapere 12).

Pêw waye, ew boçûne norey hawçerxî fêrkaranîş degirêtewe - emîş debêt le naxewe helçinrêt. Ew kese salarî peyda dekat ke mitmaney fêrxwazan wedest bènêt, mitmaney be dû tay hawşanî: “*zanistî babet*” û “*hunerî kesekî*” peyda debêt.

Olle Österberg le basekey sereweda tûre debêt lewey fêrxwazan aramîy xwêndin deşêwênin belam sûkayetî be kes nakat, wate fêrxwaz bekar nahênêt bo çarekirdinî tûreyî û bêdeselatîy xoy. Wate detwanêt hestî resenî xoy pêşan bidat bê zêderoyî û bê derbirînî serincî hestşkên derbarey fêrxwaz. Mamosta detwanêt katî tûrebûnîş rêz le fêrxwazan bigirêt. Mamosta zor baş dezanêt ke deselatî heye xulyay xwêndin lay fêrxwaz hem dagîrsênêt û hem xamoş bikat.

Çî rûy deda ger ew mamostaye rêbazekanî cilewgîrîy serbe ferhengî giwêrayelî bekar birdiba? Lewane bû ew sê kure bizêwe birêk şermezarî û çendîn têbînî bixon, sizay manewe û nîmîreşkênîş çawerêyan ba. Pêw waye kîjole bêdengekânîş bew keşe pestênirawey nêw pol çawşkên dekiran û pitir bêdenq debûn. Ew kurey basî mergî wirûjand hergîz be xeyalîda nedehat bas le tirsî xoy bikat le merg. Lewanebû fêrxwaz le twanadozîda babetî rabûn û rmanî dewletî roman rave biken belam neyan detwanî ew zanyare tazepeydakirawe berawird biken be cîhanî paş hezar û pêncsed saley xoyan.

Gorînî “şêwaze helwêst”-î cêkewtûy nêw mirovgel karêkî katxayene. Bo nimûne hevbandîy jin û piyaw, serkar û karmend, mamosta û fêrxwaz. Zor lewaney be peşewî, hera û şerî nêw fêrge nîgeran debin, emro daway pelgîrîy tundtir û cilewgîrîy ziyatir û deselatî beriztir bo mamostayan deken. Kêşey zorbey ew pêşnyazane lewedaye ke raste maweyekî kurtxayen pergalekî riwaletî dabîn deken, belam le mewday berîntirda ew çareseraneş debine rêxoşker bo civakêkî pitir nademokrat û nayeksan.

Ew rik û tirsey zordarî deyçênêt, xoy penhan dedat û paşan be sinûrbezênî û çepandin dête derbirîn. Be riwalet dunya aram û baş diyare, belam le jêrewe tolesendinewe, çewsandinewe û saxtebazî şîn debin. Ger zebir û naçarkirdin tenha bo doxî ewperî rîzper bibine bijare, ewsa debêt mirov bikewête sazûsewda û pêkhatin. Ewca bo geştiştin be pêkhatin debêt giwê bo kesî beranber radêrîn, bo kesî le xoman ciyawaz û xawen dîdî ciyawaz. Rêsa le fêrge, her wek le beşekanî dîkey civakda, her

¹²¹ Çarekarî xêzan: family therapist.

demênêt, belam makî rêsave çîye û helwêst lew kesaney debêt peyrewîy rêsave biken çone, basêkin debêt nawenawe le layen gişt kesani peywendîdarewe miştumirî Leser bikirêt.

Lem bestêneda cêy xoyetî bîrêk lew 2,6 milyon “dîdarî geşe” -ye bikirêtewe ke salane le fêrgey Swêdda deçerxên. Ewane axaftinî pîşeweraney firepate. Mebest lêyan giftûgoy mamosta, fêrxwaz û dayikûbabe derbarey hem xwêndin û hem firajûtinî civakîy fêrxwaz. Lêreda xilteyekî şêlgîrî ferhengî giwêrayelî xoyan xuya deken, ewîş cexitkirdinî berdegame Leser kemasî. Johan Hofvendahl le zanistnamekey xoyda “*Riskabla samtal*” - “*Axaftinî metirsîdar*” (2006) û herweha le gutarî “*Noa har inga fel*” - “*Noa çi heley nîye*” (2006) pêşanî dedat car heye giftûgoy watadar zor sexte.

Le zanistnamekeda rûn debêtewe mamosta çend dekoşêt bo damezirandinî dîdarêkî asûde le rêy wirdebasî rêçkeşkên. Ewca girîng xoladane le şermezariy xewsûk. Hem fêrxwaz û hem dayikûbab nîgeranin le bîstinî dengûbasî nayetî. Paşan debêt dîdareke be corêk kota bêt giştyan hest be razîbûn biken.

Gutarekey “*Noa çi heley nîye*” pêşanî dedat çemikî nixênerî serbe ferhengî nerêtîy fêrge, bo nimûne: dirust û çewt, baş û xirap karîgerîy nayetî heye Leser giftûgoy dîdareke - gerçî mamosta wîst û mebestî başî heye bo derikkirdinî layenî geş le firajûtinî fêrxwazekeda. Em diyardeye aşkira debêt bewey mirov berdegame “*riwangey çewtdozî*” helbijêrêt, tenanet ger mebest pêşandanî layenî başeş bêt. Mamosta heye delêt: “*bê heleye*” yan “*tenha yek heley biçûkî têdaye*” le birî ewey bilêt “*giştî diruste*” yan “*nêzîkey giştî diruste*”.

Nimûneyekî dîke eweye mamosta delêt: “*takutera şitî biçûk lêre û lewê heye belam be boçûnî min çi nîye pêwîst be nîgeranî bikat*”. Be hoy girtinî yeknewazî em riwange çewtdozîye, ewey mebest bû lêy beperêz bîn, wate kewtine doxî şermezariyewe, berdegame lem giftûgoyeda amade debêt û tirsêk dirust dekat lewey mirov wek pêwîst baş nebêt. Ca ger mamosta le serincêkî dîkeda nimûneyekî pir hele le karî fêrxwazeke pêşan bidat, ewa nîgeranî tewaw deçespêt.

Riwangey çewtdozî riwangey nerêtîy fêrgeye. Helbet mebest ewe nîye mamosta hergîz aferîn le berhemî başî fêrxwaz nakat, mebest eweye fêrge ranehatûwe be hewildan bo “*dirustdozî*” û baskirdinî layenî başe. Le ezimûnî mamostayetîy xomewe em ragiwasteyey gutarekey serewe denasimewe: “*pêm waye şitêkî dîkey weha nemawe basî bikeyn. Yekawyeke. Pîroz!*”. Minîş hergîz le “*zor başe*” û “*here berze*” ziyatirim nedegut be fêrxwazî zîrek. Belam ger dehate ser encamî kemtir serkewtûy twanadozî, giftûgoy dirêjxayenim debû legel fêrxwaz û dayikûbabda derbarey kemasîyeke.

Başe bo debêt mamosta pêy weha bêt pêwîst nakat ziyatir bidûwêt derbarey berhemî baş? Be boçûnî min hokarekey degerêtewe bo ewey riwangey çewtdozî bote nerêt le fêrgeda. Fêrkarî û xwêndinî dewamedar heta êstaş bedegmen şewazî giftûgo derbarey diyardey geş dexene berbas. Min ke hatime ser karî derûnsarêj (şaykoterapîst) ewca fêrbûm pirsyarî prose bikem. Bo nimûne:

- Bernamey xwêndineket çon darişt wa em encame başet le twanadozîda wedest hênawe?
- Em şewazet çon be xeyalda hat?
- Beşêkî diyarîkiraw hebû le korsekeda betaybetî mayey serinc bûbêt belatewe?
- Ew kospany hatine rêget çî bûn?
- Harîkarît letek kê bû?
- Awha! Başe çon bû daway yarmetît le biraket kird?

Katêk riwangey çewtdozî - eme çewte û eme diruste - wela denrêt, axaftineke pitir watadar û serincrakêş debêt wek lewey bas ziyatir le hele û nimore bêt.

Ewca lewaneye xwênerî wirya bipirsêt: başe çî bikeyn letek fêrxwazêkda çî berhemêkî başî nebêt? Lêreşda pirsiyarî prose baştîre wek le merc û handan bo gurcbûnewe. Fêrxwaz heye bo xoy carûbar le dîdarî geşeda delêt: “îdî kate min xom gurc bikemewe û dest bideme xwêndin”. Belam kêşeke lewedaye ewan zor car nazanin çon biken.

Katêkîş dête ser ew fêrxwazaney natwanin amancî “planî fêrkarî” bipêkin, zor mamosta pêy sexte ew rastîye bas bikat. Tirs le şermandin weha dekat mamosta kirokî baseke weha perdepoş bikat, peyameke narûn bêt. Keçî dekirêt bas le berhemî fêrxwaz bikirêt bê penabirdine ber wişey nirxêner. Bo nimûne dekirêt mamosta bilêt: “to le twanadozîy îngilîzîda 22 nimiret hênawe û mercî derçûn 40 nimireye”.

Mamosta pêwîst nakat wek hawkarêkî min be fêrxwazêkî polî dûhemî amadeyî gut, bilêt: “to ewende tembelît ke katî nûsîn dêt natwanît dest bideyte xameke!”. Welamî fêrxwazekeş eme bû: “toyîş ewende bêmêşikî tênageyt wanekanit çend bêbayexn”.

Mamostayan Kerstin Måhlberg û Maud Sjöblom le kitêbî “*Lösningssinriktad pedagogik*” - “*Fêrkarîyekî çareserbîn*” (2004) denûsin katêk le fêrgey Mellansjö bûn çon “*pirsiyarî prose*” -yan bekar hênawe û çend sûdbexş bûwe. Emeş çend nimûneyek le kitêbekewe:

- To êsta çî yarmetîyekit pêwîste?
- Çît kird bo ewey bitwanît giwê bigirît?
- Kêye yekem kes pêşkewtinekanî to debînêt le xwêndineweda?
- Çî bekar dehênît le karda?
- Min çon detwanim yarmetît bidem?
- Girîman to û min sê mangî dîke yektir debînînewe û to be min delêt “xwêndinekem baş deçerxêt”. Debêt lew demeda çî rûy dabêt?

Le rêy pirsiyarî prosewe, mamosta detwanêt bîroke, hest, xwast û twanay fêrxwazeke ser bixat. Pendî pêşînyan ciwanî gutûwe: “*welam bepêy pirsiyare*”. Huner eweye pirsiyareket weha bêt wata û bestên bidate xwêndineke û herweha yarmetîy fêrxwaz bidat xoyan bibînin. Pêwî waye binemay şêwazî pirsiyarkirdin girêdirawî hem astî zanistîmane û hem mirovnorîman.

Çapterî dahatûş her basî çonetî pêşwazî dekat belam le riwangeyekî pitir felsefîyanewe.

Çapterî pêncem: Koşîn bo pejrandin

Le giştyan girîngtir

Perînewe le ferhengî giwêrayelîyewe bo ferhengî berpirsayetî daway şêwazêkî niwê dekat bo pêşwazîkirdin le yekdî. Belam gorankarîyê qûl le xonorî û beranbernorîmînda karêke katxayen. Em çîwar kêlerêye le mêjûy hawçerxî Swêdda beşêkî ew firajûtine pêşan deden:

- 1920 bîrazkirdinî karmend le layen cûtyarî xawen karewe yasax kira
- 1958 bîrazkirdinî fêrxwaz le layen mamostawe yasax kira
- 1979 bîrazkirdinî mindal le layen dayikûbabewe yasax kira
- 2006 helawêrdin û helwêstî dîkey sûkayetîkirdin be mindal û fêrxwaz le fêrgeda yasax kira

Kewate destpêkî firajûtin birîtîye le yasaxkirdinî bekarhênanî zebirî leşekî beranber kesanî dîkey gewresal “be mebestî tembêkirdin” - axir hemîşe em tembêkirdine biyanûy lêdan bûwe, paşan geyîşte yasaxkirdinî helawêrdin û sûkayetî be mindal. Wişey “bîrazkirdin”, ke zûtir gelêk dayikûbab û mamosta watakeyan debestewe be perwerdeyê berpirsanewe, êsta watakey gorawe be lêdan, ke reftarêkî tewaw akarbedere, abirûşkên û tawane.

Pêmanîye emro zor kes mabêt le Swêd dawa bikat mamosta mafî hebêt zebirî leşekî beranber fêrxwaz bekar bihênêt. Mamostaş nayhewêt be hîç corêk sûkayetî be fêrxwaz bikat. Amancî mamosta eweye fêrxwaz hem zanistî niwê werbigirêt û hem rêz le têkoşanî mamosta bigirêt. Helbet hemîşe weha nîye, fêrxwazî xemsard û lasar karêk deken mamosta hest be tûrebûn, nakamî û carûbar bêdeselatîş bikat. Sûkayetî corî zore, bo nimûne zarekî, le rêy cudakirdinewe le grûp yan le rêy zimanêkî çewtewe ke zor abirûşkên bêt. Hawkarêkim carêk bo welamdanewey sûkayetîyê fêrxwazêk, gutî: “min dermanî derdî dekem” û le welamî fêrxwazêkî dîkeda gutî: “min amade nîm mirwarî bo berazan helrêjim. To debêt ta kotay wane le jûrî grûpkar danîştî”.

Dozînewey şêwazî dîke bo dabînkirdinî aramîyê nêw fêrge, cuda lewaney serbe ferhengî giwêrayelîn, basêke pir le rarayî. Mindal çon be bê zebir perwerde dekirêt û çon pêy bilêyn “na” bê penabirdin bo sûkayetîkirdin û şikandin, basêke miştumirî radyo û têvê, nûsyarî niwê, “encumenî dayikûbab”,¹²² “rojanî terxan bo giftûgo”¹²³... pêwey xerîkin.

Jesper juul -î nûserî danmarkî ke le çapterî pêşûda nawî hat, zorî derbarey em base nûsîwe. Le kitêbî “*Hunerî gutinî na be wîjdanêkî aramewe*” (2007) rûnî dekatewe çon xwastî ême le bînîni fêrxwazî bêdeng û zîrek metirsîyê heye. Ger ême, mindal be corêk perwerde bikeyn ewende giwêrayelî û xoguncên bin, le temenî gewreyîda tûşî gêçel dên.

Erê, minîş wek mamosta carûbar, katêk plane wirdekey wanekem şikestî dehêna û kes neydewîst giwê bigirêt le gutekanim derbarey erikî sbey, kemêk bêdengî û selarîm le fêrxwazan be awat dexwast.

Em gorankarîyey helwêst ke ferhengî berpirsayetî legel xoy hênawe, lay zor mamosta bote kosp le rêy cudakirdinewey tûrebûn le fêrxwaz û sûkayetî be fêrxwaz. Derencamîş zor car geyîştûwe be

¹²² Encumenî dayikûbab: her fêrgeyek encumenî dayikûbabî xoy heye.

¹²³ Rojanî terxan bo giftûgo: rojî taybet le salnameda diyarî dekirêt bo rawêj û axaftinî serbe karûbarî fêrge.

lawazbûnî hêzî helwêstgirtin û be xefekirdinî tûreyî û gorînî be dizandin lay mamosta. Fêrxwaz zor car ke çawerêye mamosta bilêt “na” belam naylêt, pêy waye mamosta “xemsarde”. Ew hawkarey taze basî hat, detwanêt bo nimûne welamî bêrêzîyekey fêrxwazeke bem core bidatewe: “ewey to deylêt bêrêzîye û derfetî harîkarîman deşêwênêt. Hewil bide mebestî xot be şêwazêkî dîke derbirît!”.

Çepandin û şêwazîy bêrêzîy dîke wêray yasay niwê, wêray tîmî piştîwanîy fêrxwaz û planî dijeçepandin, hêştâ kêşeyekî berdegame le fêrgeda. Belay gewre lewedaye ke mamosta xoy serçawey beşêkî ew sûkayetîyeye. Hemû hefteyek “fermangey fêrkari” skalay fêrxwaz û dayikûbabî bo dêt derbarey mijarî sûkayetî le fêrgeda. Pitir le sêyekî skalakan derbarey sûkayetîkirdinî mamostaye be fêrxwaz. Eme le masternamey salî 2007 -î buwarî fêrkariy Anne-Lie Lindström da hatûwe. Anne-Lie peycoî le 95 skala kirdûwe ke paş derçûnî “yasay parastinî mindal û fêrxwaz” yekemî apirîlî 2006, dirawinete “*Fermangey fêrkari*”. Le gişt ew mijaraneda hem mamosta û hem berêweberan agadarî sûkayetîyeye hebûn, belam تنها le 7% -î mijarekanda boçûn wehaye ke fêrxwaz yarmetîyekî lebarî wergirtûwe.

Begiştî, xebat bo neselimandinî lêdan le fêrgeda êsta geyîştote encam. Belam koşanêkî be heman endaze gewre mawe bo çarekirdinî kêşey ewey zor kesî gewresal heta êstaş sûkayetîy derûnî deselimênin. Be radey serkewtinî em kare, derfetî fêrxwaz ziyatir debêt bo wedesthênanî zanistî niwê. Ewsa ewanîş zemîney baştiryan debêt bo ewey be hewsengandin û berpirsayetîyewe beşdar bin le geşekirdinî civakêkî dêmkokratda.

Girîngtirîn bas eweye hem mindal û hem gewresal le fêrgeda hest biken bewey pesendin, rêzdarin û be endamî girîng dezanrên le hawbendîyekî karî behadarda.

Axel Honneth (1949-) -î feylesûf em base weha daderêjêt:

“Pejrandinî dûlayene le nêw mirovgelda binemaye bo guzeranêkî civakî. Emyan, le astî hem takekes û hem civakda, pêş helçinîni zanyar û firajûtinî akarnasane dekewêt”.

Sûkayetî çîye?

Axel Honneth -î feylesûfî civaknasî, zadey salî 1949 ye û profîsore le zankokanî firankifort û mayn. Honêt karî leser “*bîrdozey rexnekar*”¹²⁴ kirdûwe (ke kesanî wek Theodor W. Adorno (1903-1969) û Jürgen Habermas (1929-) niwênerayetîy deken). Dozêkî girîng lem bîrdozeyeda birîtîye lewey mirovî hawçerx çon bikat bo dabînkirdinî jîyanêkî baş katêk dekewête nêwan mercî berpirsayetîy cîhanêkî dadperwer le layek û mercî xorastandin¹²⁵ û pêkanî amancî xo le layek. Be boçûnî min, em doze mamosta û fêrxwazî fêrgey hawçerxîş degirêtewe, be astêkî berzîş girêdirawî peywendîmane hem be xomanewe û hem be kesanî dîkewe.

Ragiwastekey serewe bîrdaneweman derbarey hevbendîy mamosta - fêrxwaz û helûmercî xwêndinêkî serketû le fêrgeda, qûltir dekatewe. Debêt mebestî Honneth çî bêt lewey pejrandin pêş helçinîni zanyare? Bê ewey feylesûf bim, beşêk le têgeyîştin û bîrkirdinewey xom bedem xwêndinewey kitêbekey wî “*Pejrandin*”¹²⁶ pêşkeş dekem.

¹²⁴ Bîrdozey rexnekar: critical theory.

¹²⁵ Xorastandin: self-realization, self-actualization.

¹²⁶ *Das Andere der Gerechtigkeit. Aufsätze zur praktischen Philosophie. Erkännande* (2003).

Serşarî¹²⁷ Honneth birîtiye le “pêwîstîy pejrandin” lay mirov. Le bestênî fêrkarîda ême çemikî “nasandin” bekar dehênîn û pê m waye heman watay heye. Lem nûsînemda herdû çemik bekar dehênim. Honneth delêt mirov, bo pêkhênanî “xo-hevbendîy geş”, pêwîstî be pejrandinî kesanî dîke heye. Mebestîşî le “xo- hevbendî” eweye mirov çon derwanête xoy: honorînî çone. Nimûneyek le xo-hevbendîy geş eweye mirov pêy waye pêwîstîy leşekî û derûnîy xoy mayey rêzgirtinî, hem le miroveke xoyewe û hem le kesanî dîkewe. Mirov deyhewêt hest bikat kesêkî lêselimênirawe, bo nimûne, le pol û cêkarda. Hem xoy û hem kesanî dîke hest biken em nexşêkî bayexdarî heye lew kobendîyeda. Hevbendîy mirov be xoyewe karîgerîy gewrey heye leser:

- Pêkhênanî nasname: karkirdin leser nasînî xo û nasînî ew bestêney mirov xoy têda dedozêtewe
- Firajûtinî akar: karkirdin leser bîrûra derbarey çake û xirape
- Helkirdinî civakî: twanistî sazkindinî hevbendîy baş letek kesanî dîkeda

Kewate derfetî mirov bo azadî û xorastandin girêdirawî pejrandinî kesanî dîkeye. Ême xoriskane ew pejrandine pêşkeş kesanêk dekeyn xoşewîst û rêzdar bin laman û tenanet ewaneş ke peroşî êmen. Belam ewe hergîz dawayekî berbeyar¹²⁸ nîye, leber ewe xebat bo pejrandin debête beşêk le sûrî jiyânî zorbeman.

Ême, bê pejrandin natwanîn ew hevbendîye geşe letek xomanda saz bikeyn ke jiyânêkî baş daway dekat. Em baseş hem tak degirêtewe, hem grûp. Kospî azadî û xorastandin, be dîdî Honneth rê nedane bew pejrandine. Kewate şaxal le boçûnekey Honneth da ew mercane nîn ke pêwîstin bo jiyânî xoş, belkû kospekanin le rêy ew jiyane xoşeda. Be boçûnî Honneth rêgirî le pejrandin debête “sûkayetîy akarekî” çunke debine hokarî têkdanî derfetî mirov bo sazkindinî hevbendîyekî geş be xowe. Emeş debête kosp bo hevbendîyman legel kesanî dîkey bestênekemanda.

Nimûneyekî aşkiray em base, têkoşanî grûpî kemayetîye bo wedesthênanî pejrandin. Lem Swêdeda nimûneyan zore, grûpî hawzayendxwaz, samekan,¹²⁹ dom, kesanî xawen dîsîlêksya¹³⁰ û çendîn grûpî dîke ke le ferhengî berpîrsayetîda xwazyarin rizgaryan bêt le şermandinî serbe ferhengî giwêrayelî. Emane xebat deken nek tenha bo lêselimandin belkû bo ewey rêzyan lê bigîrêt çî wek tak û çî wek grûp, wek behadar reçaw bigîrên bo hawbendîy civak. Le Swêd lem çend desaley raburdûda çîwar “gelparêz”¹³¹ hatine damezarin bo piştîwanî lew xebate:

- Gelparêzî yeksanî¹³²
- Gelparêzî dij be helawêrdinî nejadî (êtinî, kesanî serbe mîllet û gelî cuda)¹³³
- Gelparêzî dij be helawêrdinî zayendxwazî¹³⁴

¹²⁷ Serşar: deraw, xal û hêlî destpêk.

¹²⁸ Berbeyar: aşkira, her lexora.

¹²⁹ Sam: gelêkî taybete be bakûrî Ewrûpa, nîştîmanekyan, Sameland dabeş bûwe le nêwan bakûrî rojaway Rûsya, bakûrî Fînland, Swêd û Norwêj.

¹³⁰ Dîsîlêksya: *dyslexia*, dijwarîy xwêndinewe û nûsîn.

¹³¹ Gelparêz: *Ombudsman*, karmendêkî dewletîye erikî eweye dakokî le hawzêdan bikat beranber bêdadîyekî dête pêş betaybetî le dewletewe.

¹³² Gelparêzî yeksanî: *Jämställdhetsombudsmannen (jämO)*.

¹³³ Gelparêzî dij be helawêrdinî nejadî (êtinî, kesanî serbe mîllet û gelî cuda): *Ombudsmannen mot etnisk diskriminering (DO)*.

¹³⁴ Gelparêzî dij be helawêrdinî zayendxwazî: *Ombudsmannen mot diskriminering på grund av sexuell läggning (HomO)*.

- Gelparêzî griftdaran (kesanî xawen pêdawîstîy taybet)¹³⁵

Bîrdozekey Honneth tîşk dexate ser çemikî “sûkayetî” û têgeyîştinêkî qûltirman pê debexşet derbarey mebest lem yasa tazeyey yasaxkirdinî helawêrdin û sûkayetîkirdinî dîke be mindal û fêrxwaz le fêrgeda. Giştiman dezanîn ke hevbendîy baş letek fêrxwaz û hawkarda girînge bo dabînkirdinî guzeranî xoş le karda û bo encamdanî karî baş. Mebestî here zorî mamostayanîş her reçawgirtin û rêzgirtinî fêrxwazane. Êmey mamostaş demanewêt bibînreyn û rêziman bigîrêt. Wêray eweş hêştâ rû dedat mamosta le fêrgey Swêdda sûkayetî be fêrxwaz dekat.

Serşarî boçûnî Honneth pêwîstîy qûlî mirove bo pejrandin û delêt “akarî pejrandin” birîtîye le “erike leserman helwêstiman le kesî beranber be şeweyek bê ew kese bitwanêt hevbendîyekî geş letek xoyda saz bikat”. (serçawe: pêşekîy kitêbî “*Pejrandin*”). Ewca pirsiyar eweye: rêbest lewey mirov hevbendîyekî geş letek xoyda saz bikat çîye? Welam: rê nedane be pejrandin. Kewate, nehatinî ew selimandiney pêwîste bo sazîkirdinî hevbendîyekî geş letek xoda, debête sûkayetî çunke derfet le mirov deşewênêt bo hestkirdin bewey ewîş mafî bûnî wek hemwan heye. Rêzbezandin bo nimûne bêrêzîkirdine be kesêk yan grûpêk, behend negirtine, bêrêzîye le xoderikî beranber.

Belgekarî¹³⁶ -î Honneth sûdî zore hem bo giftûgoy karûbarî fêrge û hem bo rawêj derbarey civak begîştî. Bas tenha le mafî takekes nîye bo azadî û xorastandin, belkû harîkarî û giftûgoşiman degirêtewe bo firajûtinî dêmokrasî. Lêreda cexit Leser helwêstî hawşan û bêlayan nîye belkû Leser dozînewey sinûrbezênîye le pejrandinî kesî beranber û dozînewey derhawîştekanî ew reftareye Leser helçinî nasname û twanay xorastandin.

Le civakî fireferhengda bo nimûne, bas lewey kame derbirînî ferhengî, le taybetmendîy xoyda, mayey pesendkirdin, rêzgirtin û pejrandine û kame be yasaxkirdin û şermandinî akarekî debêt gemaro bidirêt. Le fêrgeda bo nimûne bas le bernamey xwêndin dekirêt, kame bayexdare û kame na, kam cor berhemkarî xelat bikirêt û kamyan le bêdengîda feramoş bikirêt, kam mamosta û fêrxwaz le hawbendîda cêy hebêt û kê perawêz bixirêt.

“Rênamey fêrge” be şewazî corawcor bas le berpirsayeyetîy akarnasane dekat. Kotaraportî peycorîy “komîtey riştey mamostayetî” em dariştiney heye:

Erikî mamostayetî dekatewe berpirsayetîy le çerxandinî karêk têyda mamosta û fêrxwaz geşe deden be rêzgirtinî dûlayene. Emeş be mamostayek dête dî ke rêzdar bê hem be twanay zanistîy xoy û hem be kesayetîy xoy. Em erike mercî heye hem Leser helkirdin letek kesanî dîke û hem Leser zanist derbarey mirov û derbarey ew prosaney dekewine ger katêk mirov dête harîkarîyewe.

(SOU 1999:63 lapere 10).

Deysa bizanîn Honneth le “xo-hevbendîy geş” û “sûkayetîy akarekî” mebestî çîye. Honneth le kitêbî “*Pejrandin*” da derbarey hevbendîy tak yan civak letek xoda, amaje be sê ast dekat. Corî ciyawazîy sûkayetî debestirênewe be yekbeyekî ew sê astewe. Ger ew base Leser doxî fêrge piyade bikeyn, dekirêt basêkî lem babetey lê derçêt:

¹³⁵ Gelparêzî griftdaran (kesanî xawen pêdawîstîy taybet): *Handikappombudsmannen (HO)*.

¹³⁶ Belgekarî: reasoning.

- 1- Xonasîn - agahîyekî bineretîye derbarey twana û pêwîstîy leşekîy xo.
Lem asteda sûkayetî debête rêz negirtin le pêdawîstîy leşekîy mirov. Bo nimûne lêdan û çepandin. Herweha jîngey fêrgeş degirêtewe ger pêdawîstîy wek heway pak, rûnakî, xorakî baş û twalêtî pak, dabîn nekirên.

- 2- Rêzlexonan - agahîye le sengî xo. Agahîy mirove lewey kesanî dîke mitmaneyan heye be twanay helsegandinî em.
Sûkayetî lêreda wata mirov twanay helsegandinî lê neselimênrê. Mamostayek car dûway car boçûnekanî le layen rêberayetîy fêrgewe feramoş bikirên rêzlexonanî dijwar debêt. Fêrxwaz ger le biryardanî karûbarî fêrgeda perawêz bixirên hest be sûkayetî deken lewey berêweberayetîy fêrge û siyasetmedaran giwêbîstî serincyan nabin.

- 3- Bexozanîn - agahîy mirove lewey xawen twanay geş û bayexdare.
Sûkayetî lêreda wata twanistekanî mirov, le hawbendîy kesanî dîkeda, sengiyan nederêtê. Kesêkî seng bo twanakanî danenrê "bexozanîn" -î birîndar debêt. Bo nimûne, "fêrkarêkî katî azad"¹³⁷ rolwazî (dirama) -î xwêndûwe, bîroke û projekanî le buwarî karekeyda sengiyan pê nadirêt. Yan fêrxwazêkî behrekanî behend negîrên. Mamostaye û gişt carêk tûşî fêrxwazî xemsard û xeyalpert debêt. Emane be hasanî hestî bexozanînyan xamoş debêt.

Heta astî xo-hevbendîy zamdar ziyatir bineretî bêt, sûkayetîyeke qûltir debêt. Wate ger pêwîstîy cênêtîk, leşekî û derûnîy petî birîndar bikirên zameke gewretir debêt lewey bo nimûne twanay helsegandinî neyete selimandin. Mirovêk pêwîstîy asûdebûn, pêwîstîy xorakî yan çalakîy leşekî lê neselimênrê, hasantir twanay "xo-hevbendîy geş" -î deşêwêwê wek lewey le civînêkda bîrokeyekî niwêy lê pesend nekirê.

Akar be boçûnî Honneth pêwîste bo ewey êmey mirov bitwanî jiyaneêkî xoş beser berîn. Pejrandinî kesî beranber zor girînge bo pêkhênanî nasname û damezirandinî guzeraneêkî kobendî lebar. Hevbendîyman letek dayikûbab, mamosta, hawkar û dostanda debête darêjerî xonorî û beranbernorîman. Kewate pejrandinî diyardeyekî "nêwberyan"¹³⁸ -e. Sereta debêt ême cêy pejrandinî bîn wek kesaneêkî bayexdar ewca êmeş lay xomane kesî beranber bipejreên. Ger layenî beranber min nepejreên, wate sûkayetîm pê bikat, zûzûş weham legel bikat, ewa dekewme kêşey pêkhênanî nasname û akarnorî. Cige leweş le hawsemay civakîda letek kesanî dîkeda tûşî kêşe debim.

¹³⁷ Fêrkarî katî azad: "*fritidspedagog*", fêrkarêke kar legel zarok û herzekarda dekat le derewey katî xwêndinî pol. Em pîşeye riştey xwêndinî xoy heye û taradeyek le derewey Skandinavya namoye.

¹³⁸ Nêwberyan: intersubjective, nêwberyanetî: intersubjectivity - çemikêkî serbe derûnnasîye mebest lêy:
 - Ezimûnî - ziyatir derhest nek berhestî - hawbeşî çendîn kese, bo nimûne ezimûnî çendîn çawdêr le tojînewey zanistîda.
 - Hawsemay desteyek mirove ke boçûn, xulya, meyl û ... htd-y xoyan le çêwey hevbendîy nêwxoyan debînîn, ca hestandinyan le diyardeke wêkiçû bêt yan ciyawaz. Em core hestandine le kesanî dîke xizmayetî heye legel çemikî "*hoşeder*". Birwane perawêzî taybet be "*hoşeder*".

Serçawey em pênasaye: ferhengî derûnnasî: psykologilexikon <http://www.psykologiguiden.se>.
 Bo çemikî "*beryan*" -îş birwane: "Lîstî zarawe zanistîyekanî", "*Govarî Korî Zanyarî Kurd*", bergî çiwarem, salî 1974. Celîzade, "*Zarawesazîy pêwane*".

Be boçûnî min, bîrûray Honneth -î feylesûf derbarey pêwîstîy qûlî mirov bo pejrandin, rêk deguncêt legel boçûnî zanayanî derûnnas, mêşiknas û civaknas derbarey pêwîstîy mirov be peywestî asûde.

Sûkayetîkirdin be mamostayek

Werin le nêzîkewe seyrî nimûneyek bikeyn le sûkayetîkirdin be mamosta têyda her sê astekanî Honneth basyan lê dekat, beser bikirênewe. Ba bizanîn hevbendî ew mamostaye letek xoyda çon dekewête bertawî ew diyardeye. Nimûneke le zanistnamekey Arja Paulin wergîrawe, “*Mawey yekem le pişekeda*” (lapere 117):

Hêlêna zor mandûwe. Hewraz û nişêw dekat. Destî be babetî niwê kirdûwe, serleberî rojanî pişûy xoy be rastdozî¹³⁹ beser debat. Hemû şitêk kat zor debat. Arya zor stirêse û çî yarîder û piştîwanî nîye. Hest be tenhayî dekat. Kes nîye bîdûwênêt û bîrûray legel alugor bikat. Hêlêna tengaw bûwe bo peydakirdinî amojgarî û bîroke. Ger dête ser basî xwêndinî giştî yan qûlbûnewe, hawkarano boçûnî ciyawazyan heye. Hêlêna bedest em hawkaranewe xoy bêbehre debînêt. Hawkarano hengawêk nanên bo pêşwazî le hêlêna. Çend mamostayekî jin hen, şeş xanimin, wêkira derdeçin û le derewe firavîn dexon belam le hêlêna napirsin ger bîhewêt begelyan bikewêt.

Zorbey tazemamosta xoy lem barey hêlênada bîniwe, belam aye çend kes pêy waye sûkayetî be hêlêna kirawe? Min xom ew demey bîstupênc sal bûm û destim daye yekem karim le *amadeyî Eksjö* û her zû bom derkewt gişt twana û katim deçêt bo kar, pêm waniye hîç bîrêkim bew arasteye kirdibêtewe.

Astî yekem lay Honneth bas le xobawer dekat be watay agahîy mirov le twana û pêwîstîy leşekîy xoy, be rûnî deryan bibirêt û wehayan têbigat ke şayanî pejrandinin le layen kesanî dîkewe. Sûkayetî lêreda wate behend negirtinî pêwîstîy leşekîy em kese. Le nimûnekey sereweda rûne ke hêlêna pişûy leşekîy pê dabîn nabêt. Sûkayetîyeke lewedaye ke ew kesey berpirse le diyarîkirdinî nêwerokî karekey hêlêna pêwîstîy bûjanewe û pişûy hêlênay reçaw negirtûwe. Derhawîştay em diyardeye, be dîdî Honneth deşêt şêwandinî xo-hevbendîy hêlêna bigate radeyek pêy weha bêt pêwîstîy leşekîy xoy çî bayexêkî lay kesanî beranber nîye. Lewaneye wehay têbigat ew stirêse û şeketbûne derencamî lawazîyekî xoyetî, wate lawazîy leşekî û derûnî xoyetî, nek zêde bargiranîy kar.

Deşkirêt le riwangeyekî dîkewe temaşay em base bikeyn. Le ferhengî giwêrayelîda, ewe erikî aşkiray karmende bê skalakirdin serfirûy mercekanî xawen kar bêt. Belam le ferhengî berpirsayetîda çawerwan dekirêt le karmend berpirsayetîy xoy bigirête esto û bête go ger bargiranîy kar geypişte astêkî twanabeder.

Lem bareda, deba mamostay nimûnekey serewe biçête lay berêweber û daway gorankarîy bikat le karûbarî xoyda. Çunke aşkiraye berêweberayetîy fêrge natwanêt kêşeyek çareser bikat lêy bêaga bêt. Belam wek mamostayekî be hoş gîrxwardû le ferhengî giwêrayelîda deçêt gazende lay xêzan û dostan dekat bê ewey tenanet bexeyalîşda bêt doxekey xoy bo rêberayetîy fêrge rûn bikatewe. Le layekî dîkeşewe ger mamostake xoy be endam bizanêt le ferhengî berpirsayetîda belam berêweber le ferhengî giwêrayelîda gîrî xwardbêt ewa mamostake ger skala bikat dekewête ber metirsîy ewey be netwan û herasankar dabinrêt. Lewaneyişe karîgerîy nayetîy hebêt Leser karekey.

Astî dûhem lay Honneth derbarey rêzlexonane - mirov kesêk bêt lay dewrûber behend bigirêt. Lewe naçêt hêlêna le layen hawkaraniyewe be kesêkî bayexdar seyr bikirêt û boçûnekanî cêy serinc bin. Şêwazî helwêstî hawkarani hestî bêbehreyî le lay hêlêna dirust deken. Sûkayetîyeke pêşanî dedat ke

¹³⁹ Rastdozî: mamosta berhemî fêrxwaz rastdoz dekat, wate rastî û çewtî degirêt.

hawkaranî tenanet rêzîşî lê nagirin eweş debête hokar bo ewey xoyîşî netwanêt rêz le xoy bigirêt. Bew corey kesanî beranber seyrî mirov deken, miroveke xoyîşî hêdî hêdî seyrî xoy pê dekat.

Astî sêhem derbarey bexozanîne. Wek mamostayekî taze dameziraw mirov gerekîyetî le layen hawbendîyekewe pêşwazî lê bikirêt. Banghêştikirdin bo firavîn corêke le pejrandinî kesanî beranber, amajeye bewey em mirove şitêkî pêye sûdbexş bêt, keseke wek mirov rêzî degîrêt.

Nawdar yan pejreniraw¹⁴⁰

Kewate pejrandin be pênasay Honneth zor girînge, wek ewe nîye mirov nawdar û nasiraw bêt, ke dekatewe ewey kesanêkî zor miroveke binasinewe çunke le mêdyada tûşî hatûn. Pejrandin wate mirov hest bikat le çewey taybetmendîy xoyda le layen kesanî dewrûberewe be kesêkî bayexdar û sûdbexş seyr dekirêt. Wêray eweş, lewaneye xwastî gerimî cewanî emro bo nawdaretî hevberendîyekî hebêt be boçûnî Honneth derbarey pêwîstîy qûlî mirov bo pejrandin.

Le civakî berhemberî¹⁴¹ wek emey ême nasnamey mirov be kirînî kelûpel dête derbirîn, hogirî û xonasîn be şewazî poşak, kalay nêwmal, şewazî pirçbirîn û arayiş nîşane dekirêt nek wek zûtir xêl, dîn û nerêt nîşane bin. Lewaneye alozîy le guzeranî em rojgareda hokar bêt bo ewey ême dûy diyardey sakar, berhest û hasan cudakerwe bikewîn, bo nimûne poşak û telefon bo ewey taybetmendîy xoman pêşan bideyn, herweha bo xoşiman. Ewca kesanî dîkeş dên û pirsiyar deken ew poşak û telefoneman le kiwê kirîwe. Behendgirtinî dewrûber bo ew kalayey kirîwmane, lewaneye lay ême bibête mayey, Honneth gutenî, pejrandin.

Belam ew serincgîrîye berdewame leser layenî riwaletî, ême dexate ber metirsîy dorandinî naxî xoman. Rîkilam berdewam boman rûn dekatewe pêwîstîman be çîye û çon debîne mayey serinc û rêz. Serbarî eweş kalay bazar debestirêtewe be şewazêkî taybetî guzeranewe. Wate bersivî pirsiyargelî wek: ême kêyn, le çîy degerêyn yan le çî bêzarîn, pêş pirsiyarekan dekewin.

Arezû dehrûjênrêt ber lewey ême firya kewtbîn pêwîstîyekan darêjîn. Keçî ême dezanîn ke agahîy derbarey makî xoman, pêwîstîman, xwastîman, awatîman le dîdarî kesî dewrûberda serheldeden, hawkatîş peydozî dekeyn le naxî xomanda û hewil dedeyn dozewekaniman¹⁴² rageyenîn. Ewca piyadekirdinî ew endêşe û hestgele le dîdarî kesanî dîkeda, wata û bestên peyda dekat. Min bîr dekemewe, to bilêy geran be dûway nawdarîda parseng bêt bo ew gumiraye naxekîyey peyda debêt katêk hem kat û hem mewda berdewam weha kurtî dehênin, welam pêş pirsiyar dekewin? Ger zor kes bizanin min kê, îdî lewaneye pêwîstî nekat min xom zor bîr lew base bikemewe.

Aye toy xwêner çon bîrî lê dekeytewe? Aye boçûnekanî Honneth derbarey pêwîstîman be pejrandin çî hevberendîyekî heye be xwastî nawdarbûnî cewanan?

Mayey serince, ew boçûney Honneth, ke delêt pejrandin pêş helçinînî zanist û firajûtinî akar dekewêt, berawird bikeyn bew gorankarîyey rûydawe le dariştinî "planî fêrkarî" da derbarey norm, beha û zanist. Maweyeke, le destpêkî beşî "amanc û araste" da, çemikî "norm û beha" pêş "zanist" xirawin. Tenanet le *planî fêrkarîy "LPO 94"* -îşda akarnasî pêş zanist dêt û be boçûnî min rîzberendîyekî lebare.

Pêşmercêkî dêmokratane û hawjînîy aştewa birîtîye le behendgirtinî ne tenha pêwîstîy xo, belkû pêwîstîy beranberanîş. Jiyan bê bûnî behay wek rêz, berpirsayetî û hawsozî, sernagirêt. Ewane

¹⁴⁰ Pejreniraw: lêselimêniraw, recognized.

¹⁴¹ Berhemberayetî: consumerism.

¹⁴² Dozewe: ewey dozirawetewe, birwane Celîzade, "Zarawesazîy pêwane".

bineman bo hawbendîy civakîy nêwan mirovgel û emro le raburdû girîngtirin çunke emro zanistî teknîkî hawçerx detwanêt kîşweran wêran bikat.

Helbet mebest ewe nîye zanist nagirînge, na, belam akarnasî le pêştire. Swêd le salî 1962 ewe planî fêrkarî heye be biryarnamey giştîyewe - zûtir pêyan degutira planî wanegutinewe - belam rênamey taybet be akarnasîy pîşe bo mamostayan heta 2010 paş kewt.

Merce hestî sûkayetî her car rewê bêt?

Giştiman dîdarî wehaman dîwe mirov tîyda wişekanî be terazûy zêrenger dekêşet neka beranber hest be rûşan, sûkayetî yan bêdadî bikat. Mirov heye, tenanet ger beranber boçûnî cudawaz derbibirêt, em hest dekat sûkayetî pê kirawe. Eme çon şî bikeynewe? Min yek dû lêkdanewem derbarey heye.

Lêkdanewey yekem girêdirawî perîneweye le ferhengî giwêrayelîyewe bo ferhengî berpirsayetî. Le ferhengî giwêrayelîda zarok weha perwerde dekirên serfirûy deselat bin. Bedegmen nebêt berhelstî bêşûde. Ferhengî berpirsayetî core perwerdeyek repêş dexat dûre le sizay leşekî û rêz degirêt le hest, boçûn û endêşey mindal. Zarokîş mafi heye hest bikat, bîr bikatewe û boçûnî hebêt. Helbet eme nakatewe ewey boyan heye be arezûy xoyan bilên û biken.

Le civakî êmeda piştîwanî le berpirsayetîy takekes dekirêt û peyvî “jêrferman” (berdest) zengêkî nacorî heye. Lem zemaneda mirov, çî gewresal bêt û çî zarok, boy heye be corêkî tewaw ciyawaz le zûtir, berhelstî bikat le diyardeyekî pêy waye bêdadîye.

Kewate le jîngey pitir singfirewanda mirov boy heye deng helbirêt û skala bikat. Zûtir kem kes deywêra. Êsta way lê hatûwe zor kes skala pêşkeş deken derbarey sûkayetî û helwêstî bêdadîy weha ke zor kes pêyan waye zêderoyîye. Emeş nimûne:

Nimûne

Lîsa (Lisa) ferîkemamostay¹⁴³ astî amadeyîye. Le bernamey rahênanî mamosta (praktîk le fêrge) - da aşkira debêt ke Lîsa bo em kare dest nadat. Ne taybetmendîy rêberî heye, ne hawsozî ne twanay peydakirdinî mitmane lay fêrxwazan. Lîsa ne detwanêt le katî xoyda amade bêt, ne le tîmî karda hel dekat. Le bernamey harîkarî letek ew fêrgeyey debêt Lîsa praktîkî lê bikat, berpirsanî bernameke Lîsa le rahênaneke dernaçênin. Lîsa hest be sûkayetîyekî qûl dekat û skalay helawêrdin û sûkayetî leser mamostake tomar dekat.

Kem kes heye pêy wa bêt Lîsa le nimûnekey serweda sûkayetîy pêkirawe. Bigire ew derneçûwandine boy heye rêge le sûkayetîy dûwaroj bigirêt, hem beranber xoy û hem beranber fêrxwaz û dayikûbabî tûşî dehatin le pîşey mamostayetîda ger derçûba.

Be dîdî min ew grûpe kemijimarey skalay weha nalebar le buwarî fêrkarîda tomar deken û ewaney her le radebeder zû hestyan derûşet le rastîda kesanêkin le naxda sûkayetîyan pê kirawe. Ewane salanî sal ew pejrandin û pêşwazîye dirusteyan nedîwe ke pêwîstin bo sazîrdinî xo-hevbendîy geş. Emîş le rê xoyewe weha kirdûwe hestyarîy em kesane beranber her helwêstêkî kesanî beranber bonî

¹⁴³ Ferîkemamosta: fêrxwazî riştey mamostayetî le zanko.

rexney lê bê. Take basî girîng le lay em kesane koşîne bo mafdanewe¹⁴⁴ bo şitêkî lewaneye zamanêkî zûtir rûy dabêt. Be kirdeweş encamekey degat bewey em kesane belayanewe sext debêt sûkayetî diyarî biken û lewaneyişe xoyan bikewine sûkayetîkirdin be kesanî dîke.

Zanyaristanî¹⁴⁵ swêdî delêt sûkayetîkirdin helwêstêke dij be “yasay mîlletan”¹⁴⁶ û “ger be belge selimêndira ewa mafdanewe hel degirêt”. Destewajey “ger be belge selimêndira” wata debêt layenêkî dadnas biryar bidat aye ew helwêste sûkayetîye yan na. Min em rûkare lay Honneth nabînim û naşzanim ger pêy weha bûbêt kesêk hest be sûkayetî bikat herdem dekatewe ewey sûkayetî pê kirawe, yan na.

Gîşt kesêk mafî heye boçûnî xoy hebêt û “Lîsa”-ş mafî xoyetî pêy weha bê sûkayetî pê kirawe û kesîş boy nîye guman bixate ser ew hestey belam, be dîdî min, boy nîye daway mafdanewe bikat, wate dawa bikat encamî peycorîyeke le basekey ew bilêt Lîsa berastî tûşî helawêrdin û sûkayetî kirawe. Ewe erikî mamostaye fêrxwaz derneçênêt ger mercekanî bernameke pir nekatewe.

“Helsengandinî şayan”¹⁴⁷ ber le wergirtinî karmend bo pîşeyek daway helkirdin bikat letek kesanî dîke, derfetêke bo dîtinî ew kesaney bergey mirov û dîdî ciyawaz nagirin, natwanin helwêstî sûkayetî le hî dîke cuda bikenewe. Ger ew “helsengandinî şayan”-e hebêt, beşêkî zorî nehameyî hem bo xwazyarî xwêndinî rişteke û hem bo fêrxwaz, peyda nabêt.

Lêkdanewey dûhem bo ew diyardeyey ke emro kesanêk skalay nalebar derbarey helawêrdin, sûkayetî û bêdadî pêşkeş deken, lewaneye kemtwanîy bê le çareserkirdinî derhawîştay rik. Swêdî nasirawin bewey xoparêzin le nakokî û pêşandinî rik. Ewe xltey ferhengî giwêrayelîye weha dekat tûrebûnî zarok bedegmen biselimênrêt û gewreş ger tûrebûnî xoy be aşkira derbibirêt şermezariy bo bimênêtewe. Metirsîy şermezarbûn mirov naçar dekat hestî tûreyî xoy xefe bikat. Belam çunke ferhengî berpirsayetî hawkat mirov han dedat hem hestî xoy pêşan bidat û hem dawaş bikat rêz le bîrûray bigîrêt, miroveke dekwête kêşewe. A lêredaye sûkayetî debête cêgirî rikî aşkira. Emeş nimûneyek:

Fêrxwazêk hest dekat tûreye lewey le twanadozîyekda derneçûwe. Ewca leber ewey rik nêzîke tabûwe¹⁴⁸ û rêy derbirînî nîye ewa hesteke le naxîda degordirêt be hestî sûkayetî. Hest be sûkayetî tabû nîye. Fêrxwaz skalay sûkayetî Leser mamostakey tomar dekat û bew core kêşey “sûkayetî / rik” - cê dehêlêt bo karî peycorî (ke her debêt encam bidirêt) û le kol xoy dekatewe. Fêrxwaz çawerêye peycorîy bîselimênêt sûkayetîy pê kirawe û xoy le tûrebûneke derbaz bikat.

Ew mamostayey skalay araste kirawe, hest dekat wek mamosta bêrêzîy pê kirawe û leber ewe tûre debêt. Emîş lay dijware rikî xoy pêşan bidat û deşzanêt karêkî zorî le pêşe bo welamdanewey pirsiyarekanî babay peycor û bemeş ewendî dîke tûretir debêt. Carî dahatû, doxêkî weha bête pêş û mamosta bizanêt fêrxwazekey derneçûn naselimênêt, dûr nîye derîçênêt.

Lewaneye le ferhengî swêdîda weha guncawtir bê mirov erikî dakokî le mafî xoy cêbihêlêt bo kesêkî dîke encamî bidat, nek xoy. Hestderbirîn hen, wek derbirînî tûreyî û şermezariy, dekirêt şêwe bigorin be derbirînî dîkey pitir lebar, belam ew gorîne weha dekat dewrûber serderî le sîgnalekan neken. Lewaneye dewrûber rikeke bibînêt belam ziyatir wek bêzarîyekî narûnî têbigat le layen ew kesey

¹⁴⁴ Mafdanewe: restitution.

¹⁴⁵ Zanyaristan: ensîklopîdy, encyclopedia.

¹⁴⁶ Yasay mîlletan: *jus gentium*, beşêke le “*yasay nêwdewletî*” *international law* -y sazimanî “Netewe Yekgirtûwekan” United Nations (UN) selimandûyetî, mebest lêy rêkxistinî dade le nêwan dewletanda.

¹⁴⁷ Helsengandinî şayan: admission assessment.

¹⁴⁸ Tabû: taboo diyardeyek be yasax, şerimhên dabinrêt.

sûkayetî pêkirawe. Leber ewe pêwî waye ême debêt derfetî baştir bideyene derbirînî tûreyî û rik, nek şermezaryan bikeyn.

Ewey bitwanêt be derbirînî rûxsar, zimanî ceste û tûnî deng tûreyî xoy aşkira bikat û herweha twanay belgekarî hebêt bo dozî xoy, pêwîstî nabêt ne be hestî sûkayetî û ne bewey kesêkî dîke dakokiy lê bikat. Kesî weha detwanêt wêray tûrebûnîş xoy be mirovêkî baş bizanêt. Cige leweş, mirov be pêşandanî hestî xoy derfet dedate dewrûber le hokarî tûrebûnekey bigen û paşan biryarî lê werbigirin, ca çi selimandin û piştîwanî bêt, çi retkirdinewe bêt be belgey lebar.

Ewca depirsim aye toy xwêner çi dîdêkit heye beranber helwêstî sûkayetîy le fêrge û fêrkarîda? Sûkayetî çîye û çonî çare bikeyn?

Hevbendîy akarnasane le polda

Le polda çon reftar letek yekdî bikeyn? Axel Honneth be bîrokey “*sengî pejrandin*” geşey be “*bîrdozey rexnekar*” da û sirûşî le bîrokey “*akarnasîy berpirsayetî*” -y feylesûfî lîtwanî - firansî Emmanuel Levinas (1906-1995) wergirtûwe ke beşêk le şaçemikekanî birîtîn le “*rûxsar*”, “*ewey dîke*” û “*heman*”.¹⁴⁹

Levinas¹⁵⁰ delêt le dîdarî nêwan “*ez*” û “*ewey dîke*” - ewey cudaye le min û hergîz natwanim be tewawî serûberî bikem, pey pê berim - hevbendîy akarnasane hemîşe amadeye. Leber ewe gişt dîdarêkî bo nimûne le nêwan mamosta û fêrxwazda berşkeste, bigire metirsîdare, çunke metirsî heye “*ewey dîke*”, mamosta bêt yan fêrxwaz - le “*ewey dîkebûn*”, le “*dîkeyî*” *otherness* -î xoyda rêzî lê negîrêt, belkû sinûrdar bikirêt bo “*heman*”, bo ewey wek mine.

Lay mamosta, fêrxwaz debête “*ewey dîke*” û lay fêrxwaz, mamosta “*ewey dîke*” -ye. Ême detwanîn le zanyar wird bînewe, têhelkêşî bikeyn, bîtwênînewe û bîkeyne hî xoman. Ême detwanîn le “*ewey dîke*” wird bînewe, belam hergîz natwanîn têhelkêşî bikeyn, bîtwênînewe û bîkeyne hî xoman. Ême detwanîn pêşwazî le “*ewey dîke*” bikeyn, çêj le hawdemîy wî werbigirîn, wêkira nawerok û firajûtin dirust bikeyn, belam natwanîn “*ewey dîke*” serûber bikeyn,¹⁵¹ wek ewey şitumek serûber dekeyn.

Be boçûnî Levinas hemû dîdarêk letek kesêkî dîkeda rehendêkî akarnasaney heye. Le hevbendîy “*ewey dîke*”-daye ke “*ez*” eke dirust debêt û le dîdarî “*rûxsarî ewey dîke*”-daye berpirsayetîy min beranber ewey dîke xuya debêt.

Anders Holmgren salî 2006 le zankoy Umeå zanistnameyekî pêşkeş kird be naw: “*Klassrummets relationsetik*” - “*Akarnasîy hevbendîy nêw pol*”. Lem zanistnameyeda Holmgren le riwangeyekî akarnasîyewe rîşedozi le axaftinî rojaney nêwan mamosta û fêrxwaz dekat. Tojer le çawdêrîy xoyewe, le tomarî vîdyoy doxgelî nêw pol û herweha le dîdarî mamostayanewe peycorî le rûdawî nêw dîdarî mamosta û fêrxwaz dekat. Holmgren akarnasîy Levinas bekar dehênêt wek riwangeyekî lêkdanewe

¹⁴⁹ Em sê çemike û beranberyan be îngilîzî:

- Rûxsar: the face (the face-to-face relation)
- Ewey dike: the other (constitutive other)
- Heman: the same (identity)

¹⁵⁰ Levinas şirovekarîy feylesûfaney heye derbarey akarnasî û delêt ferhengî rojawa begîştî selimandinî “*ewey dîke*” -y wek kes û diyardey dîkey belawe diware û herdem nyazî weha bûwe “*ewey dîke*” biçûk bikatewe bo “*heman*”, bîkatewe be “*ez*”. Le hevbendîy “*rû-be-rû*” -y “*ez*” letek “*ewey dîke*” da pêwîste akar hebêt bo ewey “*ez*” bête ser selimandinî “*ewey dîke*” le “*dîkeyî xoyda*”.

¹⁵¹ Serûberkirdin: bawêş pêdagirtin, comprise.

bo peybirdin be guzeranî fêrkarî û derencamekey bo ser dîdî ême bo zanyar û têgeyîştiniman le dakewt.

Holmgren le zanistnamekeyda pêşanî dedat hevbendîy mamosta - fêrxwaz çend girînge bo fêrbûn û perwerde. Hevbendîy fêrkarîy hevbendîyekî berşkeste û gîrodey lêbîstine, mitmaneye, berpirsayetîye, derbirînî rûxsar û nîgaye. Fêrkarî proseyekî nêwberyane, bo ewey fêrbûn bûnî hebêt debêt dîdarêk pêk bêt le nêwan herdû layenda, layenî fêrkar û layenî fêrxwaz. Mamosta tenha “ştêk” nalêtewe, belkû bo “kesêk”-îşî delêtewe.

Le zanistnamekeda, Holmgren bo rûnkirdinewey riwangey akarnasî, çend şaçemikêkî Levinas wek tewinêk beser rageyandinî nêw polda ra dexat.

Kewate dîdarî nêwan “ez” û “ewey dîke” debête zange (cêy ledayikbûn) bo sobjey¹⁵² akarekî. Belam ew zane rû nadat eger “ez” cuda nekirêtewe le “ewey dîke”, çunke “ewey dîke”, “heman” nîye. Lay Levinas ew cudakirdineweyey “ez” û “ewey dîke” zor ayetîye. Pejrandinî mirov ke xoy bêt cuda le “ewey dîke” nakatewe “nêrgizayetî” narcissism, wate şeydabûnî xo le wêney awêney xoda û bibête “heman”, belkû debête mîwandostî û pêşwazîş le “ewey dîke” dekat.

(lapere 37).

Holmgren giwê le tomarî polêkî peşokaw degirêt, mamosta têyda lenakaw dekwête go û serincî gişt poleke radekîşêt. Mamosta bas le hestî xoy dekat wek mamostayek lem pol û kateda. Bas le xoy û hevbendîy xoy dekat letek fêrxwazanda. Mamosta bê ewey nawî kes bihênêt rûnî dekatewe ke xefetbar û dilşkawe le reftarî dûwênêy çend fêrxwazêkî xerîkî destşkanewe bûn û paşan be pêşnyazî yek le fêrxwazan gişt poleke hestan û royiştin ber lewey waneke tewaw bûbêt. Pêyan delêt fêrxwaz mafî nîye biryarî weha der bikat. Mamosta pitir wek mirov dête go û delêt sereta, katêk polî heftemim wergirt tirsim hebû le fêrxwazan û doxî nêw pol zor car weha bûwe min tirsawim netwanim xom bim. Bem gutare kesekî û vekirîye, keşî poleke hate gorîn. Poleke arambowe, fêrxwazan giwêradêr man û paş kemêk ewanîş kewtine ser baskirdinî boçûnî xoyan derbarey poleke. Axaftinêkî geldest dademezîrêt. Holmgren denûsêt:

Katêk mamosta dûdilî û berşkestîy xoy xuya dekat şitêk le polekeda rû dedat dekirêt be sinûrbirîn dabinrêt: mamosta lenakaw niwênerî sîstem û sazimanêk nîye, kesayetîyekî dîkeye. Mamosta wek mirov le norey pêşeweraney xoyda dête pêş û beweş derfet lay fêrxwazan saz dekat bo hest û hawsozîy bo mamosta.

(lapere 82).

Guzeran le hevbendîda dekatewe derfetî çêj wergirtin, fêrbûn, afirandin û firajûtin. Belam, be dîdî Levinas rîskîşî heye. Ewey bûwêrêt aşkira bête go û berşkestîy xoy xuya bikat xoy dexate metirsîyewe. Leweye wek “ewey dîke” pêşwazîy lê nekirêt, lêy nebîstîrêt û rêzî negîrêt. Bo ew kesey hevbendîy heye letekîda nebête “ewey dîke”, belkû biçûk bikirêtewe bo “heman”, bikirête kelûpelêkî dewrûber. Mamostakey serewe, bewey xoy bo fêrxwazanî pol awale dekat û hestî xoy rûn dekatewe derbarey pêkewebûnyan, mil le rîskêkî aşkira dedat. Hawkat rêk lew vekirîyedaye dîdarî akarekî çiro dekat.

¹⁵² Sobje: xo, zat, *subject*.

Katêk min Honneth û Levinas dexwênimewe bîrim derwat bo ew samaney le boçûnekanyanda heye, lew derfetaney sazî deken bo raman le rûdawekanî nêw fêrgey Swêd û le dîdarî mamosta û fêrxwazda. Belam weha pê deçêt siyasetî fêrkarîy fermanrewa, le rojgarî em nûsyareda, arastey pitir berew cexitkirdine leser twanay zanistî babet. Herçî hevbendîy mamosta - fêrxwaz heye biçûk dekirêtewe bo firewandinî deselatî mamosta pena berête ber çareserî cilewgîrane dij be fêrxwazî lasar - wate geranewe bo pergalî ferhengî giwêrayelî.

Belam tojînewey buwarekanî fêrkarî meylêkî dîkey heye. Her bo nimûne birwane antolojî¹⁵³ “karî mamosta - bîrdanewey tojeranî fêrkarî le riwangey hemecorewe”¹⁵⁴ berhemî “fermangey fêrkarî”, salî 2006. Lay zorbe ew çîwarde tojerî fêrkarîyey beşdar lew kitêbeda, karî mamosta le “riwangey akarekî” -yewe, şadoze.

Zanistnamekey Arja Paulin, ke zûtir basî hat, pêşanî dedat ewey debête kosp bo fêrbûnî fêrxwaz, lawazîy mamosta nîye le zanistî babetda belkû ew dijwarîyeye ke peyda debêt le dîdarî mamosta, fêrxwaz û dayikûbabda. Le çendîn tojînewey em rojgareda rîşedozi dekirêt derbarey makî ew mercaney hen leser norey tazey mamosta û derbarey şêwazî helwêstî niwêy mamosta, çî derencamêkiyan bo karî nêw pol debêt.

Firajûtin le ferhengî giwêrayelîyewe bo ferhengî berpirsayetî, gorankarîy gereke le twanay mamostayetîda. Ferîkemamosta berdewam daway zanistî niwê deken derbarey çareserkirdinî nakokî û derbarey helwêst beranber fêrxwazî xemsard û lasar. Em dawakarîyane amajeye bo cêhêştinî ew şêwaze reftarey le ferhengî giwêrayelîda pesend bû, belam mamosta hêşta her dûdîln le çonetîy dîdarî mamosta - fêrxwaz le ferhengî berpirsayetîda.

Ger le cîhanî emroda çawêk be dewrûberda bixşênîn, lêman roşin debêt kemasîy leweda nîye ke ême begîştî nawiman nawe zanistî babet. Kemasî heye le twanay girtine estoy berpirsayetî û le jiyânî geldestî dûr le tundûtîjî.

¹⁵³ Antolojî: gulçin, anthology.

¹⁵⁴ *Lärares arbete - pedagogikforskare reflekterar utifrån olika perspektiv. En antologi från en konferens anordnad av myndigheten för skolutveckling* (2006).

Çapterî şeşem: Çiye ewey mamosta dekate mamostay baş?

Sengî mamosta

Demhewêt le destpêkî em çaptereda dîsan pirsiyarêkî wek ewey pêşû arastey xwêner bikem: şêwazî fêrkarîy mamosta û corî helsûkewtî çi karîgerîyekî heye Leser fêrbûnî fêrxwaz? Giştiman le serdemî fêrxwazetîmanewe gencîneyek ezimûniman peyda kirdûwe letek mamostay baş û xirap. Pêman xoşe yadî ew mamostayane bikeynewe ke twana bûn le serincrakêşan û handanî êmey fêrxwazda, ewaney yarmetîyan dedayn le kospan derbazbîn, ewaney fêryan dekirdîn behay pergal (rêkûpêkî) derik bikeyn. Laşiman sexte yadî ew mamostayane feramoş bikeyn ke debûne mayey bêzarîman û xamoşîman, lasarî û nesrewtîman. Mamostayekî firensîm hebû le amadeyî le katî wanekeda xew deybirdewe û helbet, bo minêkî pêştirîş xulyay zimanfêrbûnim sard bû, nedebûwe hander. Mamostayekî dîkem hebû be corêk xulyamî bo mêjûnasî wirûjand, xom bûme mamostay mêjû.

Sigmund Freud (1856-1939) deygut sê pîşe hen hem zor girîng hem twanabeder. Hersêkiyan be pîtî “P” -î dest pêdeken:¹⁵⁵ “*Politician*” (siyasetmedar), erikiyan eweye civak biçerxêt. “*Pedagogue*” (fêrkar), bê ewan hiç civakêk naçerxêt. “*Psychoanalyst*” (derûnşîkar)¹⁵⁶ - pîşekey Freud xoy - erikiyan eweye yarmerîy mirov biden agadar bêt le diyardey agabeder bo ewey guzeranî xoy baştir bikat.

Lewaneyîşe zorbeman pîşey mamostayetî be twanabeder nezanêt, belam berastî sexte! Min pirsiyarim le zor fêrxwaz kirdûwe: mamostay baş debêt çon bêt û bersivî zorbeyan taradeyek nêzîke: mamostay baş debêt, hem le dabînkirdinî pergalî nêw pol û hem le fêrkirdinda, twana bêt. Pêman waye mebestîşan eweye mamostay zîrek detwanêt pergalêkî weha dabînkirdinî bikat hem dinedanî têdaye hem aramîy xwêndin. Mamostay zîrek twanay heye hem pîşewer bêt û hem kesekî û beweş detwanêt hevbendîy geş le polekeda saz bikat. Mamostay zîrek le babetekey xoyda zanaye.

Deysa pirsiyar eweye em mamostaye çon peyda debêt û kameye em mamostaye? Aye behreyekî zigmake yan fêrzadeye (be fêrbûn peyda debêt)? Helbet astêkî baş le zanistî babetda pêşmercî binaxeye bo serleberî xwêndin, belam mercekanî dîke çîn bo ewî mirov bibête mamostay baş. Aye “*kîmyay kesekî*”-ye?¹⁵⁷ “*kîmyay kesekî*” derbirînêkî temawîye mirov katêk penay bo debat ke nazanêt hokar çîye yan wişey nîye bo diyardey helkirdin legel kesêk û nekirdin legel kesêkî dîke.

Salî 2006 “fermangey fêrkarî”-y Swêd raportêkî pexişan kird be naw “*Derfet û arezû - derbarey seng, doxî kar û helûmercî mamosta*”.¹⁵⁸ Lew raporteda helsengandine mîllîyekey salî 2003 bo fêrxwazanî polî nohem debête kerestey tojînewe. Kareke 1688 mamosta û 6788 fêrxwaz beser dekatewe û sereta peycorî dekat le karîgerîy mamosta Leser doxî fêrbûn û firajûtinî zanyar lay fêrxwaz. Paş ewe rîşedozi kirawe Leser ew hokaraney karîgerîyan heye Leser dox û helûmercî mamosta le erikekeyda. Mebestîş dozînewey hem taybetmendîy mamostay başe, hem ew hokaraney karîgerîyan heye Leser derfetî mamosta bo encamdanî karî baş. Amancîş eweye lew berhemewe mirov bibînêt kame gorankarî le astî ciyawazda pêwîstin bo dabînkirdinî “*mafi gişt fêrxwazêk bo zanyar û bo firajûtinî kesekî*”. (lapere 9).

Sê pirsiyar arastey fêrxwazekan dekirêt:

¹⁵⁵ Mebest nawî pîşekane be zimanî almanî.

¹⁵⁶ Derûnşîkar: psychoanalyst (saykolenelîst).

¹⁵⁷ Kîmyay kesekî: derbirînêkî gelîre be swêdî mebest lêy hokarekanî guncan û neguncanî mirove letek yekdî.

¹⁵⁸ *Lusten och möjligheten - om lärarens betydelse, arbetssituation och förutsättningar*. Skolverket 2006.

1. Aye mamostaket baş wane delêtewe?
2. Ger toy fêrxwaz basêk tenegeyt, aye mamostaket başe le rûnkirdineweda?
3. Aye mamostaket le nîmiredananda dadperwere?

Le welamekanewe pênc hokar xuya debin ke hawbendîyan heye letek baskirdinî fêrxwazan le mamostay baş (lapere 13 û bewlawe). Hokarekan emanen:

1. Astî xwêndinî mamosta: mamostayek hem hunerî mamostayetî xwêndbêt û hem ew babetey mamostayetî têda dekat, begîştî lay fêrxwazan be mamostay baş dadenrêt. Belam le helsegandinî fêrxwazî kizberhemda, astî xwêndinî mamosta karîgerîy nîye.
2. Helsegandinî mamosta bo xotwan. Mamostayek pêy wa bêt xotwanî le dîdaktîk¹⁵⁹ -da berze, begîştî le layen fêrxwazîşewe be mamostay baş dadenrêt. Kewate xonorîy pîşeyî mamosta karîgerîy mezinî heye Leser ewey fêrxwaz be mamostay başî dezanêt yan na.
3. Mamosta çêj le fêrkirdin debînêt. Fêrxwaz begîştî pêyan waye mamostayek çêj le fêrkirdin bibînêt, mamostay başe.
4. Mamostay jin û mamostay piyaw. Kuran mamostay piyawyan pê baştîre.
5. Cewan û temendar. Kiçan mamostay cewanyan pê baştîre.

Encamgîrîyekî le raporteke destgîr bêt eweye mamostay baş xawen dû taybetmendî. Yekemyan mitmaneye be xotwan. Mamosta heta xotwanî beriz pêşan bidat, fêrxwazanîş be mamostay baştîrî dadenê. Lew tojîneweyeda 31% -î mamostayan pêyan wa bû xawen “twanay zor başin” û 58% -yan “taradeyek başin”. 10% pêyan wa bû twanayan “taradeyek nizime” û 1% “zor nizime”.

Taybetmendîy dûhem ke tawî zore, arezûy fêrkirdine. Ew mamostayey pêşanî dedat çêj le fêrkirdin degirêt, lay fêrxwazan be mamostay baş denasirêt. Em mamostaye çêj le hawdengîy fêrxwazan werdegirêt û jîngey polî pê xoşe. Fêrxwazanî em mamostaye delên mamostakeman twanay berzî heye bo rakêşanî xulya û serincî fêrxwazan. Le welamî pirsîyarêkda ke delêt: “boçûnit beranber fêrkariy babeteke çone?” 56% -î mamostayan delên “zor xoşe”, 41% delêt “taradeyek xoşe”, 3% delêt “taradeyek naxoşe” û kes neygute “zor naxoşe”.

Seyr lewedaye astî xwêndinî mamosta lay fêrxwazî kizberhem sengî nîye belam arezûy fêrkariy sengî heye. Kewate xulyay fêrkirdin lay gişt fêrxwazan bayexî berze, belam astî xwêndinî mamosta û twanay le zanistî babetda tenha lay fêrxwazî xawen berhemî maminawend û beriz, bayexî berze le helsegandinîyan bo başîy mamosta.

Be boçûnî min, ger fêrxwazî kizberhem ew xemsardane bin le raportî “handan - hevbendî” (2003) basyan hatûwe, - birwane çapterî çiwarem - ke delêt ger hevbendîy mamosta û fêrxwaz baş nebêt, ewa fêrxwazanî kemtir peroşî xwêndin çî arezûyekîyan bo xwêndinî babeteke namênêt û xemsard demênin, ewa têgeyiştin lem xaley fêrxwazî kizberheme hasantir debêt. Twanay civakî û sozekîy mamosta (bo nimûne twanay giwêgirtin, twanay derikkirdinî peyamî sozekî) le raporteke da be hokarêkî serkewtin dananrêt. Belam zanistnamekey Arja Paulin, ke zûtir le çapterî çiwarem da basî hat, pêşanî dedat ke be piley yekem kemasîy twanay civakîye lay zor mamosta debête kosp, betaybetî salanî yekemî mamostayetîyan.

Xalêkî dîke serincrakêş ew ciyawazîye berîneye ke raporteke pêşanî dedat le nêwan dîdî mamosta û dîdî fêrxwaz bo doxî pol. 70% -î mamostayan doxî pol le hemû waneyekda be xoş û geş dezanin, keçî

¹⁵⁹ Dîdaktîk: zanistî hokarekanî karîger Leser fêrkariy û nêwerokî fêrkariy, *didactic method*.

tenha 37% -î fêrxwazan heman boçûn radegeyenin. Take lêkdanewey min be xeyalimda bêt bo em ciyawazîye birîtîye lewey şadimanîy pol erikî mamostaye û leber ewe mamostayan le welamdaneweda hewilyan dawê doxeke arayîş biken, herçî fêrxwaze welamekey rengdanewey hestî resenî xoyetî.

Lewaneye heman lêkdanewe ew encameş bigirêtewe ke delêt nîwey mamostayan carûbar yan le gişt waneyekda hest be peşewî yan dengedeng deken, keçî 66% -î fêrxwazan hawran.

Raportekê pêşanî dedat ke zor le mamostayanî polî nohem mitmaney firewanyan be xotwan heye. Hawkat sêyekî mamostayan pêyan waye twanakanyan bir nakat ne bo bînîn û piştîwanîy fêrxwazî griftdar (xawen pêdawîstîy taybet), ne bo karkirdin letek fêrxwazî xawen paşxanî ferhengî û civakîy corawcor. Mamostayan lew raporteda eweş rûn dekenewe ke derfetî firajûtîni twanayan lem pênc saley raburdûda, tesk kirawetewe, keçî hem bargiranî û hem berpîrsayetî firewantir bûwe. Nûseranî raporteke denûsin:

Ewe karêkî berhemhên nîye cexit Leser sengî mamosta bikirêt bê ewey pêşmercekanî çerxandinî erikekey bixirêne berbas. Peycorî heye pêşanî dedat helûmercî mamosta bo çerxandinî erikî xoy kemasîy heye, hem le pêşmercî binaxeyîda bo karûbarî fêrkarî û hem le helûmercî mamosta xoyda. "Fermangey fêrkarî", "dezgey dirustpîrsî"¹⁶⁰ û sazîmangeli sendîkay mamostayan, selîmandûyane ke zor le mamostayan ew xwêndîney nîye ke pêwîste bo fêrkarî.

(lapere 8).

Ta êre raportî "derfet û arezû" (2006), ke debête hokar bo giftûgoy firebare derbarey ewey çî bikeyn bo pêşxistinî fêrge. Ewey min lêreda wîrdtir basî lê nakem belam rîşedoziyan dîsan girînge eweye kuran mamostay piyawyan pê baştire û kiçan mamostay cewan.

Mamosta û dû ferheng

Heye depîrsêt aye mamostayetî le raburdûda hasantir nebû? Erê, min pêwî waye, hasantir bû. Mamostayetî le ferhengî giwêrayelîda cudaye le mamostayetîy nêw ferhengî berpîrsayetî. Salarî le ferhengî berpîrsayetîda şayestebûne, le ferhengî giwêrayelîda pêgey kar deybeşxêt. Ferhengî berpîrsayetî pitir bizoze,¹⁶¹ ferhengî giwêrayelî mende. ferhengî berpîrsayetî mercî sextitir dadenêt Leser twanay mirov bo bîrdanewe, Leser dozînewey derfetî helbijardinî kesekî, Leser biryardanî jîrane le dozî corawcorda.

Kewate fêrge le ferhengî berpîrsayetîda debêt hewil bidat derfet bo sê cor zanyar birexsênêt. "Zanyarî ramankar"¹⁶² ew core zanyareye mirov serbexo peydozyan lê dekat û belgeyan Leser

¹⁶⁰ Dezgey dirustpîrsî: "riksrevisiõne", dezgeyekî dewletîye le Swêd bo peycorî le dirustî û nadirustîy karûbarî fermange, bînge û dezgey dewletî.

¹⁶¹ Bizoz: *dynamic*, daynemik, dînamîk, pêçewamey "*mend*" bo *static*.

¹⁶² Zanyarî ramankar: reflective knowledge, ew zanyarey be raman û be ezimûn peyda dekirêt. Encamî hem bîrdoze û hem kare.

dehênîte. “Zanyarî salarekî”,¹⁶³ bawtirîn corî zanyare, eweye ke bê rexnekarî le serçaweyekî salarewe, bo nimûne mamosta yan kitêb, werdegîrê. Emro înternê zanyarêkî berfirewan pêşkes dekat û leber ewe “mêtazanyar”¹⁶⁴ zor girînge, ke dekatewe twanay rûnkirdinewey serçawey ew zanyarey heye, çon û be kam rêbaz peyda kirawe û... htd. Mamosta le ferhengî berpîrsayetîda debêt ew sê corey zanyar pêşkes be fêrxwaz bikat û ciyawazîşyan rûn bikatewe.

Emro le Swêd jimarey ew kesaney dukturaname pêşkes deken zêdetirin lewaney le ferhengî giwêraleya, şêst sal ber le êsta, astî amadeyîyan tewaw dekird. Ew deme kem kes degeyişte astî amadeyî. Emro nêzîkey hemwan ew pileye derbaz deken. Debêt em diyardeye çi tawêkî hebêt leser mercekanî wergirtin le pîşey mamostayetîda? Ewca gişt gorankariyekanî em deyan sale çi karîgerîyan heye leser derfetî mamosta bo encamdanî karî baş? Le raportekey sereweda hatûwe ke baziney dayikûbawanî xawen astî xwêndewarîy beriztir emro ziyadtire le rabirdû, leber ewe pitir rexnegir û mercedanerin beranber xwêndinî mindalekanyan le fêrge. Jimarey dayikûbabî rexnegir le ferhengî giwêrayelîda zor kemtir bû. Min dilnyam lewey guzeranî mamostayanî karay em rojgare zor diwartire lewey bawikim le fêrgey gustav adolf heybû le şarî Sundsvall. Kam mamosta detwanê emro katî pişûy firavîn be piyase biçête malê û jemêkî başî destî aşpez bixwat û paşan le dîwexaneke rakişet û çawgerim bikat ber lewe biçête bo waney paşinîwero?

Dîdarî berêweberêkî serkewtû

Le çapterî çiwaremnda nimûneyekî berceste heye derbarey mamosta ke be şewazî fêrkarîy xoy hem pergal û hem fêrbûnî afirandûwe. Nimûneyekî dîke Börje Ehrstrand -î berêweberî fêrgey Rinkeby û xawen çendîn xelate. Rojêkî xoretawî mangî jûnî, rêk dûway tewawbûnî terimînî xwêndin, le jûrî karekey xoy dîdarman bû. Pirsiyarim lê kird boçûnî çîye derbarey sengî mamosta le karûbarî fêrgeya? Gutî: binaxey çerxandinî pîşey mamostayetî, ew erikey be mil gişt mamostayekewe le karûbarî rojaney legel fêrxwaz, birîtiye lew jîngeyey mamostake le mindaliyewe têyda gewre bûwe, birîtiye le dayikûbab, le xwêndinî riştey mamostayetîyekey û le ezimûnî jiyanî xoy. Emane berdî binaxen û karîgerîyan zore leser ewey mamosta le fêrkarîda çon kêşey pêşhat debînê û çon wêkira letek fêrxwazanda çareseryan dekat. Xoy katêk bûwe mamosta hestî dekird sûdêkî zorî le xwêndinî mamostayetî bînîwe - le welatî Fînland xwênduyetî - belam zor babetîş hebûn carûbar nedeçerxan. Ew “planî wane” yey xwêndbûy tenha eger fêrxwazan be biryarekanî em helsûranaye, cêbecê debû. Belam fêrxwaz hebûn planekeyan pesend nedekird û emîş deba nermekar bêt û bûwêrî be corêkî niwê bîr bikatewe.

Naçarbûm giwêradêrim bo ew dakewtey deba waney têda bilêmwewe û pey berim bewey fêrxwazekan pêwîstîy dîkeyan heye cuda lewey min bîrim lê kirdibowe. Her bo nimûne polêkim hebû kurekan têyda xeyalyan ziyatir lay fûtbol bû nek lay fêrbûnî xwêndinewe, nûsîn û jimardin. Minîş, bo ewey le polda helsûrêyn bûme rahênerî fûtbolênyan. Min naçarbûm le astî xoyanda biçime dîdaryan. Axir fûtbol norm û rêsay xoy heye, fûtbol gemeyekî tewaw rêsabende. Ew rêsagelem hênaye nêw polewe û beweş fêrxwazekan têgeyiştin le polîşda debêt le katî xoyda amade bin û karî xoyan cêbecê biken. Herweha çon le gorepanda dawer heye bo dabînkirdinî rêsa, le polîşda mamostayîş heye bo dabînkirdinî rêsay pol.

¹⁶³ Zanyarî salarekî: authoritative knowledge, ew zanyarey le serçawey payedarewe - bo nimûne mamosta û kitêb - werdegîrê.

¹⁶⁴ Mêtazanyar: metaknowledge. Zanyar derbarey zanyar.

Olle Österberg -î mamosta le çapterî çiwaremnda basêkî lew corey hebû:

Min demwîst be şitêk dest pêbikem yarîder bêt bo ewey yekbeyekî fêrxwazan hest bikat dinyay ew mayey serince. Şitêk pêşanî bidat ke min salarîy xom bekar dehênim bo afirandinî keşêkî kar û şewazêkî harîkarîy weha ke bibête yarîder bo ewey wurdewirde û le rêy mitmanewe fêrxwaz bitwanêt le hest û hoşî xoy nêzik bêtewe.

(Olle Österberg. *Samtal om livet i en klass*. 1998 lapere 8).

Diyarîkirdinî cîhanî fêrxwaz be serşarî kar, taybetmendîyeke le hunerî fêrkarîy zorbey mamosta başekanda heye. Belam karêke be dem xoşe û be kirdewe dijwar. Polêkî xawen sî fêrxwaz wate sî dakewtî ciyawaz, cige le dakewtî mamosta xoyişî. Deysa çi bikeyn başe? Emeye hem berokgîrî û hem hunerî fêrkarî! Ême detwanîn sirûş û handan le serkewtûwan werbigirîn. Detwanîn lêyan bigerêyn, bibîstîn û fêrbîn, lewe bewlawe mirov debêt şewazî taybetî pîşeweraney xoy bidozêtewe bo pêşwazî le fêrxwaz û dayikûbab. Giştiman berpîrsîn le çonetîy rewî kar, ne tenha mamosta, belam çend û çonî berpîrsayetî letek temen û ezimûnda dête gorîn.

Ehrstrand wek berêweberêkî niwê le fêrgey Rinkeby deybîst ke dayikûbab ewende peroşî harîkarîy nîn letek fêrgeda. Belam lay ew basêkî aşkiraye ke gişt dayikûbab peroşî mindalî xoyetî. Ewey beşêkî zorî dayikûbab kemptir mebestyane, danîştine le civînda bo giwêgirtin le rageyandinî giştî. Leber ewe Ehrstrand dayikûbab banghêşt dekat bo fêrge bo ewey bas le mindalekanî xoyan biken, ewanîş dên. Hemûyan na, belam zorbeyan. Ehrstrand delêt, ezimûn pêşanî dawê ger harîkarîy nêwan fêrge û xêzan baş bêt, zarokîş le fêrge baş debin.

Sereta zor le dayikûbab dûdil bûn beranber rahênanekey fûtbol belam ke lêyan rûn bowe amanc û mebest lew core fêrkarîye çîye, dûdilîy zorbeyan rewîyewe. Bo karî berbestin le alûdebûn heman bas bû. Le fêrgey Rinkeby çalakane kar dekirêt Leser saxlemîy fêrxwaz û beşêk lew kare birîtîye lewey be şeweyekî dirust pêşanî fêrxwazî bideyn çon bo nimûne tûtîn û kuhul kar dekene ser saxlemî. Be kêşanî sîgar le rêy filterewe bo girtinî maddey ziyarbexş, fêrxwazan bînîyan tûtinkêşan çi ziyarêk be sîyekanî xoy degeyenêt. Kirmêk dexiraye lêwanêk kuhulewe û demirêt. Em şewazî fêrkarîye bê berhelst nebû. Rexnegiran deyangut eme pirupagendeyeke tirsêner, dayikûbabîş hebû layan xoş nebû mindalekanyan kewtbûne bolebol legelyan bo ewey waz le kêşan bihênin.

Börje Ehrstrand delêt “*dîdarî geşe*” -y seretay hemû terimînêk sengêkî gewrey heye ne tenha bo fêrbûnî fêrxwazan belkû bo derfetî xêzane koçhênerekaniş bêne pêş û aşinay civakî Swêd bibin. Xalêkî dîkey girîng, kare legel geşedan be zimanî yekbeyekî fêrxwazan, zimanî hem nûsîn û hem zarekî. Le fêrgey Rinkeby cexitî zor Leser xwêndinewe dekirêt. Kitêbixaneyekî razawe le fêrgeda girînge. Xwêndinewe be dengî beriz, karêke hem mindal hem gewresal pêyan xoşe. Ewca axaftin derbarey babetî xwênirawe lanî kem wek xwêndineweke xoy girînge. Paşan dawa le dayikûbabîş dekirêt le malewe yarmetîy mindalekanyan biden bo xwêndinewe, ewey twanay zimanî swêdîşî kize detwanêt heftane kajêrkî bêdengî bo mindalekey terxan bikat. Têvê, radyo, komputer... Xamoş dekirên bo ewey mindaleke katî hebêt be aramî bixwênêtewe. Fêrgeş heftey heye taybet be xwêndinewe û cêjinekeşî dekewête mangî dîsemberewe. Lew hefteyeda, ew edîbey lew saleda xelatî nobilî le edebda wergirtûwe, dête serdanî fêrgeke.

Bedem axaftinewe letek Börje Ehrstrand çend xalêk lay min betaybetî bûne cêy serinc. Xalî yekem ew dilgerimîye gewre û xulya behêzey xoy bû bo fêrxwazekanî. Fêrxwaz debêt xwêndinêkiyan bo terxan bikirêt bibête mayey ayendeyekî geş boyan. Deygut, girînge xoşewîstîy mamosta bo fêrxwazanî xoy tîşk bidatewe. Ger fêrxwaz xemsardî pêşan bidat ewe erikî mamostaye xulyay têda çexmaxe bidat. Heman bas dayikûbabîş degirêtewe. Peywendî bestin legelyanda şabase.

Xalî dûhemî min bîrî lê dekemewe eweye berêweber xawen bîrokey rûne derbarey pêwstîy fêrxwaz bo ewey ayendey geş bêt. Amancî fêrgey Rinkeby sêkoçkeye: zanyar, twanay civakî û saxlemî. Ger dête ser zanyar cexit Leser xwêndinewe dekirêt. Katêk Börje Ehrstrand hate ser em kare, fêrgeke kitêbixaney nebû, fêrxwaz kitêbî xoyan le malewe dehêna û heta kotay sal le polda deparêziran. Ewca kitêbî yektiryan dexwêndewe.

- Ca boyan hebû hemû core kitêbêk bihênin? Hatime pirsîyar. Axir min wek mamostayekî zimanî swêdî, zor car beşdarîm kirdûwe le giftûgoy nûsyaî baş û xirap boye kunçkawî welamekey bûm. Gutî:
- Be fêrxwazanim gut, min twanay ewem nîye biryar bide kame nûsyaî başe û kamyan xirape, belam dezanim ger mirov zor bixwêndêtewe zor fêr debêt û ewsa geşe be ziman û twanay rageyandinî xoy dedat. Ewca xoyîşim zorim bo dexwêndinewe û ewanîş layan xoş bû.

Xalî sêhemî serincrakêş ewe bû mamosta debêt twanay hebêt giftûgo legel fêrxwazî xoy bikat. Fêrgey Rinkeby berdewam 120 ferîkemamosta werdegirêt bo bernamey rahênanyan. Börje Ehrstrand pêşwazî le yekbeyekiyan dekat û paşan zor le başekanyan derfetî kar lewê werdegirin. Mamostayekî xawen çendîn nîmirey zanko û astêkî beriz le zanistî babetda daway karî kird le fêrgey Rinkeby belam karî nediraye çunke twanay giftûgoy letek fêrxwazanda nebû.

Börje Ehrstrand rûnî dekatewe katêk xoy le welatî Fînlend daway cêgey kird le riştey mamostayetî, twanadozîy bo wergirtin dû rojî xayand be çendîn cor têtî zanyar û têtî derûnnasîyewe. Dawayan lê dekira bê amadekarî waneyek be nîmûne bilênewe derbarey babetêkî diyarîkiraw. Nêzîkey deyekî kesani dawakar, wergîran. Ehrstrand delêt swêdîş pêwîstî be proseyekî lew babete heye.

Le kotada ke pirsîyarim le Ehrstrand kird ger xoy hokarî serkewtinî xoy lem pîşe - be gutey Freud - twanabedereda rûn bikatewe, gutî:

- Hokarêkî zor taybet nîye. Min çi cadûgerîyek nazanim, ger mebest eweye. Baseke birîtîye le karî rijd û agayane.

Seredawêkî dîkeşî heye em serkewtine, min le saytî fêrgekeda deybînim. Börje Ehrstrand û fêrgey Rinkeby "*Xelatî rêberanî fêrgey Skandînavya*" -y pê debixîrêt û le hokarî ew beşîneda hatûwe: "*bo rêberayetiyeke leradebeder serkewtûy derweşawe û sewdager*".

Zengî telefon - yasaxkirdin yan sewdagerî

Nimûney yekem

Êlîn (Elin) mamostay kîmyaye le polî dûhemî amadeyî. Eme yekem waneye paş pişûy hawîne û lenakaw mobayelî fêrxwazêk zeng dedat.

Êlîn be tûreyîyewe: ewe çîye anton! Lebîrt çûwe telefon pêbûn le polda yasaxe lem fêrgeyeda?

Anton: erê raste! Belam ewe dayikime telefon dekat û tenha şitêkî pê bilêm.

Êlîn: na, destbecê telefoneke xamoş bike! Parsal rêberayetiş fêrge biryarî da le polda telefon debêt xamoş bêt. Ew biryareş hemû kes degirêtewe, tenanet toyiş anton!

Anton: belam eme girînge! Lewaneye naçar bim xuşke biçûkekem le zaroxane bihênimewe.

Êlîn: telefoneket xamoş bike!

Anton (be pele le telefonekeda delêt): natwanim êsta qse bikem, paşan le pişûda telefonit bo dekemewe.

Êlîn: debêt basêkitan bo rûn bikemewe û hemûştan degirêtewe. Rêk wek le civakda heye, le fêrgeşda pêwîstiman be yasa û rêsa heye. Ewane bo parastinî gişt êmen ke kar dekeyn û dexwênîn lêre. Min mebestime êwe paş fêrge serkewtû bin leber ewe hendêk bas heye debêt bîzanin. Yek lew basane peyrewkirdinî ew yasageleye ke giştiman degirêtewe. Pêt waye çî rû dedat ger her şofêrêk be arezûy xoy biryar bidat be kam “milerê” da¹⁶⁵ bajwêt? Debête hera.

Anton: belam mamosta heye hemû rojeke telefonekey helkirawe!

Êlîn: ewanîş lew kare berpîrsin. Ger kesanêk rêsaşkênî biken nabête hokar bo ewey mirovî dîkeş rêsaşkênî biken. Lemewla gişt telefonekan lem poleda xamoş dekirên! Be telefonî xoyîşmewe. Têbînî bikem kesêk telefonekey helkirawe wane radegirim û yekser peywendî legel dayikûbabî degirim. Le malîş nebin telefon bo cêy karyan dekem.

Umêd: dayikûbabî min le karekey xoyan boyan nîye telefonyan helkiraw bêt!

Gişt fêrxwazan deydene pêkenîn.

Êlîn: êweş wek min dezanin zengî telefon giştiman xerîk dekat nek tenha ew kesey telefonî bo dekirêt. Êwe dezanin parsal çî rûy da. Emsal lêtanî naselîmênim. Peywendî legel dayikûbabitan degirim û ger sûdî nebû peywendî legel rêberayetiş fêrge degirim.

Êlsa: deysa neçînewe ser waney kîmya! Min demewêt şitêk fêrbim û bem zûwane katî yekem twanadozîye.

Êlîn: başe, êsta hemû dezanin biryar çîye! Bigerênewe ser wanekeman.

Lew nimûneyeda mamosta helwêstêk pêşan dedat le fêrgey serbe ferhengî giwêrayelîda nerête. Zengî mawemawey telefon le polda debête mayey şewandinî aramîy xwêndin. Hem mamosta û hem fêrxwaz skala deken û paş sazûsewdayekî kurt, berêweber û yarîderî berêweber biryar deden telefonî

¹⁶⁵ Milerê: rêçike.

helkirawe le katî waneda yasax bê. Mamostakan agadar dekirênewe lew biryare û ewanîş agadarî dedene fêrxwazan. Zorbeyan pêşwazî le biryareke deken. Yek le mamostayan delêt:

- Baş bû rêberayeti fêrge ewende azayeti peyda kird pê dagirêt û berengarî bikat!

Çareserî kesî rêsaşkênîş hate ber giftûgo, belam berêweberan gutyan carê biryarî çareser bo mamosta cê dehêlîn. Lewaneyê bo eweş pêwîstî be rêsay hawko hebêt belam carê çawerê deken bizanin peyrewkirdinî rêsake çon derwat.

Rêberayeti çî pol bê çî fêrge bedem perînewe le ferhengî giwêrayeliyewe bo ferhengî berpirsayeti, erikêkî sexte. Lem doxeda be didî zor kes firajûtinî telefonî mobayel bote mayey kêşe bo pergâl û harîkarîy nêw fêrge. Belam heyşe yasaxkirdin be baş nazanêt. Xom le zor mamostam bîstûwe delêt karêkî zor asayîye le polda mamosta telefonî kirawe bê û herweha asayîye fêrxwaz ew derfety nebêt. Mamostay dîke heye delêt herdû la hem fêrxwaz û hem mamosta derfetyan hebêt başe le doxî taybetda telefonyan kirawe bê, wate katêk şitêk rûy dabêt û pêwîst bikat berdest bin. Helbet pêşnyazî dîkeş lem bareyewe zorin.

Kêşey helwêstî salarany serbe ferhengî giwêrayeli lewedaye mirovî serbe ferhengî berpirsayeti heman ew rêzey nîye bo pêgey serdestaney rêberan ke pêştir baw bû. Rêberî salarîsepên beşêkî zorî deselatî xoy be tirs pêk dehênêt û ger jêrdestekanî hestyan be tirs nekird, ewsa em rêbere ne tenha deselat ledest dedat belkû xecaletiş debêt.

Êlîn -î mamosta le nimûnekey sereweda xerîke xoy bikate galtecar bew basey gejişte sinûrêk Umêd -î fêrxwaz lê kewte şoxîbazî. Umêd le tûrebûnî mamostakey natirsêt û bakîşî nîye lewey pêgey mamostake wek rêberêkî pol binkol bikat. Êlîn bew helwêstey Umêd salarîy xoy ledest dedat belam em careyan êlsa -î fêrxwaz debête firyaresî û be têbînîyek kota bew giftûgoye dehênêt û Êlîn debatewe ser waney kîmya.

Le ferhengî berpirsayeti da zorbey endaman têdekoşin bo ewey le buwarî ciyawazda derfeti biryardanyan hebêt. Mirov pêy xoşe legel bê û karîgerîy hebêt. Helbet em diyardeye gişt civakan degirêtewe belam ciyawazîy bo nimûne nêwan dîkitoroti û dêmokrasî eweye le dîkitoroti tenanet hewildan û derbirînî bîrûra metirsîy mergî bedemewe heye, keçî le dêmokrasîda çawerê le mirov dekirêt helwêst werbigirêt û boçûnî xoy rageyenêt. Kêşey fêrgey emro lewedaye berpirsayetiyeke bideyte fêrxwaz (u mamostayîş) derwestî bèn. Ciyawazî heye le nêwan berpirsayeti fêrxwazî heft salan û hevde salan. Twanay derwesthatinî berpirsayeti, tenanet le nêw kesanî hawtemenişda serûjêr dekat.

Deysa çî biken başe? Be boçûnî min mirov debêt bûwêrêt şewazî dêmokratane bo çareserî kêşe bigirête ber, wate giftûgo derbarey kêşeke damezirênêt. Êlîn -î mamostay nimûney pêşû lewe naçêt çî mitmaney hebêt be twanay fêrxwazan bitwanin pêşnyazî baş û sazendeyan hebêt bo çareserî dozi mobayel. Çî pirsaryan pê nakirêt. Pê naçêt çawenoriyan lê bikirêt berpirsayeti bigirne esto, emeş debête hokar bo ewanîş be şewazêkî naberpirsane reftar biken. Lebiri harîkarî deykene galtecarî. Êlîn bo xoyîş çî car banghêst nekirawe letek berêweber û hawkaranda rawêj Leser çareserî kêşe biken. Paş derçûnî biryareke, emîş beranber fêrxwazan her ew helwêste radeniwênêt ke berêweberan le mamostakanyan heye. Em rewte nimûneyeke lewey derûnnasan be “prosey terîb”¹⁶⁶ nêwzedî deken.

Werin bizanîn şewazekey dîke le çî deçêt.

¹⁶⁶ Prosey terîb: parallel process, parallel processing.

Nimûney dûhem

Tomas mamostay kîmyaye le polî dûhemî amadeyî. Emeş yekem waneye paş pişûy hawîne û lenakaw mobayelî fêrxwazêk zeng dedat.

Tomas henaseyekî bêzarî heldekêşê û wane radegirêt. Poleke çend çirkeyek bêdeng debin û serinc rûwew anton werdegêrin ke be çirpe welamî telefoneke dedatewe û xêra xamoşî dekat.

Tomas: dey! Pê m waye baş bû eme le yekem waney terimînekeda rûy da. Eweta debête hokar bo ewey dîsan basî telefon rûn bikeynewe. Bîrtan dê salî par berêweberayetîy fêrge biryarî da telefon le waneda yasax bikirêt. Êsta min pirsiyar dekem boçûntan derbarey peyrewkirdin lew rêsaye çone? Mebestîşme bizanim boçûnî êwe bo reftar legel telefon lemewla çon bêt?

Anton: ewe dayikim bû telefonî kird û lewaneye naçar bim min xuşke biçûkekem le zaroxane bihênimewe.

Êlsa: min zor bêzaram lem telefone nîgirîsane. Başe êre hobey axaftine yan fêrgeye bo fêrbûn? Pirsiyare, pirsiyar.

Umêd: le karekey dayikîşim telefon yasaxe, belam dayikim telefonekey bêdeng kirdûwe.

Tomas: min hest dekem serincîrîym têk deçêt ger bizanim satenasatêk zengî telefon wanekem depîçirênin. Beweş astî mamostayetîm dadekewêt.

Êlsa: dey, ewa giwêtan lêye!

Anton: mamosta hen telefonkanyan zeng dedat! Ê debêt bo êmeş rewa bêt. Xo yasaxkirdineke serî negirtûwe.

Giftûgo berdewame û fêrxwazan boçûnî ciyawazyan heye. Paş maweyek Tomas giftûgo radegirêt û delêt: pê m başe ême pêk bêyn Leser em base, belam lêre boçûnî zor ciyawaz heye. Lewaneye minîş pêwîstim bewe bêt bîrêkî dîkey lê bikemewe. Pêşnyazî min eweye êwe le malewe bîrêk bikenewe le sûd û ziyân pêkirdin û xamoşkirdinî telefon le katî waneda. Le waney rojî heynîda dozeke dexeynewe berbas û ta ewsa weha başe bîr leweş bikenewe ger kesêk paş pêkhatin, peymanşikênî bikat, çî legel bikeyn başe. Êwe deşzanin mobayelî roşin le polda biryarî yasaxî lesere. Debêt bîr leweş bikenewe.

Gişt poleke pêşnyazekey Tomas pesend deken Êlsa û anton nebêt. Êlsa pêy waye yasaxkirdin çaresere û tewaw. Anton raydegeyenêt ew dijî yasaxkirdine. Em pêy waye her kes be arezûy xoy bikat.

Nimûneke corêk le helwêstî mamosta pêşan dedat serbe ferhengî berpîrsayetîye. Boçûnî Tomas eweye fêrxwazekanî lem baseda detwanin berpîrsayetîy bigirne esto. Ewca bîr leweş dekatewe ke yasaxkirdinêkî salarane ew berpîrsayetîyeyan lê zewit dekat, ke dûr nîye lasarîy bedemewe bêt lebirî peyrewkirdin.

Aşkiraye ke peyrewkirdinî fermaneke lem maweyey derçûnîda kemasîy hebûwe. Katêk telefonekey anton zeng dedat, Tomas derfeteke degirêt û fêrxwazan banghêşt dekat bo giftûgo derbarey çareserêk bo lemewla. Fêrxwaz boçûnî xoyan rûn dekenewe û herweha Tomas - yiş. Eweta rûnî dekatewe katî wane be zengî mobayelekan herasan debêt û twanay mamostayetîşî dadekewêt. Fêrxwazan dîdî hem zor û hem ciyawaz derdebirin leber ewe Tomas degate ew bawerey weha başe

katî ziyatir terxan bikirêt bo bîrkirdinewe le çareserî kêşeke. Agadaryan dekatewe lew xalaney başe bîrî lê bikenewe û çend rojêkîş moletyan dedatê.

Em doxe mercî gewre dexate ser Tomasî mamosta. Tomas debêt xoragir bêt beranber bîrokey ewey lewaneye fêrxwazan negene xalî pêkhatin. Deşbêt xoragir bêt beranber rexney bo nimûne rêberayetîy fêrge û dayikûbab ger bilên mamosta nabêt le fêrge û leberdem fêrxwazanda biryarî biryarde bixate jêr pirsiyarewe. Bo xoyîşî debêt bîrî lê bikatewe aye amadeye sazş Leser ew base bikat? Sazûsewda her dekatewe bênewbere. Le encamîşda her çareserêk bibête mayey pêkhatin, kesanêk her demênin narazî. Ewca rexney dîkeş peyda debin û aye em amadeye biyan selimênêt? Helbet hasantire wek Êlîn (î mamostay nimûney pêşû) bikat, تنها pêdagirî bikat Leser fermanêkî biryarde. Belam Tomas deyhewêt fêrxwazanî letek bin, heta karames bêt le rêberayetîy giftûgoyan û amade bêt lêyan bibîstêt, ewa debête cêy mitmane û rêzî fêrxwazan. Lem buwareşda azimûdeye.

Her be xeyal wehay dabinê fêrxwazan pêk dên Leser ewey boyan heye le doxî taybetda telefonyan kirawe bêt û Tomas bew çaresere razî nabêt. Lewaneye rêberayetîy fêrgeş “na”-yekî zirîngedar pêşkeş bikat. Ewca çî? Beşêkî fêrxwazan narazî û tûre debin. Belam be dîdî min ewe xalî here girîng nîye. Le ferhengî berpirsayetîda girînge fêrxwaz pirsî pê bikirêt, Tomas bîhewêt giwê le boçûnekanyan bigirêt û lêyan bibîstêt.

Car heye, natwanîn fermanî biryarde bigorîn û naçarîn giştiman bîselimênîn, gerçî derfetî hewildanîşiman heye. Belam kes lay girîng nebêt giwê le boçûnî layenî peywendîdar bigirêt yan pêşnyazyan bibîstêt dekatewe ewey bilêyt boçûnyan sengî nîye. Le barudoxî xirapîşda debête rûxêner û degate bêdeselatî.

Ger heman dox le polêkda rûy daba fêrxwazanî heft salan nek hevde salan ban, be dîdî min baseke corêkî dîke debû. Mindalêkî heft salan pêwîst nakat berpirsayetîy biryar Leser bekarhênanî mobayl le polda bigirête esto. Hekarêk bo em dîde eweye mêşîkî mindalî heft sale ewende geşey nekirdû amadey helsengandinî weha bêt. Be kurtî astî riskanyan derwestî erikî weha nayet.

Merc Leser şêwazî hawsemay mamosta letek fêrxwazanda girêdirawe bewey le kam ferhengda karan: ferhengî giwêrayelî yan ferhengî berpirsayetî. Ewey le ferhengî giwêrayelîda be mamostay baş dezanrêt, le ferhengî berpirsayetîda ziyatir wek salarîsepên û nadêmokrat debînêrêt. Ewey le ferhengî berpirsayetîda be mamostay baş dezanrêt, dûr nîye le ferhengî giwêrayelîda be lêl, lawaz û bêrêz lay fêrxwazan, seyr bikirêt.

Aye toy xwêner boçûnit çîye derbarey şêwazî çareserkirdinî doxeke le layen Êlîn û Tomas - -ewe? Edî to bayt çî dekird katêk telefonî anton dekewête zirînganewe?

Çapterî heftem: Aye diruste mamostayetî be her kes rewa bêt?

Destbijêrî bo riştey mamostayetî

Mamosta karîgerîy yekcar gewrey heye Leser rewî fêrkarîy fêrxwaz. Leber ewe girînge ferîkemamosta cige le peydakirdinî zanistî babet, xoy rabihênêt be rageyandin û hawahengîy ayetî legel fêrxwazanda. Bernamey rahênan heye bo buwarî rêberayetî û rageyandin. Rêge heye bo zanînî ziyatir derbarey corî helsûkewtî mirov letek dewrûberda. Legel eweşda beşêk zanyar û behrey bineretî hen mirov debêt katî dawakirdinî xwêndineke heybêt. Pêşim waye zor kes lem xaleda hawramin. Hemû kesêk bo mamostayetî dest nadat. Pejare, kat û xercîyekî zorîş degerêtewe ger her le seretawe lebarbûnî dawakaran bo pîşeke bête helsengandin.

Twanistî hem nerêtî û hem civakî bergeşen,¹⁶⁷ belam ger kemasîyekan zor gewre bin ewa xwêndinî mamostayetî û xwêndinî dewamedar natwanêt sûd le karî geşepêdaneke bibînêt. Leber ewe core twanadozîyek bo “helsengandinî şayan”-î xwazyaran bo em pîşeye karêkî girînge. Ba bilêyn twanadozîyekî wek ewey Börje Ehrstrand le Fînland pêya têperî.

Katî xerîkbûnim bem basewe, yadaştêkim bo hat le “fermangey xwêndinî bala” -we be rêkewtî 24/1-2006 bas le “*Twanadozîy zanist û karameyî le buwarî saxlemîda*” dekat. Desteyekî kar diyarî kirawin û erikîşyan birîtîye le dariştinî ew core twanadozîye. Salî 2009 ewca karî pê dekirêt. Bo zanînî ziyatir derbarey bîrokey ew base û ger sûdêkî hebêt bo boçûnekanî xom derbarey “*têstî şayan*” bo xwêndinî riştey mamostayetî, dekewme peydozîy Ulla Holm -î docent -î derûnnasî û endam le grûpî kar bo dariştinî têstekey saxlemî.

Dîdarî Ulla Holm

Ulla Holm nûserî çendîn kitêbe, yek lewan “*Mîhrebanîy bes nîye - derbarey hawsozî û pêşwazîy pîşewerane le buwarî saxlemîda*” (1995).¹⁶⁸ be mebestî dîdarêkî kurt çûme lay le hawînehewarekey xoy le derewey şarî Sundsvall. Derbarey têtî saxlemîyeke Ulla Holm gutî, mebest eweye gişt pîşeyekî saxlemî bigirêtewe ke le xwêndinî bala dexwêndirên û binemayekî siruştasî (zanistî) - yan heye, bo nimûne: pizîşk, peristar û “leştîmar” *physical therapist*. Hokarîş bo daway em têtî le buwarî saxlemîda dû beşe: yekemyan kirdinewey rêgeyekî sêheme bo wergirtinî fêrxwaz - emro tenha dû rêge heye: nimire yan twanadozîy xwêndinî bala - dûhemyan dariştinî têtîke merce taybetekan bigirêtewe ke pêwîstin bo kesanêkî le buwarî saxlemîda kar deken.

Mebest eweye xwêndinî pîşey saxlemî daway twanay taybet dekat. Mercî yekem zaniste derbarey siruştasî û civaknasî. Ew kesey werdegîrêt le riştey saxlemîda debêt astêkî taybetî le zanistî ew babetane hebêt ber le destpêkî xwêndineke. Mercî dûhem twanay rageyandine legel dewrûber, mirov debêt twanay hebêt xêra agadarî werbigirêt, bo nimûne tomarî nexoş bixwênêtewe û agadarî bidatewe nexoşeke. Mercî sêhem - û zorîş girîng - twanay sazkindinî hevbendîyekî asûdeye letek nexoş bo ewey nexoş hest be selimandin û pejrandin bikat.

¹⁶⁷ Bergeşe: dekirêt geşey pê bideyt.

¹⁶⁸ Ulla Holm. *Det räcker inte att vara snäll: om empati och professionellt bemötande inom människovårdande yrken*. 1995.

Ewca bo pêwanî zanist û twanay weha pêwîst, twanadozîy le riştey saxlemîda kirawete sê beş:

- têtî zanist, babetekanî serbe siruştasî û civaknasîy degirêtewe û leser binaxey astî amadeyî
- têtî twanay rageyandin, dekatewe hem wergirtin û hem geyandinî agadarîy be herdû şêwey zarekî û nûsiraw.
- têtî hawsema, ke dekatewe twanay helkirdin le civakda, twanistî hawsozî û twanistî sazkindinî hevbendîy letek beranberda.

Ulla Holm cexit dekat le ser ewey em twanadozîy saxlemîye bo ewe nîye kilêşeyek¹⁶⁹ bikirête modêl bo kesanêkî daway em xwêndine deken.

Mebest ewe nîye serinc le core kesayêyêkî taybet gîr bikeyn belkû bo dozînewey twanist û hunerî civakîye. Mirov debêt hunerî peywendîgirtin û pêşwazîy hebêt. Ême pêman waye eme xalêkî zor girînge rûn bikirêtewe, çunke zorbey rexne ke arastey têtî taybet dekirêt birîtîye le: aha, êwe benyazin gişt kesêk le yek çêwe baxinin. Na, ême eweman nawêt. Lêreda bas le twaniste nek adgarî kesekî.

(dîdarî Holm , jûnî 2007).

Yadaştnamekey “*fermangey xwêndinî bala*” derbarey “têtî hawsema” denûsêt “[têsteke] cexit le ser rûkarî weha dekat le riştekedaya nayene xwêndin, belam deşêt le mawey xwêndinekeda derfet ferahem bikirêt bo peybirdinî baştir bew rûkarane”. Dawa le Ulla Holm dekem, ke xerîkî ew têtî hawsemayeye, bom rûn bikatewe çî belawe girînge le têtî hawsemay bo nimûne pizîşk û nexoş. Ulla Holm bas le dû xal dekat.

Xalî yekem twanay damezirandinî mitmaneye. Nexoş ger mitmaney bew pizîşke nebêt hatûwe bo tîmarkirdinî, diyare kemptir amadeye agadarîy girîng derbarey xoy bidate ew pizîşke. Mirov mitmaney be pizîşk nebêt diyare mitmaney be agadarî, tîmar û rêniwênîy pizîşkekeş nabêt. Mitmane basêkî bineretîye û binaxekey birîtîye lewey nexoş hest bikat pizîşkeke rêzî degirêt. Hestkirdin bew rêze û twanay geyandinî be kesî beranber binaxeye bo sazkindinî hevbendîyêkî geş. Kewate, bo nimûne, lûtberzî tewaw nalebare. Ger pizîşk lûtberzane reftar bikat ewa damezirandinî hevbendîyêkî mitmanebexş debête karêkî sext û twanabeder.

Xalî dûhem eweye pizîşk twanayekî hawsozaney hebêt, wate twanay hebêt xoy bixate cêy nexoşeke bo ewey pêşwazî û tîmarkarîyeke be reşawgirtinî barudoxî nexoşeke bêt, bo nimûne twanay nexoşeke bo wergirtinî rêniwênî. Nexoşêk taze zanîwiyetî nexoşîyêkî sextî heye, sûd le rêniwênîy pizîşk nabînêt bas le bîmey saxlemî û babetî dîkey yasayî û abûrî bo bikat. Tenanet ger nexoşeke xoyişî bas le kêşey abûrîy xoy bikat. Agadarîy lew babete lew barudoxeda nayete wergirtin. Pêwîst lem bareda derikkirdinî nexoşekekey, peybirdine be nîgeranîyekey, pejrandinî hestekanîyêtî. Hawkat pizîşk debêt hîwabexş bêt. Rûnî bikatewe derfet heye bo yarmetî û nexoş bêderetan nîye. Pizîşkî hawsoz lewaneye le kotay dîdarekeyda be nexoş bilêyt: to lem bareda cênahêlîn. Ême peywendîman debêt û karêk dekeyn yarmetî û piştîwanîy pêwîst bo to dabîn bêt.

Ewca le Ulla Holm depirsim, aye têtî hawsemay lew babete çî hera denêtewe? Welamekey corêk bû bîrî lê bikeytewe.

¹⁶⁹ Kilêşe: stereotype (stêryotayp).

Giştiman dezanîn kesanêk kar le saxlemîda biken debêt hunerî rageyandinyan hebêt letek nexoşda û debêt twanayan hebêt bo damezirandinî hevbandîyekî mitmanebexş. Belam ger mirov le twanadozîy hawsemada kurtî bihênêt û bew hokare derhawêjrêt, lewaneye hera binêtewe. Zor kes heye delên mirov le buwarî saxlemîda debêt ew huneraney hebêt belam ger xoyan leber nebûnî ew hunerane derhawêj bikirên, bertek deniwênin. Diyardeyekî zor nakoke! Ger mirov leber kurthênanî nimire derhawêjrêt asayî bêt belam leber kemasîy twanay hawsema letek dewrûberda derhawêjrêt, be nadirust danrêt.

Heta têsteke bo helbijardinî fêrxwaz bêt kêşey nîye belam ke dête ser derhawîştinî em û ew heray gewre berpa debêt. Barî hestiyar eweye jimarey xwazyaranî xwêndineke kemtir yan teraz bêt legel jimarey kursîy xwêndineke û to bêyt bem têste kesanêk derhawêjît, belam emeyan basêke debêt giftûgoy kirawey leser bikirêt. Min pêm waye mirov debêt le ast rastîyekanda rastgo bêt. Mirov heye twanistî sozekî û civakîy ewende nîye dest bidat bo kar le buwarî saxlemîda. Min nimûnem zor dîwe le kesanî wehay neguncaw bo karî saxlemî, hem xoyan bedbext û hem nexoş û hawkaranyan bedbext kirdibû. Xoşbextane beşêkiyan karyan gorî bo pîşeyekî dîkey guncawtir û lewêda berhemî baş pêşkeş deken.

Le beşetêstî hawsemada helsengandinî weha bekar dêt leser astî nêwdewletîda darêjrawe bo pêwaney rûkarî çiyawaz le twanay hawsema letek kesanî dîkeda. Serleberî têtî saxlemî be komputer rê dekat û nêzîkey nîw roj dexayenêt. Le bersivî dûwapirsiyarimda derbarey *radey dilnyayî*¹⁷⁰ le têtî hawsema, Ulla Holm gutî zorbey tojînewekan delên astekey zor berze.

Helsengandinî şayan bo xwêndinî riştey mamostayetî çon bêt başe?

Lew yadaştey fermangey xwêndinî bala ke le serewe basî hat nûsirawe: “xwêndin heye amadebaşî deken bo buwarî karî weha ke mercî berizyan heye leser çend xesletêkî kesekî û hunerî taybet”. Be boçûnî min pîşey mamostayetîş yekêke lew core buwaraney kar.

Deysa ew xeslet û hunere bineretîyaney çin ke pêwîste hebin lay kesêk rû le riştey mamostayetî bikat?

Ger bêyne ser zanist ewa moletî giştî bo xwêndinî bala, wate birwanamey amadeyî yan twanadozîy xwêndinî bala, lêreşda mercî pêwîste. Ewca twanay dîkey taybet pêwîstin ke girêdirawî hunerî pîşeken. Wate ewey benyaze bibête mamosta debêt astêkî hebêt le riskanî sozekî û twanistî hevbandkarî derwestî mercekanî pîşeke bêt. Helsengandî şayan bo pêwaney ew twanagele dekirêt em beşaney hebêt:

- Twanay derbirînî rûn hem zarekî û hem be nûsîn
- Twanay têgeyîştin le agadarîy zarekî û nûsiraw, herweha geyandinyan be şêweyekî zarekî û be nûsîn
- Peybirdin be rageyandinî negutiraw, betaybetî peyamî sozekî
- Twanay bîrdanewe le xo û le kesanî dîke
- Twanay derbirînî hawsozane
- Twanay peybirdin, baskirdin û bîrdanewe le doxêkî nakokîy mirov agadarî bûbêt

¹⁷⁰ Radey dilnyayî: reliability.

- Twanay peybirdin be karîgerîy reftarî xo le hawsemada letek kesanî dîke leser doxêkî taybet
- Twanay giwêradêran, wate twanay welananî pêwîstî û awatî xo, le katî axaftin legel kesanî dîkeda
- Twanay çerxandinî giftûgoyekî watadar le dozgelî akarekîda

Helsengandinêkî şayanî taybet be xwazyaranî riştey mamostayetî lewaney zor layenî hawbeşî hebêt legel ew twanadozîy saxlemîyeda ke Ulla Holm basî lê kird. Leber ewe na ke mamostayetî pîşeyekî saxlemîye - çunke weha nîye - belkû leber ewey fêrxwazîş wek nexoş le doxêkî gîrodebûndaye. Cige leweş baştirîn xwêndin peyweste be mamostayek hem le buwarî babetî xoyda zana bêt û hem peroşî fêrxwazanî xoy bêt. Kewate mercî taybet heye leser şêwazî kesî pîşewer bo pêşwazî le kesanî dîkey peywendîdar le pîşekeda.

Le ezimûnî taybetî xomewe dezanim ke mamosta begîştî em erike zor baş piyade deken, beşêkîşyan weha serkewtûn, karîgerîy dûrmewdayan leser fêrxwaz cêhêştûwe. Hevişe mexabin leber kizîy twanayan bo pêşwazîy kesanî dîke ziyânî gewreyan dawê le mitmaney fêrxwaz hem be xotwan û hem be amadeyî dewrûber bo yarretî û piştîwanîyan.

Helsengandinêkî şayan bo xwazyaranî mamostayetî lewaney bibête hoy kembûnewey pejare:

- Bo kesêkî rêy lê bigîrêt pîşeyek bixwênêt guncawî nebêt
- Bo zorêk le fêrxwazan. Tenanet ger 1% -î xwazyaranî riştey mamostayetî be helsengandinî şayan derhawêjrên, ewa karîgerîy debêt leser sedan fêrxwaz, ke rizgaryan debêt le çepandinî mamosta û le mamostay weha ke kêşey derûnîy hênd gewrey heye natwanêt bibête yarîderî kesanî dîke.
- Bo zor lew dayikûbabey rizgaryan debêt lewey mindalyan tûşî kêşe bin le fêrge
- Bo rêberanî fêrge û hawkaranêkî rizgaryan debêt le çakkirdinewey çewtkarîy ew hawkarê û dildanewey dayikûbabî tûre û narazî.

Be boçûnî min em helsengandinî şayane, lepal birwanamey amadeyî û twanadozîy xwêndinî bala, nebête rêçkeyekî sêhem û bes, bigire gişt kesêk bigirêtewe benyaze bibête mamosta. Toy em nûsînem dexwênîtewe delêt çî? Aye belgey dij be helsengandinî şayan heye? Min belgeyekî weha nabînim, be mercêk helsengandineke weha darêjrêt berastî bo helsengandinî şayan bêt bo pîşeke.

Le yadaştekey 2007î fermangey xwêndinî bala nardbûy bo destey şarezayanî kara le têtî saxlemîda, nûsirawe:

Xwast eweye, ke dête ser pêşbînî le astî twana, helsengandinî taybet darêjraw bo buwarêkî diyarîkiraw, hawşanî birwaname bêt. Belam debêt radey dilnyayî lem pêwaneda beriztir bêt. Ezimûnî nêwdewletî pêşanî dawê ke helsengandinî buwar twanay pêşbînîy ziyatire le têtî pitir giştîy xwêndin, bo nimûne têtî xwêndinî bala.

Serencam

Le Swêd, zor le beşekanî xwêndinî bala - bewlay birwanamey amadeyî û têtî xwêndinî balawe - helsengandinî taybetyan heye be destbijêrî here baştirîn bo wergirtin û derbazbûn le xwêndineke û

paşan serkewtin le pîşekeda. Her bo nimûne birwane buwarekanî xwêndinî hunerî, wek muzîk û sema, ewca firokewanî, derûnsazî, polîs û rojnamegerî.

Saytî kolîjî polîsayetî le înternêtda delêt prosey wergirtin lem xwêndineda pênc hengawe:

- 1- Helsengandinî birwaname
- 2- Axaftinî yekem û têstî zanînî zimanî swêdî
- 3- Têstî twanay leşekî
- 4- Têst û dîdar
Lêreda giftûgo heye bo nimûne letek derûnnasda. Pirsî wek: “hevbendîye kesekîyekanî kesî xwazyarî em xwêndinewe, helwêst, meyl, behay serbe akar û rewîşt” beser dekirênewe. Ewca serey dîdarî xwazyare legel polîsî taybet be dîdarî weha amanc lêy “aşkirakirdinî taybetmendîy kesekîy, twana û guncanî kesî xwazyare bo pîşey polîsayetî”.
- 5- Bordî wergirtin

Em base berawird bike be xwêndinî mamostayetî ke tenha birwanamey amadeyî yan têstî xwêndinî balay bese.

Katêk min letek hawkaran û mamostayanî fêrgey mamostayetî bas le helsengandinî şayan dekem bo xwazyaranî em rişteye bêdengîyekî seyr dirust debêt. Lewe deçêt kes zûtir bîrî lewe nekirdibêtewe pîşey mamostayetî pêwîstî be twanay taybet heye lay ew kesey daway em xwêndine dekat. Raste takutera peyam û gutar heye le mêdyada peyda debin belam min hest nakem lem satî nûsînemda giftûgoyekî dameziraw hebêt derbarey em doze.

Katêk bas le serdêre lawekîyekey kitêbekem dekem - *“zanyarnorî, hest û hevbendî le fêrgeda”* - kesanêk hen peşewîyan pêwe derdekewêt û be guman û carûbar be core kembayexîyekewe delên: *“dey, le xoş deçêt!”* Yan *“erê eme kemêk ziyad temawî nîye?”* Keçî hemwan dezanin twanay rageyandin, giwêradêran û peroşî bo fêrxwaz mercî aşkiran Leser kesanêk xwazyarî xwêndinî mamostayetî bin.

Dîdarekey Ulla Holm heman meyl pêşan dedat le buwarî saxlemîda. Twanagelêk hen hemwan pêyan wehaye aşkiraye ke hem mamosta û hem karmendanî buwarî saxlemî her debêt heyana bêt, belam ger dawa bikeyt xwazyaranî ew xwêndinane xawen twanay weha bin, baseke weha aşkira namênêt.

Dijwestanî em helwêste çon rûn bikeynewe? Lewaneyê le serêkewe girêdirawî nezanîn bêt, le serêkî dîkeşewe girêdirawî nerêt bêt. Taze lem salaney dûwayîda tojeran selimandûyane mirov le temenî gewresalîşda detwanêt geşe be hunerî wek hawsozî û dameziranî mitmane bidat. Ger biryare hevbendîy geş letek beranberda saz bikeyn, emane hunergelêkî pêwîstin. Mirov heye her xorisk ew huneraney têdaye, heyîşe pêwîstî be koşanêkî zore. Heye ew huneraney têda zigmake, heye be ezimûn peyday kirdûn. Boçûnî zûtir deygut adgarî kesekî heye lay mirov gorînyan sexte yan twanabedere. Derbirîn heye delêt “mirov her xorisk yan fêrkare yan nîye”. Gutey weha nimûnen lew boçûne.

Hawkat birwa be hêzî fêrkarîyş zêderoyî têdaye. Zor kes hen pêyan wehaye mirov her ewendey twanay hebêt bo derbazbûn lew têstaney zanko û xwêndinî bala daway dekat, ewa twanaşî heye bibête mamosta û pizîşkî baş. Riskanî sozekî û twanistî hevbendkarî heta êsta le prosey wergirtin bo riştey mamostayetî sengiyan pê nedarawe.

Lewaneyê nerêt destî hebêt lewey mamosta û pizîşk herdem xawen salarîy bûbin - le ferhengî giwêrayelîda ziyatir leçaw ferhengî berpirsayetîda - belam êstaş fêrxwaz û dayikûbab zorin hest be

core samêk deken le ast bo nimûne “dîdarî geşe” da. Mamosta twanîwiyetî cîhan be şêweyek rûn bikatewe berderik bê. Pizîşk twanîwiyetî derdan derman bikat. Emane karêk nîn mirov xoy pêy helsûrêt. Mirov le serleberî jiyanda pêwîstî be rêniwêne û dayikûbab yekem rêniwênin. Lewaneyê her leber eweş bê hênde hestyare merc û rexneyan araste bikirêt. Pêman xoşe le sinûrbezênî bedûr bin. Salarî pêwîste bo dabînkirdinî asûdeyî. Ewanin detwanin wata û bestên bidene guzeran û ewanîşin katî tengane debine piştîwanî mirov. Lewaneyê her emaneş bin hokar bo ewey zor kes amade nîye kemasîy xoy biselimênêt. Gerçî kemasîy le giştimanda heye.

Twanay mamosta le buwarî hemecorda karîgerîy mezinî heye leser hem tak û hem civak. Leber eweyê min be “na” bersivî pirsiyarî serdêrî çaptereke dedemewe. Na, naşêt mamostayetî be her kes rewa bê. Zanyar û twana hen, hem giştî û hem taybet, pêwîstin bo helsûrandinî pîşey weha girîng.

Çapterî heştem: Firajûtin le pîşey mamostayetîda

Derbarey bextewerî le karda

Çîye ewey debête hokar bo bextewerîy êmey mamosta le karda? Bextewerîy xom sê hokarî hebû: fêrbûnî fêrxwazekan, firajûtinî kesekîy xom û hevbendîm letek fêrxwazanda.

Min hestim be bextewerî kirdûwe katêk zanîbêtim twanîwme astî fêrbûnî fêrxwazekanim pêş bixem; bo nimûne katêk hestim kirdibêt twanay fêrxwazanim le zimanî swêdîda helkişawe yan têgeyiştûn le karîgerîy wêje (edeb) bo serxistinî corayetîy jiyan - şadî û nîgeranî.

Serinc dane hengawekanî fêrxwazan be arastey wêranî derbirînî bîrûra û helwêst wergirtin, bo nimûne le doxêkî serbe akarda, diyardeyekî coşêner bû. Ewe dîsan coşêner bû bibînim fêrxwaz hen birway behêzyan le la dirust debêt bewey boçûnyan sengî heye û detwanin bibine mayey rêzlênan bewey bûwêrin berhelstî biken.

Belam be piley yekem bextewerîy min le karda katêk bûwe ke hestim kirdibêt hevbendîy başim letek fêrxwazan saze. Wate hestim kirdibêt pêkewebûniman le karî rojaneda watadar û xoş bûwe.

Hawkat û herdem hestim kirdûwe xoyişim pêwîstîm be firajûtine. Min têkoşawim bo ew pejrاندiney Honnethî feylesûf basî lê dekat, ew lêselimandiney pêşmerce tenanet bo firajûtinî pîşeweraneş. Le çapterî pêncemda basim lew babete kirdûwe. Min wîstume zanistim le babetî wanekanimda hem qûltir û hem firewantir bin, rêbazdozîm baştir bêt, belam xwazyarîş bûm ziyatir bizanim derbarey çonetîy karîgerîy şêwazî reftarim leser rewî karî pol û civînî dayikûbab. Her bew radeyeş be lamewe girîng bûwe bizanim rûdawî nêw pol û civînî dayikûbab çî karîgerîyekî leser xom heye.

Helbet hokarî dîkeş hen karîgerîyan heye leser bextewerîy kar, belam min bew sê hokarey basyan hat dest heldegirim. Toy xwêner lewaneye corêkî dîkey helbijêrît belam pêwîstîm waye firajûtinî kesekî lay toyiş sengî gewrey heye leser bextewerîy xot le karda. Alêreda ciyawazîy heye le nêwan êsta û raburdûda.

Fêrgew swêdî le ferhengî giwêrayelîda be çareser û rêsay koyekî¹⁷¹ debira berêwe. Firajûtinî kesekîy mamosta degmen basî dehat yan her nedehat. Le mawey bîst salda wek mamostay amadeyî çûmete çendîn semînar û xul belam bebîrim nayet yekcarîş bas le mamosta kirabêt wek mirov.

Le ferhengî berpîrsayetîda, ke têyda takgerayî mewdayekî başî birîwe û cexit pitir leser berpîrsayetîy tak dekirêt nek ko, debêt serinc le nax gîr bikirêt, le mamosta wek mirov. Ême çî dî natwanîn xoman wêl bikeyn û tenha cexit bixeyne ser fêrxwaz û pêwîstîy fêrxwaz le zanist û rahênanî civakî. Grûpî rêniwênî û tîmî karî mamostayan bo pêşwazî le pêwîstîyekanî mamosta peyda bûn. Grûpî rêniwênî meydanêke bo bîrdanewe le karî rojane, nek bo encamdanî kareke.

Bestên heye firajûtinî kesekî le pîşewerî cuda dekatewe. Le buwarî mamostayetîda ew dabirane cêy nabêtewe. Kesayetîy mamosta destawêjêkî girînge le karekeyda, leber ewe xwêndinî rişte û xwêndinî dewamedar ke rûy le firajûtinî kesayetî bêt karîş dekate ser pîşeke. Kewate girîng eweye le xwêndinî riştey mamostayetî û xwêndinî dewamedarda cexit tenha leser qûlbûnewe nebêt le babetî waneda belkû twanistî sozekî û hevbendkarîy mamostaş behend bigîrên. Zanistnamekey Arja Paulin *“Mawey yekem le pîşekeda”* (2007), em base be rûnî pêşan dedat.

¹⁷¹ Koyekî: collective.

Peyam le zeryay fêrgewe

Be mebestî pitir şarezabûn lew hokaraney weha deken mamosta be têperbûnî salîş xulyay her bimênêt hem bo fêrxwazanî xoy û hem bo pîşekey xoy, hatim peywendîm girt letek fêrkarî azimûdey nawçe ciyawazekanî welat û dawam lêkirdin serincî xoyan pêşkeş biken.

Le deverî Skåne çûme dîdarî ingemar glave, ke sîwpênc sal mamostay siruştasî bûwe, em bîstupênc saley dûwayî le astî nawendîda. Ingemar êsta xanenişîne û xawen dîde beranber firajûtinî karûbarî fêrgey em çend desaley raburd: zor babet gorankarîyan beserda hatûwe, bo nimûne boçûn beranber peywendî letek dayikûbabda.

Hawkarêkî Ingemar weha rahatibû le yekem civînî dayikûbabî astî nawendîda bem core destpê dekir: *“Nawim Bo Andersson -e û êsta karêk dekeyn em civînan serkewtû bêt û îdî pêwîstiman be dîdarî yekdî nebêt”*.

Ingemar delêt: *“ew deme weha bû, mirov nedeba hevbenîy zorî letek dayikûbab hebêt”*. Paşan baseke helgerayewe. Harîkarîy letek dayikûbabda bûwe karêkî pêwîst. Hekarêkî em gorankarîye eweye dayikûbabî hawçerx zor ziyatir le raburdû peroşî xwêndinî mindalekanyan hen. Hekarêkî dîke eweye fêrxwazî em zemanê pertewazetirin. Çî dî naguncêt mamosta bête jûrewê û rastekey le mêz rakêşê û daway bêdengî bikat. Mamosta, dayikûbab û fêrxwaz debêt hawkar bin. *“Dîdarî geşe”* derfetêke bo yektir nasîn. Ingemar delêt helbet girînge mirov le dîdarî geşeda rastgo bêt û basekan wek xoyan rûn bikatewe belam debêt cexitîş leser yarmetîdan bêt. Ingemar weha rahatibû be fêrxwaz û dayikûbabî fêrxwaz rabigeyenêt ke pêwîste ber le cudabûnewe bigeyne pêkhatin. Betaybetîş girîng bû fêrxwaz le kotabeşî dîdarekeda bêne go û boçûnî xoyan rabigeyênin.

Le Ingemar - m pirsî aye xoştirîn layenî gişt salanî mamostayetî lay ew çî bûwe, le welamda gutî serleberî kareke berdewam xoş bûwe. Maweyek le fêrgeyekî amadeyî mamosta bû sî kîlometir dûr le malî xoy. Dêtewe bîrî rojêk fêrxwazekan twanadozîy matematîkiyan hebû. Em hênde kunçkawî encamekanyan bû, êware gerok (otomobîl) -î le malewe ajwa û gerayewe bo fêrge, bo hênan û destbecê rastdozîy welamekanyan.

Ingemar delêt hemîşe pêy xoş bûwe şewazî niwê bidozêtewe bo rakêşanî fêrxwazî lawaz û bînîni serkewtîyan. *“Fêrî zor şit bûm lew kare!”*. Mamosta kêşey cilewgîrîy hergîz nebûwe: *“pêw wabûwe fêrxwaz reftaryan başe û ger ajaweyekîş hebaye le polekeda min dengm nizim dekirde. Em hengawe zorbey car debûwe çareser”*.

Le dîdarekemande destewaje şirekey *“her zigmak fêrkare”*, ke min le rastîda lam dirust nîye, le hoşimda serî helda. Ingemar -î pir jîyan û dilgerimî bas le salanî mamostayetîy xoy dekir. Bo nimûne çon *“çadirgey fêrkarî”* le baxçey xanûwekey xoy bo fêrxwazî fêrgeyekî *“hejaran”* saz kirdûwe katêk fêrxwazanî fêrgey *“zengînan”* le şarewanîyekî hawsê geştî lenden - yan bo saz dekira. Ingemar û xatûnêkî hawkar çadir û dûçerxeyan bo hemwan dabîn kird. Fêrxwazan kirane çend grûpêk û tenha grûpî aşpez le çadirgeke demanewe. Her grûpêk yek yan çend erikêkî le esto bû, bo nimûne geştêkî şaroçkey Höganäs biken bo axaftin letek siyasetmedarêkî şarewanîyeke, yan dîdarêkî leger hunermend lars vilks derbarey makî huner. Grûpêk mêrgêkî yek kîlometirî ducayan pêwa û kewtine peydozîy riwek û giyanewerî mêrgeke. Karasanyan bo fêrxwazan kirdibû, hatûçoy otobus (pas) û celû (şemendefêr) bo beşdarbûwan projeye le deverî Skåne xorayî bêt. Ingemar lay girîng bû xercîyan nekewête ser. Rojane grûpekan ko debûnewe û beserhatî xoyan degêrayewe.

Harîkarîy nêw mamostayanîş lay Ingemar dineder bûwe. Car hebûwe dozî serbe siyasetî fêrkarîyan xistote giftûgowe, car hebûwe dozînewey serincrakêştîrîn ezimûn bo waney ezimûnge bas bûwe.

Tenanet kobûnewey naferimî le dewrî kûpêk qawe sûdbexş bûn. Lewêda derfet peyda debû bo piştîwanî û yarmetîy mamostay tazey detirsan le nakokî legel fêrxwaz û dayikûbab. Ewey taze dête fêrgeyekewe pêwîstî be yarmetîy hawkaran debêt.

Dilgerimîy Ingemar minîşî girtewe û pêm waye katî xoy bo fêrxwazekanîşî herweha bûwe. Dilnyam lewey ewanîş hestyan kirdûwe bewey mamosta pêy xoşe yarmetîyan bidat û pêy xoşe geştî siruştyan bo saz bikat. Legel eweşda hestim dekird lay sexte wişe bidozêtewe bo ewey bote hokarî em serkewtine meziney xoy. Lewe deçêt şeydabûnêkî xoriskî hebêt bo pîşekekey. Deysa ewe debête çî?

Lew dîdareda boçûnêk lay min dirust bû ke mamosta twanay heye hevbendîy geş letek dewrûberda saz bikat. Bedegmen nebêt le basî kesani dîkeda neykirde nirxandin. Berdewam xulyayekî resenî hebûwe hem bo nawerokî fêrkarîyekey xoy û hem bo ew kesaney fêrxwazbûn lay.

Eva Anderberg -î danîştûy Stockholm bîst sal pitir mamosta bûwe. Be îmeyl (*email*) bomî nûsîwe hokarekanî firajûtinî xoy be piley yekem birîtî bûn le destey çalakî kar, rêberayetîy başî fêrge û xwêndinî dewamedarî sirûşbexş, hawkat denûsêt: *“katêk karûbar xirap deçerxêt, mirov ziyadtir geşe dekat. Pêşmercêk bo derwesthatin û derbazbûn le doxî weha, birîtîye lewey mirov le bestênêkî karada bêt. Dena pestanekey zor tirsinak debêt”*.

Eva cexit dekat Leser ewey girînge mirov hest bikat debînret le layen rêberayetîy fêrgewe û herweha rêberayetîy fêrge cêy mitmane bêt. Mitmane le tîmî karîşda girînge. Rageyandinî kirawe, planrêjî geldest le nêw tîmî karda zemîne xoş deken hem bo bextewerî û hem bo firajûtin.

Eva xoy sirûşî le bîrokekanî *“bizavî Freinet”*¹⁷² wergirtûwe bo dariştinî karûbarî fêrkarî.

Ezimûnî salanî kar sûdbexş bûn. *“Min bedem salanewe baştir le norey xom geyîştim, fêrbûm hem xom baştir biparêzim û hem le norey xoyanda rêz le fêrxwaz û dayikûbab bigirim”*. Eva wek nûserî kerestey xwêndin, gutarbêj û rêniwên bo mamostay dîke, karwanêkî dîkeşî le pîşekeda kirdûwe û emeş dîsan bote hawkar bo zîndû ragirtinî xulyay fêrge û fêrkarî.

Kerstin Persson -î xelkî şarî Karlstad be îmeyl bas le fêrxwazêk dekat *“dû salî şikestey be milewe bûwe”* katêk em wek tazemamostayekî cewan tûşî hat. Ew dem girîngtirîn pirsîyar lay em birîtî bû lewey çon bitwanêt mitmaney fêrxwazeke wedest bihênêt. Kerstin denûsêt:

Têgeyîştûm lewey debêt peywendî saz bikem, belam çon? Sereta seredanêkî xêzanekeym kird û paşan seredanî dîkeşî bedûwada hat. Gerçî ezimûnî pîşeyîm nebû belam demzanî min mafî ewem nîye dawerî bikem, تنها erikim le mile bo dabînkirdinî mitmane. Rêgeyekim helbijard birîtîy bû le kenarxistinî rolî pîşekem û seredanî xêzanekeym wek mîwan dekird, “çawî mamostayetî”-îm nexiste kar.

Kerstin le namekeyda rûnî dekatewe ke le nyazekeyda bo sazkindinî mitmane serkewt û rêk ew erike ziyadey em deygirte esto bo yarmetîdanî fêrxwazî lew babete, bûwe hokar bo firajûtinî xoy le pîşekeda. Em erike fêrî kird pey berêt be sengî mitmaney binaxerêj. Kerstin delêt bê ew mitmaneyê hîç proseyekî fêrkarî sernagirêt. Belam xalî dîkeş hebûwe lew sîwpênc saley mamostayetîyeda girîng bûn bo firajûtinî pîşeyî xoy. Kerstin rêniwênî başî hebûwe bo axaftin û herweha sûdî gewrey wergirtûwe le tojînewey niwêy pexişan dekiran derbarey fêrbûn û geşekirdinî mindal. Cige lewe sûdîşî wergirtûwe lew semînaraney beşdaryan bûwe.

¹⁷² Bizavî Freinet: rêbazêkî fêrkarîy taybete le layen célestin freinet 1896-1966) damezrawe.

Ingrid Engback -î danîştûy Stockholm ew dîde piştirast dekatowe ke delêt katêk harîkarîy letek fêrxwazekeda naçerxêt ewca firajûtin peyda debêt. Ingrid -î denûsêt:

Min salanêkî zor mamostay pol bûm û maweyek hat kêşeman le polda serî dekirî û amirazekanî berdestim derwest nedehatin. Nakokîyekan zor bûn û mindalekan mitmaney tewawyan be minî gewresal nebû. Polêk bû dûr le aramî.

Lew maweyeda Ingrid geşey be sê amiraz da bo peydakirdinî agadarîy baştir derbarey mindalekan û damezirandinî hevbendîy letekiyan. Bew core polekeş aram bowe. Yekem hengaw birîtî bû lewey beyanyan yek yek be tewqekirdin pêşwazyan lê bikat:

Bo sazkindinî hevbendî legel fêrxwazan, bedem tewqekirdinewe seyrî çawî yekbeyekiyanim dekirî û be guteyekî guncaw pêşwazîm lê dekirî.

Hengawî dûhem birîtîy bû lewey “kajêrî nîwpolî”¹⁷³ -m dekirde danîştinêkî bazineyî:

Destpêkî danîştineke hemû hefteyek her yek şêwaz bû. Yeknewazî xalêkî girîng bû. Danîştinî bazineyî zemîney xoş dekirî bo gişt boçûn û giftûgoyek. Paş têperbûnî maweyek em danîştine bazineyîye cêy girt, wate bûwe merc ke lew nîwpoleda hîçî dîke nekîrêt cige le danîştinî bazineyî. Mindal pêwstîyekî le la peyda bû bo axaftin letek yekdî.

Destawêjî sêhem harîkarîyekî pêşkewtûtir bû letek dayikûbabda:

Rastîyekey eweye min emro zor ziyatir giwê bo boçûnekanî dayikûbab şil dekem û çawenorî harîkarîyanim bo geşekirdinî mindalekanyan. Dayikûbabî em zemaney deyanhewêt bizanin to kêyt, helwêst û şêwazî kart çone.

Anette Sandström -î fêrkarî taybet û danîştûy şarî Sundsvall le buwarî hemecorda karî kirdûwe. Em pêy waye xalî zor sûdbexş karkirdine le tîmî wehada niwênerî çendîn cor karameyî pişeyî têda bêt. Emîş zor bîrî le norey pişeyî xoy kirdotewe û le îmeylêkda bom denûsêt:

Xalî here girîng lay min bîrkirdineweye le helwêste fêrkarîyekanî xom. Çi helwêstêk degirim lew meyle tazaney buwarî zaroxane? Çi core zarobînî¹⁷⁴ -yekim heye? Le helwêstekanimda kame bîrdoze dekeme binaxe? Zor lew pirsiyarane seryan helda lam katêk beşdarî xwêndinêk bûm be nawî: “geşedan be zaroxane” ke sirûşî le helwêstî serbe fêrkarîy Reggio Emilia¹⁷⁵ degirt. Êsta xom fêr kirdûwe mindaleke xoy bibînim, xulya û twanakanî bibînim ber lewey birwanime kemasî û lawazîy ew zaroke û boçûnî pizîşkanî wî.

¹⁷³ Kajêrî nîwpolî: le katî diyarîkirawda, poleke dekirêt be dû beşewe bo çalakîy taybet.

¹⁷⁴ Zarobînî: dîdî û boçûn derbarey zarok.

¹⁷⁵ Fêrkarîy Reggio Emilia: rêbazêkî felsefîy fêrkarîye le zaroxanekanî bakûrî Îtalya bo berengarîy bîrî faşîzim le paş cengî dûhemî cihanî hate kayewe.

Anette le kotay namekeyda denûsêt karkirdin le zaroxane çendîn derfetî geşekirdinî bom rexsand hem wek fêrkar û hem wek mirov. Layene here girîngekanî lem lîsteda gird dekatewe:

- Xulî pîşeyî
- Xwêndinî dewamedar
- Harîkarî letek mamostayan, dayikûbab û layenî karkirdî yarîderî dîke
- Torî “fêrkarîy taybet” le şarewanîyekeda
- Serkarî piştîwan
- Rêniwênî taybet
- Karkirdin le beşî dîkeda
- Xwêndinewey tojînewey peywendîdar

Anu Enehöjd -î danîştûy şarî Eskilstuna ewîş be îmeyl bomî nûsîwe hokarî girîng lay ew bo berdewamîy xulyay karekey birîtîye le wirdekarîy le helwêst û rêbazî karda û herweha le bûnî hevbendîy berdewam legel kesani dîke.

Deyca her eweye sûdêkî heye bo mirov! Karkirdin û geşedan be hevbendî. Berokgîrîy eweye leber her hoyek bêt hevbendî legel fêrxwazêk yan dayikûbabî ew fêrxwaze saz nebêt. Ew kilîle çon bidozimewe? Pêm waye kilîl birîtîye le “giwêy bo radêre”, “giwêy bo radêre”, “giwêy bo radêre”. Ewca lewaneye derwazeyekî biçûk bikirêtewe.

Min serincêkî zorîş dedeme bîrdanewe, hem legel û hem derbarey ezimûn û beserhatî mamostay dîke, herweha mebestime beşdarbim le prosej geşedanî kesani dîkey gewresalda, le prosej rêberayetîyan le pîşey mamostayetîda.

Anu bas le sengî asûdebûnî xoyîşî dekat le pîşeykeyda wek fêrkar. Ger xoy asûde bêt, fêrxwaz û dayikûbabîş zor aramtir debin. Fêrîş bûwe zor car paşekişe baştîre le têkalan. Le xoy depirsêt: “min bo kê xom dehawême em têkalanewe? Min û fêrxwaz çi sûdêk debînîn le selimandinî kêşey: kê tawanbare?”.

Xalî hawbeş lay Ingemar, Kerstin, Eva, Ingrid, Anette, Anu û herweha kesani dîkey name û giftûgo le nêwanimanda hebûwe, cexite leser hevbendîy geş letek fêrxwaz, dayikûbab û hawkaran, xulyaye bo firajûtin bedem karewe û herweha çêj wergirtine le pêşkewtinî fêrxwaz. Beşêkîşyan bas le sengî grûpî rêniwênî kirdûwe bo firewandinî karameyî girdbowey pîşewerane.

Grûpî rêniwênî - rêbazêke bo geşedan be twanay pîşeweraney xot

“Rêniwênî hokar bû bo “riskan”-î min wek mamosta. Le mawey em saleda le rêy dîdarekanimanewe çendîn amirazim peyda kird. Hemerengîy karameyî kesani beşdar debûwe serçawey dîdî hemereng le kêşey corawcor. Pêm waye têkelkirdinî mamostayanî pîşesal¹⁷⁶ û pîşeastî¹⁷⁷ ciyawaz, yekêk bû le xale behêzekani grûpeke. Kêşe dehate berbas min pêm wa bû تنها minim kêşey weham be koleweye.

¹⁷⁶ Pîşesal: jimarey sal le pîşeda.

¹⁷⁷ Pîşeast: astî kesêk le pîşeykeyda, bo nimûne mamostay astî bineretî yan amadeyî.

Em grûpe fêrî kirdim, bo derwesthatinî pîşey mamostayetî, debêt helwêstêk le kareke bigirim xom têda razî bim le berhemî xom. Lem grûpî rêniwênîyeda hestim be selimandinî dîdî bineretîy xomim kird beranber karekem.

Zor car ewendey bese mirov kêşekanî xoy le dil derkat, îdî her xoy çareseryan dedozêtewe”.

Ew dêrane le raportêkî helsengandin ragiwêzirawin ke derbarey karî yek salî grûpêkî rêniwênî bû le fêrgey Bräcke -y şarewanîy Bräcke -y deverî Jämtland. Rêniwên Gudrun Nordin le Sankt Lukas -î şarî Uppsala salanî 2006-2007 xulî rêniwênî dexwênd û bo praktîk (rahênan) em grûpey hebû.

Basekey serewe nimûneman dedatê lewey grûpî rêniwênî çî pê dekirêt bo karmendanî fêrge le buwarî firajûtinî kesekî û pîşewerîda. Nêwerokî raporteke deşêt lem heft xaleda gird bikirênewe:

- Hemecorbûnî pêkhaty grûpeke serçawe bû bo derkewtinî kêşey xawen piley dijarîy corawcorî karkirdin letek fêrxwazda
- Hemecorbûnî pêkhaty grûpeke serçawe bû bo riwangey ciyawaz derbarey ew kêşaney dehatine berbas
- Kesî endam lem grûpeda boy aşkira debû ke kêşey hawbeş zorin, beweş hestî tenhayî kiz debowe
- Rêniwênîyeke debûwe serçawe bo agayîyekî firewantir derbarey pêwîstîy xo, bo nimûne dozînewey şêwazêkî taybet bo helwîst wergirtin le kareke be corêkî weha mirov hest be razîbûn bikat le berhemî xoy
- Derfetî baskirdin le kêşe, zemîne saz dekat bo ewey mirov her xoy çareser bidozêtewe
- Rêniwênîyeke bo mirovî deselimênêt ke ew dîdey heybûwe beranber layenî girîng le karekeyda, lay kesanî dîkeş her girînge
- Karkirdin le grûpî rêniwênîda debête mayey rahêzanî twanay pîşewerane - be derbirînî “min wek mamosta hatime riskan” hate raniwandin.

Taze, lem de - pazde saley dûwayîda ewca grûpî rêniwên bo karmendanî fêrge kewte cêgirtin. Belam hêştâ fêrge û şarewanîyş hen emeyan le la amirazêkî namoye bo karûbarî rojane. Le hendêk şiwên zûzû grûpî rêniwên dexirêne kar belam tenha katî sextang û tenha bo mamostayek kar legel mindalî griftdar bikat. Çemikî “rêniwên” -îş narûne çunke be watay zor ciyawaz dête bekarhênan. Her bo nimûne car heye gişt mamostayanî fêrgey hawçerx be rêniwên basyan lê dekirêt û gişt ferîkemamosta, yek yan çend rêniwênêkî heye le mawey bernamey rahênanî katî xwêndinî mamostayetîda.

Em rêniwênîyey fêrgey Bräcke ke lesere we hate helsengandin birîtîye le grûpêkî biçûkî mamostayan letek kesêkî xwêndûy hunerî rêniwênî, derfetyan debêt be dû hefte carêk, newed xulek, kobibinewe û bas le karekey xoyan biken. Kewate em grûpe amirazêk nîye be piley yekem bo çareserkirdinî sextang, amirazêk nîye tenha bo tazemamosta, yan bo mamostay weha, be her hokarêk bêt grûpî biçûkî fêrxwazî hebêt.

Eme meydanêke bo bîrdanewe le karî pîşeyek têyda mirov debêt hemîşe giwêradêrî pêwîstîy kesanî dîke bêt û zor car biryardan mawey bîr lêkirdinewey her nîye. Ewca mamostaş berdewam pelkêş dekirêt bo grûpkarîy hemecor. Tenha ewe bese bo ewey mirov carûbar hengawêk bête lawe û bîrêk lew prosane û le sûdekanyan bikatewe. Gişt xoxerîkandinêk amancî heye. Deşêt agadarane bêt yan agabeder, aşkira yan penhan, belam bûnî her heye.

Emeş nimûneyek le doxêk têyda grûpî rêniwên debête yarîder bo helkişanî karameyî:

Nimûne

Êwareyek babî yek le fêrxwazan telefon bo mamosta lotta dekat û daway hefteyek moletî pişû dekat. Xêzaneke bo cêjiney penca saley dayikeke, geştêkî îtalya deken û kurekeyan pêwîstî be molete bo beşdarîy lew geştêda.

Lotta delêt hefteyek dabiran karîgerîy xirapî debêt Leser xwêndinî kureke û êsta leber ewey beşêkî xwêndin be grûpkarî dekirêt, dabiranî yekêk karîgerîy debêt Leser gişt grûpeke.

Bawikeke delêt kurekeyan beşdarî geşteke debêt û fêrge çî delêt ba bilêt.

Dûr nîye mamosta le doxî wehada, sereta tûre bêt, ewca gazende lay hawkarêk bikat, daxî bêdeselatane helkêşêt û paşan baseke wêl bikat. Lewaneye lotta legel xoyda bilêt: “babetî dîkey girîngtir heye wizey têda xerc bikem”. Belam ger grûpêkî rêniwênî hebêt ewa detwanêt babeteke lewêda bas bikat. Derfetî debêt tûrebûnekey xoy, hest û boçûnî beranber bawikeke, fêrxwazeke û karîgerîy dabiranî fêrxwazeke Leser karî em wek mamosta û karî gişt grûpeke, be gutar darêjêt. Ewsa grûpekeş debûne serçaweyek bo serinc û têtînî derbarey bertekî xoy, agadarî derbarey maf û erikî xoy wek mamosta lem doxeda. Ezimûnî girdbowey gişt grûpeke le çareserkirdinî basî zûtirî lem babete debête yarîder bo dahatû. Lewaneyeşe baseke bibête mayey giftûgo Leser helwêstî mamostayan xoyan derbarey moletî pişû, kat û babetî dîkey êmey mamosta le çemikî “akarî kar”-da koyan dekeynewe. Mamosta xoy bo daway molet çone, legel ragirtinî katî wane û begîştî ragirtinî çewey wanekan çone?

Le grûpî rêniwênîda bîroke û kirdewe (bîrdoze û praktîk) ko debinewe. Lewêda mirov detwanêt wişe Leser ew diyardeye dabinêt ke be “zanyarî ezimûnekî” û “zanyarî bêdeng” nawzed kirawe û mebest lîy begîştî zanyarêke hestbeder, belam karîgerîy gewrey heye Leser corî helsûraniman le pîşekeda. Karîgerîy corî helwêstî ciyawaz Leser, bo nimûne, bawikî fêrxwazekey lotta, dekirêt bixirête berbas. Ger mamosta “na” yekî rût bidat be rûy fêrxwaz û xêzanekeyda, hevbendîyan çî beser dêt? Eger mamosta bikewête sazûsewda çî? Ger bilêt: “aha, başe ewa zanîm!” Ewsa çî? Lew bare ciyawazaneda mamosta xoy çî beser dêt?

Sûdêkî dîkey grûpî rêniwênî axaftinî berdewame derbarey diyardey wird û dirîşt û beweş mamosta derfetî bîrdanewey bo derexsêt le gişt rûkarekanî pîşekey xoy - hem ayetî û hem nayetî. Min le karekemda wek derûnsarêj (saykoterapîst) behay “serincî azaderew”¹⁷⁸ têgeyîştîm. Wate lew demeda ke giwê le nexoş degirim hoş, hest, yadewerî, zanyar, watakêşekê û bîroke mewdayekî firewan werdegirin. Pêwîst nakat xom xerîk bikem be dozînewey basêkî bîlêm yan reftarêkî bîniwênim, pêwîst nakat bigerêm bedûway welam, çareser, rûnkirdinewe û... htd. Tenha le giwêradêranda pişû dedem û çawerê dekem bîrokeyek ser bikat. Le karî rêniwênîmda bo mamostayan hestim kird ew core helwêste hem pişûbexşe û hem afirande. Zor carîş debête hoy qûlbûnewey giftûgo, kesî destpêşxerî babetekeş le encamekey baştir razî debêt. Be kurtî grûpî rêniwênî bo mamostayan debête:

- Watabexş
- Arambexşî hestekî
- Bîrkirdinewey grûpkarane
- Hander bo helwêstî akarekî

¹⁷⁸ Serincî azaderew: free-floating attention.

- Derfet derexsênê bo weestogirtinî berpirsayetî ziyatir
- Corayetî fêrkarîyeke serdexat

Toy xwênerîş ger pêwîstît heye be nimûne le karî grûpî rêniwênî temaşay em kitêbekem bike: *“Pedagog i en förändrad tid” - “Fêrkar le serdemêkî bergoranda”* (2002). Sê duktornamey tazeş hen baş le grûpî rêniwênî nêw fêrge dedûwên:

- Gun Mollberger Hedqvist. *Samtal för förståelse* (2006)
- Birgitta Sahlin. *Utmaning och omtanke* (2004)
- Kerstin Bladini. *Handledning som verktyg och rum för reflektion* (2004)

Le antolojî *“Handledning i pedagogiskt arbete”* (2007) - da, bîstuyek tojerî skandînavî le buwarî grûpî rêniwênî-da boçûnî bayexdar pêşkeş deken bo têgeyîştin le karîgerîy grûpî rêniwênî leser firajûtinî pîşey mamostayetî.

Salêk wiçan bo xwêndinî tojînewey niwê le buwarî fêrkarîda

Salanî heştakan [î sedey bîstem] le geştêkî karda bo Îsiraîl, mamostam bînî deyangut ewan paş heft sal kar, salêk dadebirên, belam nek bo pişû belkû bo xwêndin. Heftêy pazde kajêr deba terxan biken bo xwêndinî zanko. Nîwey ew kate bo qûlbûneweye le tojînewey niwêy serbe buwarî karî xoyan, nîwekey dîke bo xwêndinî babetêkî niwêye be xwastî xoyan. Mûçekeşyan wek xoy dema, eweş bewe dabîn dekira ke salanî karyan şitêk le mûçey xoyan xoş debûn bo pirkirdinewey mûçey em saleyan. Tenanet beşêkî abûney sendîkay mamostayanîş terxan dekira bo firayay xercîy em sale.

Wek bîrim bêt hokarî ew salî wiçane ewe bû pîşey fêrkarîy hênde sexte lewaneye mamosta pêwîstî be wiçan bêt bo mewda wergirtin le karî rojane, derfetî bîrdanewey hebêt û herweha şarezayî peyda bikat derbarî tojînewey zanistîy niwê le buwarî karî xoyda. Xwêndinî babete tazekêş bo firewandinî zanistî giştîy mamosta û bo firajûtinî bû wek mirov. Kewate biryarderî ew beşe azadey xwêndin pêwîstîy mamostake xoyetî belam beşekey yekem pêwîstî mindale debêt biryarderî ew basey mamosta debêt rîşedoziy têda bikat.

Ewca demewêt pirsiyar le xwêner bikem: dûwacar key bû to tojîneweyek, zanistnameyek yan raportêkit xwêndotewe derbarey babetî fêrkarîyekey xot bêt yan begîştî derbarey karûbarî fêrge?

Lewaneye lem çend saley raburdûda carêk beşdarî konferans yan grûpêkî fêrkarîy bûbît. Lewaneye giwêbîstî yek dû semînar yan le fêrgeda beşdarî projeyekî firajûtin bûbît. Lewaneyîşe pêt weha bêt be hîç corêk derfet nebûwe zanistname û nûsyarî dîke bixwênitewe çunke hem katî zor dewêt û hem têraman, dena sûd le nêwerokeye nabînrêt.

Govarî *“Cîhanî fêrge”*, jimare 13î salî 2007 derbarey rageyandinî nêwan tojer û mamostay fêrge denûsêt. Lewêda Ulf P Lundgren -î profîsorî fêrkarî, denûsêt tojerî kara le buwarî fêrkarnasîda debêt be şeweyekî baştir bas le derencamî tojînewekanyan biken. Mamostayanîş le lay xoyanewe debêt twanatir bin le kêşerêjîda.¹⁷⁹ Ulf pêy waye mamosta ger aşinay tojînewey niwê nebêt, metirsî heye

¹⁷⁹ Kêşerêjî: problematize, dariştinî bîrokeyek yan diyardeyek le şewey kêşeda- em çemike be zorî le buwarî zanistî û tojîneweda bekar dêt.

asantir bikewête dawî bawerî firyadiresîyewe.¹⁸⁰ Lêreda dêtewe yadim le rojgarî karim wek mamostay amadeyî berdewam wêl bûm be dûway şitêkî wek “*bawerêkî firyadiresî fêrkarane*”. Bîrim dê le xulda dadenîştîm û çawerê bûm amojgarîyek, rêbazêk, yan keresteyekî zor hawçerxî fêrkarî peyda bêt û ne tenha yarîderim bêt bibime mamostayekî baştir belkû rizgarîşim bikat lewey hênde xerîkî amadebaşîy wane bim. Belam nêzîkey gişt caran dilşkest demam. Ew amojgarîye zêrîne her nehat. Le baştirîn barda amojgarîyekim dedozîyewe lewane bû carêk le caran sûdêkî hebêt.

Carêk ragiwasteyekim bînî bedilim bû: “*wek segî peydoz çon şûnî¹⁸¹ rastîne¹⁸² hel degirêtewe, rê bike*”.¹⁸³ Ewe peyvî Tomas Tranströmer e û min lew demewe bo malawayî le polî fêrxwazanim, bekarim debird. Car hebûwe amojgarîyekî serincrakêşim peyda kirdûwe derbarey pêşkeşkirdinî kitêb, wêne yan babet. Rûy dawê pêşkeşkar xoy kesêkî sirûşbexş û zîndû bûwe, le seredanêkî fêrgekemanda ew roje sardusirey novemberî bûjandotewe. Belam ew firyadirese fêrkarîyey çawenorî bûm, nehat û nehat.

Mamosta zor car delên katyan nîye xerîkî tojînewey niwê bin, wêray eweş geşekarî¹⁸⁴ -y firewan le zor fêrgeda deçerxêt. Govarekey “*cîhanî fêrge*”, jimare 13 -y salî 2007 çendîn nimûne pêşkeş dekat. Şarewanî heye tojerî duktoray damezirandûwe erikiyan dû layeneye: le layek xerîkî tojînewey xoyan bin û le layek xerîkî geşekarîy fêrge bin le şarewanîyekeda.

Gişt zanko û berzefêrgey xawen riştey mamostayetî, “*Melbendî firajûtinî herêmi*” (*Regionala utvecklingscentra – RUC*) -şyan heye û mebest lêyan dîwexanêk bêt bo kobûnewey zanko, şarewanî û fêrgekanî devereke. Zankoy Uppsala bo nimûne salane gişt mamostay karay deverekey xoy banghêşt dekat bo agadarkirdineweyan lew tojîneweyaney le aradan. 600 mamosta salî 2006 amadey bernameke bûn.

“*Encumenî zanist*” (*Vetenskaprådet*) bingeyekî dewletîye le salî 2001 -ewe damezirawe erikî eweye piştîwanî le tojînewey bineretî bikat. Em encumene harîkarî letek ruc dekat bo geyandinî tojînewey tojeran be mamostayan û herweha bo ziyadkirdinî tojînewe derbarey karûbarî mamostayetî.

Le awayî Växjö çend mamostayekî riştey mamostayetî gişt tojînewekanî zankokeyan beser kirdewe ke derbarey fêrkarîn bo dozînewey ew beşaney bo mamosta sûdbexşin. Britt-Louise Ek-Gustafsson -î rêberî geşekarîy lewê, be govarî “*Cîhanî fêrge*” delêt tojînewe derbarey kêşekanî mamosta yekcar kemin. Andreas Ryve le zankoy *Mälardalen* delêt ger tojînewe rastewxo le polda bikirêt detwanêt bibête pirdî nêwan tojer û mamosta. Le deverî Skåne torêk saz kirawe têyda tojeranî zankoy *Lund* berdewam fêrxwazanî amadeyî le awayî Simrishamn debînin.

Fêrge gewretirîn melbendî kare le Swêd. Nêzîkey çareke mîlyonêk mamosta û 2,5 mîlyon zarok û fêrxwaz le zaroxanewe heta amadeyî salane - û zor car bo çendîn sal - wêkira bo fêrbûn û firajûtin kar deken. Ayendey fêrge girêdirawî dû hokare: yekemyan çi tojîneweyek emro le aradaye, dûhem mamostay kara çi derfetêkî heye bo wirdbûnewe, giftûgo û têhelkêşkirdinî ew zanyare tazeyey tojeran pêy degen.

- Johan Hofvendahl le zanistnamekey xoyda “*Riskabla samtal*” - “*Axaftinî metirsîdar*” (2006) amaje bew “*riwangey çewtdozî*” -ye giştîyey dekat le “*dîdarî geşe*” da zale. Tojînewe debête yarderî mamosta bo gorînî şewazî xoy le dîdarî geşeda.

¹⁸⁰ Bawerî firyadiresî: bawerkirdin bewey em yan ew kese, bîroke, rêbaz û keresteye firyaman dekewêt û rizgarman dekat le şitêk.

¹⁸¹ Şûn helgirtinewe: şwênpê helgirtinewe.

¹⁸² Rastîne: rastî, heqîqet.

¹⁸³ “*Gå som en spårhund där sanningen trampade*”.

¹⁸⁴ Geşekarî: karûbarî serbe geşekirdin û geşepêdan.

- Zanistnamekey Arja Paulin *“Första tiden i yrket”* - *“Mawey yekem le pêşekeda”* bas le girîngî twanay civakîy mamosta dekat bo karî nêw pol. Amajeş dekat be şêwazî corawcor bo serxistinî twanay civakî.
- Anders Holmgren le zanistnamey: *“Klassrummets relationsetik”* - *“Akarnasîy hevbendîy nêw pol”* - da hevbendîy akarnasaney nêw pol rûn dekatewe. riwageman dedatê derbarey hawsemay mamosta û fêrxwaz û çî karîgerîyekiyan le waneyekî asayîda debêt leser jîngey pol.
- Gun Mollberger Hedqvist le zanistnamekeyda: *“Samtal för förståelse”* - *“Axaftin bo derikkirdin”* pêşanî dedat çon karameyî mamosta le prosey rêniwênîda geşe dekat.

Terxankirdinî pare û kat bo ewey mamosta xoy xerîkî tojîne bêt, basêke şayanî giftûgoy wirtir, herweha *“salêk wiçan”* bo ewey mamosta derfetî hebêt bo beserkirdinewe tojînewey niwê. Dilnyaşim lewey axaftinî berdewam le nêwan fêrkar û tojerda pêşanî dedat kame cor tojînewey lay mamosta girîngin.

Edî toy xwênerî em kitêbe boçûnit çîye? Tojînewey buwarî fêrkarî kat, koşîn û pare le çîda xerc bikat başe? To xawen beserhat û ezimûnî bercesteyt leber ewe dekirêt to bibîte serçawey destpêşxerî girîng bo tojînewey niwêy zanistî.

Çapterî nohem: Şeş doxî rojane bo bîrdanewe

Gîşt mamostayan dezanin dox heye le karî rojaney fêrgeda le doxî dîke diwartire, ewca çîş be kêşe dadenrêt, le kesêkewe bo kesêk cudaye. Le ezimûnî xomewe delêm zor kes pêy waye karkirdin legel fêrxwazî xemsard yekêke le kêşe sextekan. Dayikûbabîş hen peywendî letekiyan sexte. Beşêkiyan be dîdî ême çawenorîy nalebaryan le fêrge heye û beşêkiyan le ast erikî dayikûbawiketîda nîn. Tirsîş lewey ême xoman le astî ew berpîrsayetîyeda nebîn ke pîşey mamostayetî daway dekat, le karûbarî rojaney zor mamostada, ne tenha tazemamosta, rawnerêkî berdewame.

Mebest lem dûwa çapterey kitêbeke pêşandanî çend nimûneyekî berceste ye le doxî fêrge ke têyda karameyî mamosta dekewête ezimûnewe. Her wek pêşnyaz, dekirêt em şeş nimûneye lew dû riwangeyewe seyr bikirên ke kirawinete binaxey em kitêbe: helwêstî mamosta le ferhengî giwêrayelîda û herweha le ferhengî berpîrsayetîda. Hîwadarim nêwerokî çapterekanî pêşû lêreda bibine serçaweyek bo bîr û boçûn, belam zanyar, ezimûn û bîrdanewey xwênerîş, hawşanî peyamî nêw em kitêbe, girîngin.

Doxî yekem: boçî em base bixwênîn?

Mamosta Êva (Eva) hest dekat xwêndinî polî heftem naçerxêt. Fêrxwazan direng dêne polewe, selam le Êvay mamosta naken, ne ke dêne polewe û ne katêk le dalanekanda tûşî debin. Fêrxwaz le wanekanî emda bizêwî deken û zor car xame û kitêbîşan pê nîye.

Çend fêrxwazêk hen berdeyam merc û pîrsiyarî weha dewrûjênin mamosta natwanêt xoy lêyan labidat. Bo nimûne:

- Ewe hêştê helsengandinî twanadozîyekey êmet tewaw nekirdûwe, heta key çawerê bîn?
- Bo hemîşe rûy demit le mine, xo ewaney dîkeş qse deken?
- Ca boçî eme bixwênîn? Min hergîz pêwîstîm beme nabêt!
- Mamosta! To mûçet çende?

Êva nazanêt çon aramîy em pole rabigirêt û hestîş be azarî wîjdan dekat beranber fêrxwaze zîrekekan ke hest be herasanî deken le bizêwîy poleke û carî weha heye ke debête hera le birî Êva hawar deken: “bê deng!”. Êvayîş hawar dekat yan deparêtewe. Car heye serleberî waneke hest be tûreyî dekat, car heye wire berdedat û delêt: “peşîman debinewe, paşan ke fêrî hîç nebûn xo min ziyar naxom!”

Erk

Dilnyam toy xwêner ezimûnit heye le nimûney em polî heftemey Êva, yan mamosta bûyt têyda yan fêrxwaz. Çareyekî nimûneyîş nîye bo kêşeke. Belam hengaw heye bareke sûktir dekat hem bo xoy û hem bo fêrxwazan.

1. Be nimûne rûnî bikewe, mamostayek serbe ferhengî giwêrayelî bêt û paşan serbe ferhengî berpîrsayetî bêt, lem poley Êvada bîrî û hest û helwêstî çon debêt?

2. Êva çi sûdêk debînêt le nasînî reftare ciyawazekanî peywestbûnî mirov? Le nasînî seng û karkirdî hest le buwarî hawguzeranî letek kesanî dîke?

Doxî dûhem: ay, eme çîye to deylêt, Malîn?

Le civînî destey karda to bertekit debêt le şêwazî baskirdinî çend fêrxwazêk le layen malîn (Malin) - ewe. Malîn be zimanêkî nixşkên bas le fêrxwaz û dayikûbabîyan dekat. Delêt fêrxwazekan xawin û fêrî hîç nabin çunke nayanewêt hîç zanistêk werbigirin. Hîç şitêkî geşyan pê nîye bo poleke û çi berpirsayetîyekîş nagirne esto, bo nimûne le ragirtinî xawênîda. Dayikûbab peroşî mindalekan nîn. Malîn be cesteş be zimanêkî dizêner piştîwanî le derbirînekanî xoy dekat. Henasey bêzarî heldekêşêt, temaşay asiman dekat, ser ba dedat û be dest amajey dûrkewtinewe dekat wek ewey heta bikirêt fêrxwazekan dûr rabigirêt. To lem civîna hest be naxoşî dekeyt.

Erk

1. Ew nakokîyey naxî xot rûn bikewe ke pêm waye têt dekwît bedem axaftinekey Malîn - -ewe.
2. Aye em şêwazey bertekî Malîn le fêrxwazan debête hunerêkî berengarbûnewe?¹⁸⁵ kam hunerî berengarbûnewe?
3. Lem doxeda, mirov çon reftar legel Malîn bikat başe?

Doxî sêhem: dîdarî geşe le dû ferhengda

Semîr û dayikûbabî, ke nêzîkî penca salen, lay Soma -y bîstuşeş saley mamostay semîr, dîdarî geşe - yan heye. Semîr fêrxwazî polî yekemî nawendîyewe û eme yekem care dayik û babî, mamostakey debînin. Dayik û bab xoyan şikpoş kirdûwe. Semîrîş naçar kirawe ciwantirîn poşakî leber bêt. Her sêkiyan şilejawan û pêşkat le cêy dîdar amaden. Soma - yîş şilejawe, be cînezêkî niwê, cûtêk serpe û bilûzîkî mil-v çawerêyane. Katêk debînêt dayikeke sertapa dapoşirawe hest dekat poşakî xoy zor lebar nebêt. Bawikeke zor beperêze û Soma nazanêt aye rêzêkî zêdero lem degirêt yan be çawêkî sûk seyri dekat. Axaftinekeşyan xaweroye. Bawikeke depirsê boçî semîr erikî malewey hênde keme û boçî pişûy hênde zore. Semîr basî kirdûwe ke grûpkarîyan heye û beşêk le erikî xwendin be komputer saz deken, belam bawikeke em base derik nakat. Fêrxwaz deçête fêrge bo ewey lewê bêt û giwê radêrêt bo mamostay wanebêj.

Erk

1. Basêk lew monologe¹⁸⁶ naxekîye bike Êva le katî axaftinîda letek semîr û dayikûbabîda, heybûwe.
2. Çapterî çiwarem pênasay hebû bo twanistî hevbendkarî, le riwangey ew pênasayewe basêkî em doxe bike.

¹⁸⁵ Birwane beşî hunerî berengarbûnewe: *coping strategy* le çapterî sêhem.

¹⁸⁶ Monolog: monologue, tagoyî, axaftinî mirov legel xoyda.

Doxî çiwarem: deysa welam bidewe, burîs!

Burîs boris le polî heştem mamostaye û hest dekat çend fêrxwazêk hen pêşwazî lêyan karêkî sexte. Betaybetî beşêk le kurekan berûnî pêşanî deden ke deyanewêt hevbendîyan letekî nêzîk bê. Le fêrge be dûyda degerên û şitî lê depirsîn. Basî guzeranî xoyanî be îmeyl bo kil¹⁸⁷ deken. Daway lê deken boçûnî xoy derbarey peyamekanyan binûsêt. Car heye fêrxwaz erikekey xoy tewaw nekirdûwe leber ewey barudoxî malewe peşêwe, leber ewey xewyan zirrawe yan leber ewey pêyan waye “xwêndin çî sûdî nîye”. Burîs nayewêt dest be rûyanda binêt, belam amadeş nîye bibête dost û bawikî yedeg. Deyhewêt mamosta bê û wanebêj.

Erk

1. Pêt waye ew nakokîye naxekîyane çîn ke lewaneye burîs tûşyan bibêt derbarey em fêrxwazane? Basî beşêkiyan bike.
2. Debêt çarey em dîllema (kêşey dûsere) yey burîs çî bê?
3. Boçûnî to çone derbarey “hevbendîy nêzîkayeti - mewdagirtin” le nêwan mamosta û fêrxwazda?

Doxî pêncem: kê detwanêt yarmetîy êlsa bidat?

Êlsa (Elsa) heşt salane û Pawlîna (Paulina) mamostayetî. Pawlîna le ast êlsada nîgerane çunke zorbey kat zor westiya¹⁸⁸ diyare.

Carûbar, beyanyan, pawlîna be telefon le êlsa depirsêtewe, dayikî êlsa welam dedatewe û delêt direng şîyar bûnetewe. Dayikî take serperîştî êlsa - ye. Le dû dîdarî geşeda pawlîna hestî kird em dayike bonî khûlî lê dêt. Pawlîna basekey berewrû kirdewe, dayik le bersivda gutî le ahengî sersaley dostêk bûwe û yek dû lêwan mey noşîwe. Êlsa le mawey axaftinekeda zor bêdeng bû, ger pirsîyarîşî lê kiraba zor car be “nazanim” welamî dedayewe.

Êlsa le fêrge bedegmen nebêt şad nîye û ger pawlînaş pirsîyarî lê bikat derbarey doxî malewe welamêkî xolader dedatewe. erikî fêrgeşî her xawe û pawlîna heta dêt ziyatir nîgeran debêt derbarey doxî malewey êlsa.

Erk

1. Pawlîna lem barudoxeda çî berpirsayetîyekî pîşewraney heye?
2. Çareserî ciyawaz lem doxeda derencamî ciyawazyen debêt. Rîşedoziyek lew base bike.

¹⁸⁷ Kilkirdin: postkirdin, name nardin.

¹⁸⁸ Westiya: mandû.

Doxî şeşem: zekîye, dînî to çîye?

Zekîye le polî heştem mamostay civaknasîye. Katêk bas dête ser cûlekayetî, yek le kurekan, andirê andré, deykate hera û ray degeyênêt ke ew nayewêt şitêk derbarey dînî weha pîs bixwênêt. Delêt min kirîstîyan (mesîhî) -m û pêwîst nakat dînî cû bixwênim. Zekîye mat debêt û ber lewey firayay welam bikewêt miştumirêkî gerim le polekeda berpa debêt. Zekîye miştumiryan pê debirêt û delêt ême giştiman debêt rêz le bawerî yektir bigirîn û gutey wek ewey andirê bêrêzîye. Ewîş wek hemû fêrxwazêkî dîke debêt peyrewî planî korseke bikat. Andirê delêt bîstûyetî musulman bûrawe le xwêndinî cûyetî kewate kirîstîyanîş deba bûraw bin. Sara dête go û delêt ew serbe xêzanêkî cûwe û ger weha bêt ewîş pêwîst nakat derbarey kirîstîyanetî bixwênît. Zekîye delêt ger biryare wêkira aşteya bijîn ewa debêt aşinay gişt dînekan bîn. Lenakaw fêrxwazêk le zekîye depirsêt dînî to çîye?

Erk

Zekîye lêreda dekewête doxêkî astengewe û debêt yekser, bê derfetî bîrkirdinewe, welam bidatewe.

1. Lêreda, zekîye çî rêgeyekî heye bo çareser?
2. Çi ciyawazîyek heye le çareserkirdinî doxekeda ger zekîye serbe ferhengî giwêrayelî bêt yan ferhengî berpîrsayetî?

Dûwa gute

Şadozêkî em kitêbe birîtî bû le tawî gorankariye civakiyekan û berhemgelî tojînewey niwê leser dîdiman bo hevbendîy mamosta û fêrxwaz le fêrgeda. Perînewe berew civakêkî fireferheng, takgera, rû le rikaberî û ziyatir yeksan daway fêrgeyek dekat axaftin têyda cêy hebêt.

Agadarî û berdaştî niwê berdewam debarênrên be sermanda. Arasteş hemîşe derewinaxe,¹⁸⁹ her bo terazkirdinî bareke pêwîstiman be bizavêkî pêçewane heye - naxewder.¹⁹⁰ Ême pêwîstiman heye be peyorîy hem karîgerîy rûdawî derekî leser hest û hoşiman, hem karîgerîy hest û hoşiman leser dîdî xoman derbarey rûdawekanî dewrûber û leser reftarî xoman. Girîng peybirdine be besterî nêwan layenî derekî û layenî naxekî, nêwan firewanî û qûlayî, nêwan agadarî û zanyar, kar û xerîkbûn. Henasedan wek henasehelimijîn girînge.

Layenî rast û resen û taybetî her mamosta û her fêrxwazêk pêwîstî be derfete bo xuyabûn û kate bo firajûtin. Hoş, ke zor girînge bo pêkhênanî nasname û bestên, dekirêt bîxeyne kar, ne tenha bo welamdanewey pirsiyarekanî twanadozî, belkû bo xalî dîkey wek awerdanewe le rewî karî emroman le fêrge, ger şitêkî taybet rûy dabêt, ger şitêkî taze fêrbûbîn derbarey xoman yan kesani dîke.

Êmey mamosta pêwîstiman be kate bo xwêndinewey zor, axaftinî zor û bîstinî zortir - hem le xoman û hem le fêrxwazan. Zanyarî niwê derbarey sengî ezimûn le şewey helsengandiniman bo xoman û bo kesani dîke, pêwîstî be cêgeye le xwêndinî rişteke û le xwêndinî dewamedarda. Ême debêt ezimûn bas bikeyn, giwêyan bo radêrîn, biyan selimênîn û karyan leser bikeyn bo ewey têhelkêş bikirên û bibine zanyarî dirust.

Ewca ragiwasteyek le kitêbî *“Gryning över Kalahari : hur människan blev människa”* - *“Spêdey Kalaharî: mirov çon bûwe mirov”* - (2007) -î Lasse Berg dekeme kotay em kitêbe:

Xawîy mîrate boman, çunke bo zîndûmanî xoman, hîçî dîkey girîngtir nîye le xerîkbûn be rahêzanî piştîwanetî û evîn. Emeş pêwîstî be kar nîye, pêwîstî be axaftine. Ewe bo em axaftineye ême le mawey çendîn mîlyon salî resînda em mêşikeman pêkhênawe. Bo ewey bitwanîn pêk bêyn û şer nekeyn.

«...»

¹⁸⁹ Derewinaxe: le derewe rûwew nax.

¹⁹⁰ Naxewder: le naxewe rûwew der.